



**K.T.**

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê**

**Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê**

**Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

**Teza Lîsansa Bilind**

**BERAWIRDKIRINEK LI SER *ŞIVANÊ KURMANCA* Û  
SÊBAREYA MAKSÎM GORKÎ**

**Ferhat YILMAZ**

**11711001**

**Mêrdîn – 2015**



**K.T.**

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

**Teza Lîsansa Bilind**

**BERAWIRDKIRINEK LI SER ŞIVANÊ KURMANCA Û  
SÊBAREYA MAKSÎM GORKÎ**

**Ferhat YILMAZ**

**11711001**

**Şêwirmend**

**Hnd. Pwd. Ramazan ÇEÇEN**

**Mêrdîn – 2015**



## TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ’NE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim ve Öğretim Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Berawirdinek Li Ser *Şivanê Kurmanca û Sêbareya Maksîm Gorkî*” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Raporum sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Raporumun ..... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

**11.09.2015**

**Ferhat YILMAZ**

JI BO RÊVEBERIYA ENSTITÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI  
TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê juriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çandê de wekî Teza  
Lîsansa Bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok:.....

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam:.....

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam:.....

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzeyên jorîn ên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Îmze

Doc. Dr. Alk. Mustafa Aslan

Wekîlê Rêveber Enstitûyê

(Mor)

## NAVEROK

<b>NAVEROK</b> .....	I
<b>PÊŞGOTIN</b> .....	III
<b>KURTE</b> .....	V
<b>ÖZET</b> .....	VI
<b>SUMMARY</b> .....	VII
<b>KURTEBÊJE</b> .....	VIII
<b>DESTPÊK</b> .....	1
<b>BEŞA YEKEM</b> .....	6
<b>WÊJEYA BERAWIRDÎ</b> .....	6
1.1. Kurtedîroka Wêjeya Berawirdî .....	6
1.2. Ji Bo Wêjeya Berawirdî Çalakiya Wergêrê .....	16
<b>BEŞA DUYEM</b> .....	18
<b>JIYAN Ê KESAYETIYA WÊJEYÎ YA EREBÊ ŞEMO Ê YA MAKSÎM GORKÎ</b> .....	18
<b>2.1. EREBÊ ŞEMO</b> .....	18
2.1.1. Jiyan, Kesayet, Berhem .....	18
2.1.2. Nêrîna Wêjeyî ya Erebê Şemo .....	25
<b>2.2. MAKSÎM GORKÎ</b> .....	34
2.2.1. Jiyan, Kesayet, Berhem .....	34
2.2.2. Nêrîna Wêjeyî ya Maksîm Gorkî .....	39
<b>BEŞA SÊYEM</b> .....	48
<b>BERAWIRDKIRINA NAVEROKÎ Ê ŞÊWEYÎ YA ŞIVANÊ KURMANCA Ê SÊBAREYA MAKSÎM GORKÎ</b> .....	48
<b>3.1. CUDAHÎ Ê WEKHEVIYÊN JIYAN Ê NÊRÎNA WÊJEYÎ YÊN EREBÊ ŞEMO Ê MAKSÎM GORKÎ</b> .....	48
<b>3.2. BANDORA SERDEMÊ, NASNAMEYA POPULER A GORKÎ Ê BANDORA WÊ YA LI SER EREBÊ ŞEMO</b> .....	54
<b>3.3. BERAWIRDKIRINA HIN ŞOPÊN NAVEROKÎ</b> .....	56
3.3.1. Perwerde .....	56
3.3.2. Xebat .....	59

3.3.3. Çalakiyên Siyasî .....	61
3.3.4. Xizaniya Nivîskaran .....	62
3.3.5. Di Romanan de Nimûneyên Zargotinê .....	64
3.3.6. Şopên Jiyana Civakî.....	68
<b>3.4. BERAWIRDKIRINA HIN ŞOPÊN HUNERÎ.....</b>	<b>74</b>
3.4.1. Leheng .....	74
3.4.2. Cih (Mekan).....	82
3.4.3. Dem.....	87
3.4.4. Rewşa Vegêr .....	91
3.4.5. Rêzebûyer .....	95
3.4.6. Ziman û Şêwaz.....	98
<b>ENCAM.....</b>	<b>102</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>104</b>

## PÊŞGOTIN

Li ser rûyê erdê her gel xwedî wêje ye. Dibe ku ev wêje devkî be yan jî nivîskî. Her gel li gorî jiyan û têgihîştina xwe ya jiyanê ji xwe re wêjeyekê diafirîne. Lêbelê ev wêjeya ku gelekî ji xwe re afirandiye tu dem bi awayekî xwerû ji rihên wî gelî dernayê. Çawa ku mirov di jiyanê xwe de bi lebat in û bi kesan re dikevin nav danûstandinan, gel jî bi borîna dem û guherandina cihan re bi gelên dî re dikevin nav danûstandinê. Ev danûstandin li ser jiyan, bawerî û nêrînên gelan bandor çêdike. Piştî di afirandinên gelan de şopên van bandoran yan jî danûstandinan xuya dibin. Di berhemên wêjeyî de jî şopên van danûstandinan hene. Hin babet û dirûvên wêjeyî di navbera wêjeyan de diçin û tên. Bi gotineke dî wêjeyên gelan ji hevdu didin û distînin yan jî îlham didin hevdu.

Wêjeya berawirdî wekî qadeke akademîk, qada xebata xwe li ser van peywendiyên daniye. Ev qada xebatê li gorî nêrînên cihê li ser van têkiliyên wêjeyên gelan radiweste. Wêjeya berawirdî bi me nîşan dide ku nivîskar û helbestvanên gelan bi rêkên cuda ji wêjeyê de haydar dibin û ji wê wêjeyê sûd werdigirin. Ev rê dibe ku gerîna nivîskarekî li welatî cuda be, dibe ku bi saya zimananiya xwe xwendina wêjeyên cuda be yan jî dibe ku bi rêya berhemên werger be. Li vî derî jî rêya sûdwergerî bêtir, sûdwergerî bi xwe girîng e. Ev nivîskar û helbestvan li gorî van sûdwergerîyan xwe berhemên xwe diafirînin. Bi vî awayî jî têkilî û hemrengiyek di navbera du wêjeyan de pêk tê.

Dema ku Yekitiya Sovyetê ava dibe ji bo gelek gelên kêmar derfetên nivîsînê li vî welatî çêdibe. Li gorî polîtîkayên dewletê divê ziman û wêjeyên van gelan bihata bipêşxistin. Lê helbet ev gelên kêmar di nav derdora wêjeyî ya Sovyetê de û li ser coxrafyaya Sovyetê dijiyan. Nivîskar û helbestvanên van kêmaran çavên xwe bi atmosfera çandî û wêjeyî ya wê serdemê vedikirin û di afirandinên xwe de rasterast didan ser şopa wêjeyî ya

wê serdemê. Yek ji van gelên kêmar jî kurd bûn. Li gorî polîtîkaya dewletê di demeke kurt de gelek nivîskar û helbestvanên kurd radibin û berhemên wêjeyî diafirînin. Di afirandinên wan de jî rasterast meyl û endîşeyên giştî yên serdemê



xuyaye. Ev nivîskar di cureyên nû de berhemana diafirînê ku heta wê demê di wêjeya kurdî de mînakên wan tunene.

Erebê Şemo yek ji van nivîskarên kurd e ku li gorî endîşeyên dewleta nû ketiye nav kar û xebatên siyasî û wêjeyî. Di dîroka wêjeya kurdî de yekem romana kurdî dinivîsîne. Helbet di karên wêjeyî yê Erebe Şemo de hevtayiyek ligel rewşa wêjeyî ya serdema wî hebûye. Ji afirandinên wî, hêviyên polîtîkaya dewletê û meyla giştî ya wêjeyî xwe didin der. Di wan salan de Maksîm Gorkî di qada wêjeya Sovyetê de wekî kesekî pêşeng û otorîte siya xwe avêtiye ser hemû nivîskarên ciwan. Xebat û nêrînên wî yê wêjeyî ji van nivîskarên ciwan re bûne mînak û pêşeng. Erebe Şemo jî yek ji van nivîskarên ciwan bûye û xwe nêzî Maksîm Gorkî dîtîye, heta cihekî di bin tesîra wî de maye. Ji bo destnîşankirina van tesîran rêbaza “wêjeya berawirdî” riyek bû. Tesîra têkiliya van nivîskaran û her wiha hinek berhemên wan bû kakilê teza me.

Me ev xebat di çarçoveya gotinên jorîn de amade kir. Beşa yekem a vê xebatê ji bo wêjeya berawirdî û wergera wêjeyî hate veqetandin. Di beşa duyem de li ser jîyan û nêrîna wêjeyî ya Erebe Şemo û Maksîm Gorkî hate rawestîn. Ji van her du beşan armanc ew e ku ji bo beşa sêyem xîmek bê danîn. Lewra ji bo berawirdkirina berhemên du nivîskaran hewce ye ku pêşî qada xebatê û piştê jî nasîna nivîskaran pêk bê ku berawirdkirina wan zelaltir û xurtir bibe. Em di beşa sêyem a vê xebatê de bi giranî li ser berawirdkirina naverok û şêweya *Şivanê Kurmanca* û sêbareyên Maksîm Gorkî rawestiyan. Jixwe armanca sereke a vê xebatê ew e ku nevorak û teşeya van berhemana berawird bike û wekhevî û cudahiyên berhemana aşkere bike.

Ez dixwazim spasiyên xwe yê taybet pêşkêşî şêwirmendê xwe Ramazan Çeçen bikim. Lewra di her qonaxa amadekirina vê tezê de arîkariya min kiriye. Piştî nivîsandina her beşê, wî bi hûrgilî ev beş xwendîye û pêşniyazên xwe ji min re gotiye. Pirtûkxaneya xwe ji min re vekiriye û ji bo amadekirina tezê çavkaniyên nû pêşniyaz kiriye. Dîsa ez spasiya xwe pêşkêşî mamosteyên xwe yê Zülküf Ergün û Tahirhan Aydın dikim ku di jûriya teza min de cih girtin, bi pêşniyaz û şîroveyên xwe, wan ev tez xurtir kirin. Spas ji bo hevalên min ên hêja Yakup Aykaç, Mehmet Yonat, Mehmet Şirin Filiz û Mesut Arslan ku di pêvajoya nivîsandina vê tezê de bi pêşniyaz û dîwanên xwe gelek arîkariya min kirin.

## **KURTE**

### **BERAWIRDKIRINEK LI SER *ŞIVANÊ KURMANCA* Û SÊBAREYA MAKSÎM GORKÎ**

**FERHAT YILMAZ**

Li gorî nêrînên ekola wêjeya berawirdî ya fransî, pir asayî ye ku wêjeyeke bihêz û serdest bandor li ser wêjeyên di bihêle. Li gorî vê ekolê, wêjeyên nexurt naverok û teşeya wêjeyên bihêz ji xwe re mînak digirin. Lewra ne dûtî eqilan e ku romana yekemîn a kurdî ku di bin atmosfera ziman û wêjeya rûsî de derçûbe. Di dema Erebe Şemo de yek ji navdartîrîn nivîskarê wêjeya rûsî Maksîm Gorkî ye. Em ji jiyana Erebe Şemo û ji naveroka berhemên wî dizanin ku wî xwe nêzî Maksîm Gorkî ditiye û heta di hevdîtinekê de beşeke romana xwe bi rûsî pêşkêşî wî kiriye. Ji xeynî van têkiliyan jiyana wan a zaroktiyê û di ciwaniyê de naskirina wan a fikrên şoreşger jî gelek dişibin hev. Ji aliyekî din ve di şiklê romanê de nivîsandina serboriya van salan, romana pêşîn a Erebe Şemo û sêbareya Maksîm Gorkî derxistiye meydanê. Hebûna van hemû zemînan destûr dide ku hem mirov hem jiyana hem jî ji aliyê naverok û teşeyê ve berhemên wan berawird bike û tesîra Gorkî û berhemên wî yên pêşîn li ser romana pêşîn a Erebe Şemo destnîşan bike.

**Peyvên Sereke:** Wêjeya Berawirdî, Wergera Wêjeyî, Bandor, Erebe Şemo û Maksîm Gorkî, *Şivanê Kurmanca* û Sêbareya Maksîm Gorkî.

## ÖZET

### ŞIVANÊ KURMANCA İLE MAKSİM GORKİ'NİN ÜÇLEMESİ ÜZERİNE BİR KARŞILAŞTIRMA

FERHAT YILMAZ

Fransız karşılaştırmalı edebiyat ekolünün görüşlerine göre egemen ve güçlü bir edebiyatın diğer edebiyatları etkilemesi olağandır. Bu ekole göre zayıf edebiyatlar içerik ve şekil yönünden güçlü edebiyatları örnek alırlar. Bu yüzden ilk Kürt romanının Rus dili ve edebiyatı atmosferi içerisinde yazılmış olması akla uzak görünmüyor. Erebe Şemo'nun yaşadığı dönemde Maksim Gorki Rus edebiyatının en ünlü yazarlarından biridir. Biz Erebe Şemo'nun yaşamından ve eserlerinden biliyoruz ki o kendini Maksim Gorki'ye yakın görmüş ve bir görüşmesinde Rusça yazdığı romanının bir kısmını Maksim Gorki'ye sunmuştur. Bu ilişkiler dışında onların çocukluk ve gençlik dönemlerinde tanıştıkları devrimci fikirler de birbirine benzemektedir. Roman dünyasına aktardıkları bu çocukluk ve gençlik yılları Erebe Şemo'nun ilk romanını ve Maksim Gorki'nin de üçlemesini meydana getirmiştir. Bu tüm ortak zeminler bize onların hem şahsiyet hem yaşam hem de eserlerini içerik ve şekil yönünden karşılaştırmasını ve Maksim Gorki'nin üçlemesinin Erebe Şemo'nun ilk romanı üzerindeki etkisini tespit etme imkanını sunmaktadır.

**Anahtar Sözcükler:** Karşılaştırmalı Edebiyat, Edebi Çeviri, Etki, Erebe Şemo ve Maksim Gorki, *Şivanê Kurmanca* ve Maksim Gorki'nin Üçlemesi.

## SUMMARY

### A COMPARATIVE STUDY ON *ŞIVANÊ KURMANCA* AND TRILOGY OF MAXIM GORKY

FERHAT YILMAZ

According to French Comparative Literature, it is very natural for a powerful and dominant literature to have an effect on other literatures. This school supposes that the weak literatures take the strong literatures as models in terms of both style and content. Therefore, it is very understandable that the first Kurdish novel (*Şivanê Kurmanca*) was under the influence of Russian Language and Literature. In the times of Erebe Şemo, Maxim Gorky was one of the most important writers of Russian Literature. From his own life and his own writings, it is known that he felt himself more close to Maxim Gorky. Even, once at one of his meetings, he presented one part of his novel to him in Russian. Apart from these, their childhood and how they met with revolutionary ideas at their youth also resemble each other. Similarly, both Erebe Şemo in his first novel and Maxim Gorky in his trilogy wrote those times in the form autobiographical novel. That is to say, as a result of this context, it is plausible to compare them both in terms of their literary characters, their lives, and in terms of their style and content. Furthermore, the impacts of Gorky's life and his works can be seen and shown on the first novel of Erebe Şemo.

**Main words:** Comparative Literature, Literary Translation, Effects, Erebe Şemo and Maxim Gorky, *Şivanê Kurmanca* and Trilogy of Maxim Gorky.

## KURTEBÊJE

**amd.** : amadekar

**c.** : cild

**ç.** : çap

**dnd.** : di nav de

**h.b.** : heman berhem

**h.g.** : heman gotar

**hwd.** : her wekî dî

**j.** : jîmar

**r.** : rûpel

**vgz.** : veguhêzer

**wer.** : wergêr

**weş.** : weşanxane

## DESTPÊK

Wêjeya berawirdî yek ji şaxên zanista edebiyatê ye ku di sedsala 19an de wekî qadeke zanistî di xebatên akademîk de cihê xwe digire. Wêjeya berawirdî şaxeke zanista wêjeyê ye. Berawirdkirin ji navê xwe jî diyar e, bi du berheman çêdibe. Berawirdkirin hem di nav berhemên neteweyekê de hem jî di navbera berhemên navnetewî de jî tê kirin. Ligel vê, berhemên tên berawirdkirin dikarin hem ji berhemên hemdem hem jî ji yên nehevdem bibin. Peywir û erkê edebiyata berawirdî, di navbera du berheman de ji aliyê naverok, teşe û ramyariyê ve destnîşankirina wekhevî, dijayetî û hevpariya wan e. Wêjeya berawirdî hunereke sistematîk e ku di wêjeyê de wekhevî, bandor û nêzîkatîyê dike mijarên lêkolînê xwe.<sup>1</sup>

Di eslê xwe de di dîroka wêjeyê de berdewamiya têkiliyê heye. “Li her derê peywendiyek û li her derê mînakek heye. Bi tena serê xwe tu bûyer û tu wêje, bê bûyer û wêjeyên dî nayên qebûlkirin; eger bîna pejirandin dê baş neyên fêmkirin.”<sup>2</sup> Çand û wêjeya netewî di pêvajoya dîrokê de di bin bandora çand û wêjeyên netewên dî de dimîne û li wan bandor dike.

Armanca edebiyata berawirdî, tesbîtkirina taybetiyên hevbeş ên berhemên edebiyatên cuda ye.<sup>3</sup> Wisa dixuye ku nasîna wêje û gelên dî bo dewlemendkirina wêje û çandekê pêwîstî ye. Eger di navbera wêje û şaristaniyê de peywendiyek bê danîn, çawa ku şaristaniyek bê rasthatina li yekê dî nikare xwe bi pêş ve bixe, bi heman rengî wêjeyek bi tena serê xwe nikare sînoren xwe fireh bike. Eger em bixwazin naverok, şewaz û cureyên nû di wêjeya me de çêbin, rehetirîn rê ew e ku em bergeha wêjeya xwe ji wêjeyên gelên dî re vekin.

Her çiqas wekî nakokî jî bixuye, di bingeha destpêkirina wêjeya berawirdî de nêrîna xizmetê ji bo wêjeya netewî heye. Netewe bo ku wêjeya xwe baştir nas bikin û hêmayên wêjeya xwe fêmkirin, çav li wêjeyên neteweyên dî gerandine; xwestine

<sup>1</sup> Emel Kefeli, *Karşılaştırmalı Edebiyat İncelemeleri*, weş. Kitapevi, İstanbul, 2000, r. 9.

<sup>2</sup> Kamil Aydın, *Karşılaştırmalı Edebiyat Günümüz Postmodern Bağlamında Algılanışı*, weş. Birey, İstanbul, 2008, r. 17.

<sup>3</sup> İncü Engünün, *Mukayeseli Edebiyat*, weş. Dergah, İstanbul, 2011, r. 18-19.

wan vekolînin û binirxînin. Ji ber vê yekê jî çavên lêkolîner û wêjevanan her dem li ser netewe û derên dî, bi taybetî ên pêşketî bûne ku bizanin ka gelo ew çi dikin.<sup>4</sup> Nivîskar bi şopandin û xwendinên wêjeyên dî ji wan tesîr digire û berhemên xwe dewlemend dike, lewra jî di navbera nivîskar û wêjeyan de peywendiyek çêdibe.

Gürsel Aytaç dibêje ku wêjeya cîhanê bi têra xwe di nav peywendiyekê de ye û ji Sabahattin Eyüboğlu jêgirtineke wiha dike:

“Dibêjin jiyana Goethe ne jiyana wî bi xwe ye; dîroka bandoran e ku wî girtiye. Nietzsche çi ye ku gotiye ez derûnnasiyê ji Dostoyevski hîn bûme tu tişt ji resenbûna xwe kêr nekirîye. Berhemên klasîk li xwe mikur dihatin û îdia dikirin ku di bin bandora berhemên berê de mane. Baudelaire ji helbestvanê resenbûnê Poe, ne bi tirsê bi têra dilê xwe vexwariye. Gide, îro ji resenbûnê kokan nîne, ji hemû çavkaniyên bandorker vexwariye hêj jî tîbûna xwe neşikandiye.”<sup>5</sup>

Wisa dixuye ku hem di navbera nivîskarên heman welatî de hem jî di navbera nivîskarên welatên cuda de lihevbandorkirin teqez pêk tê û ev lihevbandorkirin jî kemilîna nivîskaran hêsantir dike.

Divê bê qebûlkirin ku di civakên pirçandî û pirzimanî de lihevbandorkirin jixwe bi xwezayî pêk tê. Li Sovyetê nemaze li Qafkasan gelek ziman û çand ligel hev dijiyan. Lewra jî rewşenbîrên wekî Erebe Şemo pirçandî û pirzimanî bûn. Erebe Şemo di nav çand û wêjeya gelên Qafkasyayê de mezin bibû û bi ziman û wêjeya ûris û gelên Qafkasê kemilîbû. Beriya ku ew berhemên nivîskî yên wêjeya xwe bixwîne, wî ji wêjeyên gelên dî gelek nimûne xwendine. Di destpêka sedsala 20î de ji ber serweriya ûrisan li Sovyetê ziman û wêjeya wan berbelav û bandorker bûye. Lewra jî ihtîmala ku Erebe Şemo di bin tesîra wêjeya hemdem a ûrisan de bimîne pir tebiî ye.

Me ji bo vê tezê ji zanista wêjeya berawirdî sûd wergirt. Lewra ev qada zanista wêjeyî derfet dide me ku em wêjeya xwe baştir nas bikin û rewşa wê û cihê wê ye di wêjeya cîhanê de di çi astê de ye tesbît bikin. Bi îmkanên wêjeya berawirdî,

<sup>4</sup> Mesut Tekşan, *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, weş. Kriter, İstanbul, 2011, r. 23

<sup>5</sup> Sabahattin Eyüboğlu, *Sanat Üzerine Denemeler ve Eleştiriler*, İstanbul, 1981, vgz. Gürsel Aytaç, *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, çap Say, İstanbul, 2009, r. 31

em dikarin wêjeya xwe ligel wêjeyên neteweyên di berawird bikin. Ev yek jî di wêjeyên neteweyan de hêma, cure û naverokên hevpar, cuda û nêzî hev derdixe meydanê. Bi riya wêjeya berawirdî bandorên ku wêjeyên di li ser wêjeya me çêdikin aşkere dibe. Lewma li gorî derfetên wêjeya berawirdî bi xwendina Erebe Şemo û Maksîm Gorkî dê derbarê romana kurdî ya Sovyetê ya salên pêşîn de û derheqê nêrîna wêjeyî ya wê serdemê de, ku xwe di romanên de diyar kiriye, agahî bide me.

Ji nivîsandina vê tezê armanc ev e ku romana Erebe Şemo *Şivanê Kurmanca*<sup>6</sup> ligel romanên Maksîm Gorkî yê *Zaroktiya Min*<sup>7</sup>, *Di Nav Insanan De*<sup>8</sup> û *Zanîngehên Min*<sup>9</sup> di bin banê nêrînên berawirdkerên fransîz de ji aliyê naverok û teşeyê ve bîn berawirdkirin. Em dizanin ku Maksîm Gorkî û Erebe Şemo di heman serdemê de jiyane û girêdayî heman derdora çandî û ekola wêjeyî ne. Em ê hewl bidin derxin meydanê ka meylên serdemekê, hevnasîna van her du nivîskaran çawa naveroka hin berhemên wêjeyî tayîn kirine. Ji ber ku em dizanin wêjeya kurdên Sovyetê ji aliyê teşe û naverokê ve di bin tesîrên dewrekê de maye. Ev jî rê li ber me vedike ku em bidin nav naveroka romanên her du nivîskaran ku şopên wan ên wekhev, cuda û nêzî hev destnîşan bikin.

Erebe Şemo û Maksîm Gorkî du nivîskarên Yekitiya Sovyetê bûne. Dema ku Erebe Şemo hêdî hêdî dikeve nav kar û barên nivîsê, Maksîm Gorkî li Sovyetê kesekî navdar bû. Di qada nivîskariyê de hem derdorên siyasî hem jî yê wêjeyî ew wekî pêşeng û rêber didîtin. Berhem û xebatên wî ji bo nêrîna wêjeyî wekî mînak dihatin nîşandin. Maksîm Gorkî her dem piştgirî dida nîşên ciwan ku hewl bidin xwe û dest bi nivîsê bikin. Ciwanên ku di bajarokan de dijîyan xebatên xwe jê re dişandin û Maksîm Gorkî ew dixwendin. Piştî nêrîn û rexneyên xwe ji wan re dişand.<sup>10</sup> Bi vî rengî Erebe Şemo jî dema ku rastî Maksîm Gorkî tê, berhema xwe ya *Şivanê Kurmanca* pêşkêşî wî dike. Belê, Maksîm Gorkî yek ji navdartirîn nivîskarê dema xwe û welatê xwe bû. Vê yekê jî bandor li nîşên nivîskarên ciwan dikir. Têkiliya van her du nivîskaran çî ji aliyê girêdayê heman çand û nêrîna wêjeyî û çî hevdîtina

<sup>6</sup> Erebe Şemo, *Şivanê Kurmanca*, weş. Lîs, İstanbul, 2009.

<sup>7</sup> Maksîm Gorkî, *Çocukluğum*, wer. Ergin Altay, weş. Can, İstanbul, 2013.

<sup>8</sup> Maksîm Gorkî, *İnsanlar Arasında*, wer. Ergin Altay, weş. Can, İstanbul, 2014.

<sup>9</sup> Maksîm Gorkî, *Benim Üniversitelerim*, Ergin Altay, weş. Can, İstanbul, 2014.

<sup>10</sup> Akif Kurtuluş, *Politika ve Sanat Ekim Devrimi (1917-1932)*, weş. Avesta, İstanbul, 1996, r. 113.



wan, ku nîşaneyê xwenêzîkdîtina Erebe Şemo li Maksîm Gorkî ye, ji bo me bû armanc ku em li ser van her du nivîskaran bixebitin.

Me ji bo vê tezê berhema Erebe Şemo *Şivanê Kurmanca* û ên Maksîm Gorkî *Zaroktiya Min, Di Nav Insanan De* û *Zanîngehên Min* hilbijartin. Lewra romana *Şivanê Kurmanca* romaneke otobiyografîk e. Bi heman awayî romanên *Zaroktiya Min, Di Nav Insanan De* û *Zanîngehên Min* jî otobiyografîk in. Ji ber vê taybetiya van romanên me biryar da ku berawirdkirina xwe bi van romanên sînor bikin. Li vê derê pirsek hat bîra me: Mirov dikare bibêje Maksîm Gorkî ji bo Erebe Şemo bûye mînak û rê li ber vekiriye ku ew jî romana xwe ya yekem wekî otobiyografîk binivîse? Di nav tehlîlên me de bersiva vê pirsê jî heye.

Di vê xebata xwe de me girîngî daye rêbaza rexne û lêkolîna dîrokî ya wêjeya berawirdî. Li gorî vê rêbazê jiyanê nivîskaran ji bo afirandina berhemên wan gelekî girîng e. Lewra derdora nivîskar, perwerdeya wî û mercên ku ew tê de jiyaye gelekî bandor li ser wî/ê dike. Ji ber jiyanê wekhev a Erebe Şemo û Maksîm Gorkî û berhemên wan ên otobiyografîk, me pêwîstî dît ku em beşeke vê xebata xwe ji bo jiyanê û nêrînên van veqetînin. Bi vê yekê dê berawirdkirina me xurtir bibe.

Eger em li ser malzemeyên xwe jî çend tiştan bibêjin, divê bibêjim ku pirtûka Erebe Şemo *Şivanê Kurmanca* bi kurmancî bi tîpên latînîzekirî hate xwendin. Pirtûka *Şivanê Kurmanca* ji weşanxana Lîsê derketiye. *Şivanê Kurmanca* ku bi pêşgotîneke Mustafa Aydoğan derketiye, di vê pêşgotinê de hatiye gotin ku wan her hewl dane ku bi halê wê yê orjînal çap bikin. Em di beşa jiyanê Erebe Şemo de ji bo salên 1937-56î rastî pirsgerêkên çavkaniyan hatin. Erebe Şemo di navbera van 19 salan de li Sibîryayê sirgûn bû.<sup>11</sup> Di destê me de li ser jiyanê wî ya li wê derê û xebatên wî çavkanî tunene.

Di vê xebatê de pirtûkên Maksîm Gorkî yên ku me jê sîdwegirtine ne bi zimanê resen in, me ev pirtûk bi zimanê tirkî xwendin. Îstîfadekirina ji pirtûkên tirkî derfet dide xwendevanên ku bi rûsî nizanin jî bikaribin li van pirtûkan binêrin û li ser berawirdkirina me bigihîjin qenaetekê. Pirtûkên ku me ji bo tezê bi kar anîn pêwîst bû ku bi wergerên baş bibûna. Lewma me ji bo wergera her sê romanên jî

---

<sup>11</sup> Eskerê Boyîk, *h.b.*, r. 109-110

weşanxaneyê Canê tercîh kirin. Jixwe ev weşanxane li Tirkiyê di xebatên wergerê de xwediyê prestîjekê ye.

Bi qasî ku em dizanin di kurdî<sup>12</sup> de bi rêbaza wêjeya berawirdî xebatên akademîk kêr in. Piraniya xebatên kurdî ku di qada wêjeya berawirdî de hatine kirin, bi tirkî ne. Hêvî ew e ku ev xebat ji bo vî warî bibe nimûneyek. Pariyek jî ev valahî bû ku berê me da xebateke wiha. Akademiya kurdî ev çend salên dawî ava bûye û di vê qadê de xebatên sistematîk çênebûne û berhem nehatine nivîsandin. Ji ber vê yekê çavkaniyên me yan berhemên bo tirkî hatine wergerandin yan jî berhemên zanyarên tirk in. Di berhemên bo tirkî hatine wergerandin de carinan navên resen ên pirtûk, kovar û saziyan nehatine nivîsîn. Di van wergeran de bi giranî navê wan ên wergerî (tirkî) hene. Me jî ji ber vê yekê di teza xwe de wekî navê resen cih da navên wan ên tirkî. Di tezê de jêgirtinên berhemên Maksîm Gorkî ji tirkî hatine wergerandin. Wergerên wan ji aliyê me ve hatine kirin.

---

<sup>12</sup> Di vê tezê de me peyva kurdî di dewsa kurmançî de bi kar aniyê.

## BEŞA YEKEM

### WÊJEYA BERAWIRDÎ

#### 1.1. Kurtedîroka Wêjeya Berawirdî

Ji destpêka mirovahiyê heta niha, insanan ji bo du rewş yan jî du tiştan rêbaza berawirdkirinê bi kar anîne. Bi vê helwesta xwe xwestine derbarê rewşa heyî yan jî tiştên ku li ser tê fikirîn zelaltir bikin, çawaniya tiştan bi berawirdkirinê xurtir bikin, yekê ji yeka dîtir ji aliyê taybetiyên wê ve baştir an jî xirabtir aşkere bikin. Pêşiya sedsala 18an jî berawirdkirin wekî metodeke zanistî di zanistên civakî û ezmûnî de dihate bikaranîn. Di sedsala 18an de zanyarên wêjeyê di lêkolînên xwe yên wêjeyî de cih dane vê têgehê. Di bingeha xwe de wêjeya berawirdî peywira pêwendiya wêjeya netewî û biyanî hildaye ser milê xwe û di dawiya sedsala 18an û çaryeka pêşîn a sedsala 19an de ev rêbaz ketiye nav xebatên zanista wêjeyê.<sup>13</sup> Lêbelê ji destpêkê ve têgeha “wêjeya berawirdî” di xwe de wateyeke problematîk dihewîne. Ev yek jî bûye sedem ku xebatên akademîk yên vê qadê qels bimînin.<sup>14</sup> Îro jî çî pênaseya wêjeya berawirdî çî naveroka wê pak nehatine sînorkirin. Rêbazên vê qadê hêj jî mijara gengeşî û behskirinê ne.

Wêjeya berawirdî jî wekî teoriya wêjeyê, dîroka wêjeyê û rexneya wêjeyê di pêvajoyeke dîrokî re derbas bûye. Lewra Êwra klasîk çawa ku ji bo zanista wêjeyê destpêk tê qebûlkirin, bi heman awayî ji bo wêjeya berawirdî jî ev dewr wekî destpêk tê pejirandin. Di dîroka wêjeyê de yan jî di qada felsefeyê de nivîskaran berhem an jî nêrîn berawird kirine. Wekî mînak; Platon di pirtûka xwe ya *Dewletê* de gava ku li ser hunerê û bi taybetî li ser wêjeyê şîroveyên xwe vedibêje, wêjeyê bi zanistên civakî re, wekî felsefe, berawird dike û wêjeyê wekî teqlîdê (mîmesîs) dinirxîne. Arîsto jî di pirtûka xwe ya *Poetikayê* de rêbaza berawirdkirinê bi kar tîne. Arîsto di wê baweriyê de bû ku divê wêje wekî perwerdeyê bê dîtin û ev perwerde jî divê ser îdealeke bê afirandin. Arîsto di heman berhemê de wêjeyê bi zanistên dî re dide

---

<sup>13</sup> Tekşan, *b.h.*, r. 24.

<sup>14</sup> Rene Wellek-Austin Warren, *Edebiyat Teorisi*, wer. Ö. Faruk Huyugüzel, weş. Dergah, İstanbul, 2013, r. 53.

berhev. Bi van agahiyan mirov dikare dîroka wêjeya berawirdî ji dema Arîsto bide destpêkirin.<sup>15</sup>

Di qada wêjeyê de jî em dibînin ku hêj di demên zû de hinek berawird hatine kirin. John Ryden (1631-1700) nivîskarekî girîng ê wêjeya îngilîzî yê sedsala 18an e, di ceribandineke xwe ya bi navê “Of Dramatik Poessie”, ku di 1688an de hatiye weşandin, li ser vê mijarê radiweste: Di ceribandinê de çar heval hene. Di keştiyeke biçûk de ku li ser rûbarê Thamasê ye, rûniştine û di navbera xwe de li ser dramaya antîk û nûjen (sedsala 17an) gengeşî dikin. Mijareke di ya ku ev heval serê xwe pê diêşînin ev e: Gelo fransîz an îngilîz di dramayê de pêşketîtir in. Lessing (1729-1781) ku wekî nivîskarekî dewra Rewşengeriye tê nasîn li ser wêjeyê rêzename nivîsandiye. Di nameya xwe ya hevdehemîn de (Briefe, die neueste Literatur betreffend-1759) ku navdar e, têkiliya wêjeya fransîz-îngilîz û ya Antîk bi awayekî ecêb tîne ziman. Dibêje ku Shakespeare ji fransîzan zehftir nêzîkî wêjeya antîk e. Li gorî wî fransîzan ji teqlîda nimûneyên wêjeya antîk pê ve tiştê nekirine. Li gorî Lessing şanoya îngilîz û almanan xizmên hev in û delîla vê ya mezin jî destana Dr. Faustus e. Tê zanîn ku ev destaneke gelêrî ya almanan e. Marlowe di sedsala 16an de ew destan veguhêzt şanoya îngilîzan. Friedrich Schlegel (1772-1829), ji berawirdkirinê zehftir dixwaze “yekitiya wêjeya nûjen” pêk bîne. Di sala 1797an de bi vê armancê li ser felsefeya hunerê nivîsek dinivîse: “Über das Studium der griechischen Poessie” (Li ser Fêrkirina Helbesta Yewnanan) ku tê de pêşî behsa helbesta yewnan dike û piştê qal dike ku ev helbest çawa derbasî wêjeya nûjen (yanê êwra Romantîzmê) bûne û divê çawa ew derbas bibûna.<sup>16</sup> Li Rojhilata Navîn jî di wêjeya dîwanê de helbestvan û nivîskar haj ji berhemên cîranên xwe hebûne. Di vê dewrê de di navbera wêjeyên ereb, fars, tirk û kurdan de di hêlên teşê û naverokê de her peywendiyek hebûye. Pirzimanzaniya helbestavanên vê êwrê derfeta ji hev sûdwegirtinê hêsantir kiriye. Gelek ji wan hunera helbestvaniya xwe û ya yekî di berawird kirine. Wekî mînak; Melayê Cizirî (1567-1640) zimanên erebî, farsî, tirkî û hemî zaravayên kurdî zanibûye.<sup>17</sup> Di xezeleke xwe de cih daye vê beytê: “Ger lu’lu’ê

---

<sup>15</sup> Aydın, *b.h.*, r. 19-20.

<sup>16</sup> Aytaç, *b.h.*, r. 23-25.

<sup>17</sup> Molla Ehmed-i Cizirî, *Divan, Türkçesi: Osman Tunç*, weş. Kent Yayınları, İstanbul, 2007, r. 7.

mensûri ji nezmê tu dixwazî/Wer şî'rê Melê bîn te bi Şîrazî çi hacet".<sup>18</sup> Di vê beytê de xuya dike ku Mela ji wêjeya farisî yanê ji hunera wêjeyî ya Şîrazî xwedîxeber e û hunera xwe ligel ya Şîrazî berawird dike.

Dema ku qala wêjeya berawirdî hate kirin, amancek ji vê qadê jî ew bû ku ev qad têkiliyên wêjeyan dane. Bi gotineke di van wêjeyan wekî yek wêje bibîne. Yekem car qala yekparebûna wêjeyê ji aliyê Friedrich Schlegelê (1772-1829) alman ve hatiye bilêvkirin. Li ser vê nêrîna Schlegel distûra yekpareyî ya Romantîzmê hebû ku xwe di qada wêjeyê de dida der. Di nêrîna yekgirtîbûna wêjeyê de têgeha "Weltlîterature" (Wêjeya Cîhanê) jî ji hêla Goethe ve hatiye pênasekirin. Ev têgeh ji bo bingeha xebatên wêjeya berawirdî xîmek e. Li gor Goethe, xezneyeke wêjeyî a ku aîdê hemî milletan e heye û bingeha vê wêjeyê jî berhemên klasîk in. Ji bo Goethe di dinê de berhemek ne pêwîst e navdar (Weltaufigkeit) bibe; lê lazim e ku ev berhem di xwe de hemî dinyayîyan (Welthaltigkeit) bihewîne.<sup>19</sup> Yan jî bi gotineke di, berhemeke wêjeyî dema ku karî bandoreke saxlem li ser yekê di hişt, wê çaxê em ê bikarin bibêjin ku dê ev berhem bi bandortir be.<sup>20</sup>

Di zanistên civakî de jî rêbaza berawirdkirinê wekî rêbazeke zanistî hat pejirandkirin. Ev rêbaz di qada wêjeyê de jî tê bikaranîn û bi vî awayî jî wêjeya berawirdî derket holê. Rêbaza berawirdkirinê berê di zanistên di de dihat bikaranîn. Di qada berawirdkirinê de nivîsa Goethe ya "Karşılaştırmalı Anatomi" (Anatomiya Berawirdî) ku di sala 1795an de hatiye nivîsandin, wekî nivîsa pêşîn ya vî warî tê qebûlkirin.<sup>21</sup> Ji bo ku di fêrkirina wêjeyê de bê emilandin li Fransayê di sala 1816an de bi navê *Cours de Litterature Comparée* bi fransîzî antolojiyêke rêzeyî derketiye. Ji bo vê antolojiya rêzeyî navê "wêjeya berawirdî" hatiye bikaranîn. Tê dîtin ku têgeh ji du peyvên pêk tê: Wêje û berawird. Bêjeya duyem ji îngilîziya navîn tê ku di eslê xwe de ji peyva latînî "comparativusê" welidiye. Bikaranîna vê peyvê heta Shakespeare diçe. Lewma Falstaff ku lehengê navdar ê Shakespeare ye, wiha pênaseya Prince Hall kiribû: "The most comparative, rascaliest, sweet young prince"

---

<sup>18</sup> Molla Ehmedê Cizîrî, *Dîwan(Metnê Kurdî-Türkçe Çevirisi)*, wer. Osman Tunç, weş. Nûbihar, Stanbol, 2008, r. 268.

<sup>19</sup> Aytaç, *h.b.*, r. 7-9.

<sup>20</sup> David Damrosch, *Dünya Edebiyatı Nedir?*, wer. Oğul Köseoğlu, weş. İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2013, r. 5.

<sup>21</sup> Tekşan, *h.b.*, r. 24.

(mîrzayê ciwan ê pir ezîz, bîaqîl û berawirdker).<sup>22</sup> Terma “wêjeya berawirdî” teqîben di sala 1827an de ji aliyê Willemain li Fransayê hatiye bikaranîn. Çi ye ku ev nav berbelav bûye Tiegman jî vê têgehê dipejirîne. Piştî René Wellek jî heman sedemê vê navê bi kar tîne.<sup>23</sup>

Dema ku mirov berê xwe dide dîroka pêvajoya wêjeya berawirdî ya di nav hemî gelan de Fransa di vê qadê de bi afirandina ekola pêşîn û bibandor balê dikişîne ser xwe. Philarete Charles di sala 1835an de bi navê “Litterature Strangère Comparée” dersek daye û ev ders piştî di *Reveu de Parisê* de weşiyaye. Ev kevneşopîya fransîyan ku bi awayê wane û semîneran dest pê kir, bi xebatên nêrîna Frederic Ozanam a berawirdkirina wêjeyên Ewropayê û bi xebatên nêrîna Louis Benleow a dîroka berawirdkirina wêjeyan domiyaye.<sup>24</sup> Brunetiére bi waneyên xwe yên herikbar ku li Yûksek Öğretmen Okulu (Dibistana Bilind a Gihandina Mamosteyan) dida û bi gotarên xwe ku di *Revue de Deux Mondesê* (Kovara Du Cîhanan) de diweşand ji bo xurtkirina wêjeya berawirdî xizmetên mezin kiriye.<sup>25</sup> Joseph Texte di destpêka sedsala 20î de bi xebata li ser têgehên “kozmpolîtîzm”, “esprit europeen” (rihê Ewropa) vê qadê di nav wêjezanan de demeke dirêj mayînde kiriye.<sup>26</sup>

Fransa derdora navîna sedsala 19an bûye xwedî hêzeke kolonyal. Ev pêşketin girêdayê pêşketinên wê yên di hêlên aborî de bû ku xwe li ser endûstriyeyeke bihêz bilind dikir. Fransî jî ber hêza xwe û belavbûna bandora vê hêzê nav welatên kolonyal, wan gihast wê baweriyê ku ziman û wêjeya wan li ser ziman û wêjeyên gelên di re ne. Ji ber vê rewşa xwe, wan li wêjeya berawirdî bi vî çavî dinêhartin: Ew di navbera gelan de wekî veguhêzerê çandî ye û danûstandinên çandî pêk tîne. Bi saya vê nêrîna xwe jî teoriya “lêkolînên bandorê” anîne qada wêjeya berawirdî. Li gorî vê êkolê pêhesîna bandorlihevîkirina wêje û çandan karê pêşîn e ku bê diyarkirin. Piştî jî çî ye ku fransîyan wêje û çanda xwe bilind didîtin, xwe wekî ku ew “dide”, gelên di jî “distîne” dihesiband.

---

<sup>22</sup> Aydın, *h.b.*, r. 18.

<sup>23</sup> Engünün, *b.h.*, r. 17.

<sup>24</sup> Aydın, *h.b.*, r. 27.

<sup>25</sup> Paul Van Tieghem, *Mukayeseli Edebiyat*, wer. Yusuf Şerif Kılıçel, weş. Maarif Matbaası, Ankara, 1943, r. 24-26.

<sup>26</sup> Tekşan, *h.b.*, r. 29-30.

Di destpêka sedsala 19an de Ewrûpayê ji bo dinyayê çî wate hildabe li ser milên xwe bi heman awayî Fransayê jî ji bo hemî Ewroyayê heman wate daniye ser milên xwe. Xebatên ku pêk dihatin bi vê armancê dihatin kirin ku çandekê bi taybetî jî çanda fransiyan li ser çandekê di re bidin nîşan. Her çiqas wêjeya berawirdî wekî kujerê neteweperestiyê dihate şayesandin jî xebatên dihatin kirin ne di vê çarçovê de bûn. Li gorî vê ekolê rehên wêjeya berawirdî jî ne cîhanî ye belkî di wêjeya Ewropî de ev reh divê bê dîtin.<sup>27</sup>

Kesên wekî Abel Villemain, J.J. Ampère, Philarète Charles, Fernand Baldensperger, Paul Hazard û Paul Van Tieghem di vê qadê de demeke dirêj kedane. Wan xwestine bêtir fêhma pozîvîst a dema xwe di qada wêjeya berawirdî de pêk bînin. Yanê ekola fransî di demên pêşîn de ji ber bandora pozîtîvîzmê li ser xebatên bandorê sekiniye. Lêbelê piştî salên 1950yan dikeve dewra xwe ya duyem û meyleke nû dest pê dike. Meyla nû bi rêberiya Jean-Marie Carré çêdibe û xwendekarê wî M.A. Guyard di pêşgotina berhema xwe ya bi navê *La Littérature Comparée* (Wêjeya Berawirdî) de dibêje ku pêwîst e wêjeya berawirdî ji nû ve bê pênasekirin. Carré ji bandorê zêdetir li ser jêgirtinê disekine. Li gorî wî wêjeya berawirdî ne divê li ser danûstandinan raweste ku di navbera wêjeyan de pêk tê. Ji vê bêhtir lazim e ku jêgirtin (bandor) çawa, kengê, çima çêbûye û çî awayê dirûv guherandiye bê aşkerekirin. Carré di jêgirtinê de li ser girîngiya hêmayê disekine. Li gorî wî di diyarkirinên pêvajoyên nivîsandinê de faktora mezin hêma ne ku gel di derbarê hev de têgehiştine. Mirov dikare bibêje ku ekola fransîz peywendiyên nivîskî bêhtir di ser xêza çandî û navberçandî re, di pêvajoyên derî nivîskî de digere. Rêbaza nivîsariya zanistî pozîtîvîzm û biyografi bi pêştir in. Taybetiya nêrîna vê rêbazê, xebat bi diyardeyên teqez, pêvajoyên derî nivîskî û li ser belgeyan tê meşandin.<sup>28</sup>

Li Almanyayê jî li gorî meyla giştî ya Ewropayê wêjeya berawirdî di navîna sedsala 19an de dirûveke çalak hilgirtiye. Bi gotina A.M. Rousseau-CI. Pihois her çiqas li Almanyayê kursiyê ku di vê qadê de pispor bûne kêm bibin jî,

---

<sup>27</sup> Aydın, *h.b.*, r. 116.

<sup>28</sup> Ali Osman Öztürk, *Karşılaştırmalı Edebiyat Araştırmaları*, weş. Sel-ün Yayın Evi, Konya, 1998, r. 21-24.

berêxwedayîna wêjeya berawirdî ya almanan ji Qirna Navîn dest pê dike. Bi gotineke dî bê Almanya, bê Herder û bê Goethe wêjeya berawirdî ya almanan çênedibû.<sup>29</sup>

Li Almanyayê pêhesîna derfetên wêjeya berawirdî ji Fransayê derengtir dest pê kiriye. Bi şopandina rêça helbestvan û feylesof Herder, li hêvî mayîna dîrokeke wêjeyeke gelemper (Allgemeine Literaturgeschichte) çêbûye, lê ev dîroka wêjeyeke gelemper nedikarîbû zû derkeve meydanê. Li gorî Aytaç di vê rewşê de bandora “Germanistik”ê (ziman û wêjeya almanan) heye. Xwe wekî şaxek nîşandana vê beşê, neteweperestiyê bi pêş xistiye. Lewra jî dîroka wêjeya berawirdî ya gelemper kariye di navîna sedsala 19an de derkeve holê.<sup>30</sup> Pêşgotinek ku di Kewçêra 1749an de weşiyaye, di vê qadê de xebata ewilîn ya derbarê wate, fonksiyon û nirxên wêjeya berawirdî ya Almanyayê bûye. Berhema Sufle ya ku lêkolînên li ser wêjeya berawirdî di sala 1886an de bi navê *Alman medeniyetinin Fransa üzerine tesirinin tarihi* (Dîroka bandora şaristana almanan li ser Fransayê) derketiye.<sup>31</sup> Li Almanyayê wêjeya berawirdî di salên 1850yan de wekî şaxeke zanistê hatiye dîtin. Ev yek jî saya xebatên li ser mijar û motîfan bûye. Wêjezanên alman di van xebatan de hewl dane ku bandorên li ser mijar û motîfan çêbûne aşkere bikin.<sup>32</sup>

Ji ber ku gelê alman li welatên cuda dijîn, lewra vê êkolê nêrîna xwe zêdetir li ser zanîna rehê netewî hûr kiriye. Ekola almanan pêşî bala xwe daye berawirdkirina sonatên lîrik. Paşê ji ber ku alman li welatên cuda dijîn û zimanê wan jî eynî bûye, vê êkolê hewl daye ku têkilî û danûstandinên van almanan aşkere bike. Lewra jî bala xwe daye xebatên wêjeya devkî û folklorê. Bi vê yekê jî, dê reh û ruhê netewî diyar bibûya. Ev lixwegerîn û hestên netewî ewqas bi pêş ketin ku di heyama rêveberiya Hitler de wêjeyên gelên dî hatin radeya qedexekirinê. Vê yekê jî wêjeya almanan xiste rewşeke xwebixweyî û girtî. Ji ber van reftarên ekola almanan heta nîva salên 20î jî ekola frasiyan li Ewrûpayê bi tinê serê xwe hukmferma bûye. Ingilîstan ligel hêza xwe ya kolonyal jî di sedsala 20an de ekola fransiyan şopandiye.<sup>33</sup>

---

<sup>29</sup> A.M. Rousseau-CI. Pihois, *Karşılaştırmalı Edebiyat*, wer. Mehmet Yazgan, weş. Milli Eğitim Bakanlığı, r. 41.

<sup>30</sup> Aytaç, *h.b.*, r. 50.

<sup>31</sup> Van Tieghem, *h.b.*, r. 24.

<sup>32</sup> Aydın, *h.b.*, r. 30.

<sup>33</sup> Tekşan, *h.b.*, r. 91.



Matthew Arnold û Sainstsbury li Ingilîstanê wekî kesên pêşîn ku li ser wêjeya berawirdî xebat kirine tên nasîn. Lê li vî welatî qada wêjeya berawirdî zêde bi pêş neketiye, lewra îngilîzan şûna ku bala xwe bidin vê qadê berê xwe dane zanista wêjeyê. Ji ber vê yekê li Ingilîstanê û li mêtîngehên wê, xebatên wêjeya berawirdî zêde balê nekişandine ser xwe.

Li Ingilîstanê bandora Arnold li ser wêjeya berawirdî nikare bê piştguhkirin. Lêbelê di dawiya sedsala 19an de kesên nû derketine ku di vê qadê de dengê xwe bilind kirine. Di nav van de kesê ku navê wî pêşîn bê gotin H.M. Posnett e. Di sala 1886an de berhema xwe ya berfireh ku bo aşkerekirina mahiyeta wêjeya berawirdî hatibû nivîsandin bi navê *Comparative Literature* (Wêjeya Berawirdî) diweşîne.<sup>34</sup> Posnett her çiqas bi vê pirtûkê berhemeke bingehîn ya xebata qadeke nû afirandibe jî, ne li Ingilîstanê ne jî li Zelandaya Nû deng vedaye. Lewra ji ber bandora demê, mirov di bin bandora hestên netewî de bûn û wan xebatên qada wêjeya berawirdî biçûk didîtin. Ber bi dawiya sedsala 19an tê dîtîn ku wêjeya berawirdî li Ingilîstanê çalakiyeke berbiçav bi dest xistiye. Sedema vê ya girîngtirîn, eleqaya ku ji bo wêjeya Iskandînavyayê bû. Ev eleqe xwe bi taybetî di hezkirina Ibsen de xwe dide der. Di sala 1880an de berhemên Ibsen tên wergerandin. Her çend di destpêka sedsala 20an de li Ingilîstanê wêjeya berawirdî di qada akademyê de rasterast nehatibe pejirandin jî xebat û lêkolînên vê qadê kêr bûn. Eger em bi wêjeya berawirdî li Brîtanayê ji aliyên xwedîbûna lêkolînên zanistî, beşên heyî, kursî, kovarên weşiyayî binêrin em ê bibînin ku Girava Brîtanayê gelekî li paş Ewropa û bakurê Amerîkayê maye. Avabûna kursiyên li Ewrûpayê piştî salên 1870an li bakurê Amerîkayê jî di dawiya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an pêk hatine. Li Ingilîstanê gava pêşîn ya fermî di sala 1953an de ji aliyê Dr. Glyn Tegai Hughes ve hatiye avêtin.<sup>35</sup>

Eger em hêj dikarin behsa heyîna wêjeya berawirdî û qebûldîtina wê bikin, di vê de para mezin a Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ye ku di nav xwe de çand û nijadên cuda dihewîne. Li gelek welatên Ewrûpayê beşên wêjeya berawirdî ber bi windabûnê ve diçin, gelek kursî û beşên tînin girtin. Lê li Amerîkayê xebatên wêjeya berawirdî bi baldariyeke mezin didomin. Sedemên ku vê beşê mayînde dikin gelek

---

<sup>34</sup> Van Tieghem, *h.b.*, r. 23.

<sup>35</sup> Aydın, *h.b.*, r. 33-38.

in. Giraniya gelên ku bi girseyî koçî parzemîna Amerîkayê kirine, Ewrûpî ne. Ji nav gelên koçkirî rêjeya îngilîzan û çanda wan pirtir bûye. Lewra jî wêjeya Amerîkayê dûmahîka wêjeya Ewrûpayê û bi taybetî jî ya îngilîzan e. Vê yekê jî derfet daye ku xwe ji çavkaniyeke zengîn têr bike. Ligel vê ji gelek welatên cîhanê kesên penaber bûne çûne li Amerîkayê û bi vê yekê civateke kozmopolît çêbûye. Di dema Şerê Cîhanê yê Duyem de ji Ewrûpayê, bi taybetî ji Fransayê zanyar çûne Amerîkayê. Gelek ji van zanyaran cihû bûne. Baldengesper berawirdkarekî fransîz bûye. Bandora wî di van kûrsiyên nû de gelekî zêde bûye. Xwendekarên Baldengesper ku piştî dane rêça wî di van beşan de pir sûdewer bûne. Lewra jî disîplîna ku li zanîngehên Amerîkayê de pêkhatiye li gorî ekola fransîzan bûye.<sup>36</sup>

Di berhevokeke ku sala 1961ê de weşiyaye, Merry Remark li ser pênaseya wêjeya berawirdî ya ekola emerîkî rawestiyaye. Li gorî wê ekola fransî bi xebatên xwe yê lêkolînên bandorî, vekolîna belge yan jî dokumanan û bi selmandinan ve mijûl e. Ev yek jî qadê sînor dike. Qet pirsan nake, lêbelê divê wêjeya berawirdî pirsan bike.<sup>37</sup> Mirov dikare meyl û pîvanên xebata vê ekolê bi kurtî wekî cîhanî, kozmopolît, navneteweyî binase. Ji ber civaka Emerîkî ya pirçandî li Amerîkayê ji bo xebatên wêjeya berawirdî hinek navend tên vekirin. Lewra piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, wêjeya berawirdî êdî peywira lihevnezkirina navneteweyî hildaye li ser milên xwe.<sup>38</sup>

Amerîka piştî Şerê Cîhanê yê Duyem ji wêjeya berawirdî re bûye bihişt. Ji du sedemên sereke yê wê rewşê; ya yekê ev e ku Amerîka xwedî civakeke kozmopolît bûye. Sedema dî jî gelek zanyarên wêjeyê, komparîstên fransîz û alman ji ber şerê xwe spartine vî welatî. Yek ji van koçberan jî René Wellek (z.1903, Viyana-m.1995) bû ku di salên 1940î de ji Çekoslovakyayê koçî Amerîkayê dike. Wellek bi kevneşopîya lîngûîstîka Pragê dikemile û dibe nûnerekî zîrek ê vê qadê. Wellek bi rexneyên xwe yê li ser ekola fransî di derdorên navneteweyî yê wêjeya berawirdî de bizaveke xurt pêk tîne. Bi van rexneyan dijberê ekola fransî ekoleke nû di vê qadê de cihê xwe digire. Wellek li şûna têgeha wêjeya netewî ya serbixwe fêhma “li dewsa afirîneriya wêjeyî ya cîhanî qet nebe yekitiya afirîneriya Rojava” anîye. Bi vê

---

<sup>36</sup> Aydın, *h.b.*, r. 41-42.

<sup>37</sup> Tekşan, *h.b.*, r. 92.

<sup>38</sup> Aydın, *h.b.*, r. 131.

yekê sînorên di navbera wêjeyên netewî de ku fransiyên didît, ji holê radikir. Li gorî wî di lêkolînan de divê wêje wekî yekpare bê dîtin. Qesta Wellek dema ku digot ekola fransî qadê bi sînor dike, gotina wan “rapports de fait” (raporên diyarde) bû ku tenê bi têkiliyên wêjeyê ve mijûl dibû. Wellek nêrîna Carré ya ji dûrketina wêjeya gelemper jî şaş didît. Sedem jî ew bû ku ne di mijara lêkolînê de ne jî ji aliyê rêbazê ve cudahiyeke di navbera wêjeya berawirdî û wêjeya gelemper de nedidît.<sup>39</sup> Li ser pirsê ku di wêjeya berawirdî de rexne heye yan tune wiha digot: Wellek dibêje zanista wêjeyê bê rexne nabe û mirov nikare rexneyê ji xebatên zanista wêjeyê derxe. Dibêje ku di lêkolîneke biçûktirîn ya wêjeyî de jî biryarek û tercîhek heye û ev yek jî bê rexne nayê kirin. Lewra mirov dikare bibêje ku di navbera dîroka wêjeyê û rexneyê de jî cudahiyeke çênabe.<sup>40</sup>

Welatên Cîhana Sêyemîn berê welatên koloniyên dewletên bihêz ên wekî Ingilîstan û Fransayê bûn piştê azadiya xwe bi dest xistin. Li van welatan wêjeya berawirdî wekî bertek li hemberî çand û welatên serdest xwe nîşan daye. Vê ekolê li hemberî têgeha “bandor”ê têgeha “bertek”ê afirand. Ev welatên ku bi navê Cîhana Sêyem tînin binavkirin her çiqas qebûl bikin ku di dema serdestiya dewletên kolonyal de di bin bandora çand û wêjeya wan de mabin jî di wê baweriyê de ne ku wan jî bandor li çand û wêjeya serdestan kiriye. Li gorî wan, bandor ne yekalî ye, berevajî dualî ye. Lêkolînên xwe bi pîranî li ser çand û wêjeya ku ji serdestan girtine û dane wan dikin. Bi xebatên wêjeya berawirdî dil dikin ku gotinên derbarê wan de dihate gotin ku ew xwedî çand û wêje nînin, pûç derxînin û dewlemendiya çand û wêjeya xwe aşkere bikin. Bi vê yekê jî dê xwe nas bikin, baweriya wan ji wan bê û azadiya xwe qawî bigirin.<sup>41</sup>

Dema ku berhemên serkeftî yên cîhanî ji aliyê naverok, şêwe, neqş û honandinê ve bînin lêkolînê tê dîtin ku ev berhem dimînin hev. Ev yek jî bi me dide zanîn wêjeya netewî tinê ji rehên xwe ên netewî nayê û rastiya ku wêjeya netewî di nav xwe de gelek bandoran dihewîne derdikeve holê. Ji bo ku bandorên di navbera wêjeyan de derkevin meydanê pêwîst e wêjeyên herêmî jî bînin lêkolîn. Rêgezên vê

---

<sup>39</sup> Aytaç, *h.b.*, r. 72-75.

<sup>40</sup> René Wellek, “Karşılaştırmalı Edebiyatın Krizi”, *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, wer. Adem Çalışkan, c.3, h. 12, Havîn 2012, r. 113-114.

<sup>41</sup> Tekşan, *h.b.*, r. 95.

ekolê ji aliyê ekolên fransiyan û almanan ve ne gengaz e ku bên pejirandin. Lêbelê heger mirov bala xwe bide bandorên ku di nav berheman de hene wê çaxê girîngiya vê ekola cîhana sêyem xwe dide der.<sup>42</sup>

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem li Ewropayê rewşa heyî ya siyasî ber bi demokrasiyê ve çû. Li gelek welatên bindest ên cîhana sêyem doza maf û azadiya xwe kirin. Wekî serek li Amerîka û welatên Rojavaya Ewrûpayê qala derfetên xweîfadekirinê, azadiya kesî, hîlbijartin, mafên jinan, hemwelatîbûnê hatin kirin û ev yek hatin bidestxistin. Ev hewl û nêrînên nû heta van rojên me wekî fikrên lîberal û cîhanî xwe domand. Bi taybetî piştê salên 1980yî vê pêvajoyê xwe lezgîntir kir. Guherîna vê rewşa têgehiştina jiyanê fêmkirina wêjeya berawirdî jî guherand. Çarçoveya wê berfirehtir kir. Li gorî têgehiştina vê serdema nû, wêjeya berawirdî ji her awa qeyd û bendan xwe xilas kiriye. Qada xebata xwe fireh kiriye û derketiye derê metnên wêjeyê. Êdî ji stranên pop û gelêrî bigirin heta bernameyên şovî yên televîzyonan xistiye bin çengên xebata xwe. Sedsala 21ê bi têgehên cîhanîbûn, çûnhatinên navdîsîplînerî, pirçandî teşe digire. Di çarçoveya vê teşegirtinê de wêjeya berawirdî wekî “qadeke nediyar û guherok” tê binavkirin. Wêjeya berawirdî bi saya rêbazên dîsîplînenê di xwe berfireh dike û ji bo qadên rexneya wêjeyê, dîroka wêjeyê, dîroka civakî hwd. daneyan dide lêkolînavan. Bi van daneyên xwe jî derfeta riya nêrîneke cuda di vekolînen mîjarên wêjeyê de diafirîne.<sup>43</sup>

Wêjeya berawirdî di sedsala 19an de wekî dîsîplînekî wêjeyê derketiye ser dikê. Lewma bandora siyasî, civakî-çandî ya serdemê li ser têgehiştin û xebatên wê çêbûne. Bi gotineke dî di serî de wêjeya berawirdî li gorî ruhê vê serdemê bi awayekî netewî û Ewrûpasentrîk teşe girtiye. Dema ku wêjeya berawirdî di berhem û xebatan de xwe da der, gengeşî û şîrove li ser çêbûn. Dihat gotin ku divê ev qad çawa bê teswîrkirin? Sînorên wê çi ne û naveroka wê çi dihevine? Li Almanyayê wekî şaxekî zanistê hate pejirandin. Gelek caran ji ber xebatên Germanîstîkê hate îhmalkirin. Li Almanyayê jî wêjeya berawirdî guman dihat kirin ku yekitiya ruhê almanan diyar bike. Lêbelê ji aliyê nêrîna Anglo-Sakson ve wêjeya berawirdî gelek caran wekî dîsîplînek an jî qadeke xebatê hate dîtin. Li vî welatî xebatên zanista wêjeyê qîmet

---

<sup>42</sup> Tekşan, *h.b.*, r. 95-96.

<sup>43</sup> Emel Kefeli, “Karşılaştırmalı Edebiyat: Tanım, Yöntem ve İncelemeler”, *Türkiye Araştırmaları Dergisi*, İstanbul, c. 4, h. 8, 2006, r. 346.

didît. Lewra wêjeya berawirdî zêde bal nekêşaye ser xwe. Wêjeya berawirdî di van deman de herî zêde li Fransayê eleqe dîtiye. Komparatîstên fransiz di xebatên xwe de bêhtir li ser “bandor” û “guhêztin” rawestîne. Li gorî vê nêrînê, divê wêjeya berawirdî ji wêjeya netewî re xizmet bikira. Bi saya xebatên berawirdî dê rewşa wêjeya netewî derketa holê. Bi vê yekê jî dê hewl bida ku wêjeya netewî bi hêztir bikira. Bi gotina Gürsel Aytaç niyeta wan bi nasîna wêjeyên biyanî armanc ew bû ku bi awayeke dî li wêjeya xwe binêrin û berawirdkirinê dikin bo ku wêjeyên biyanî ji wêjeya netewî re sûdewer bibin.<sup>44</sup>

Piştî xulasekirina derketina holê ya wêjeya berawirdî û nêrînên ku derbarê wêjeya berawirdî de hatine gotin, em dixwazin bibêjin ku ev xebata me bêhtir ji nêrînên komparatîstên fransî sûd wergirtiye. Lewra dema ku me naverok û teşeya *Şivanê Kurmanca* û sêbareya Maksîm Gorkî berawird kir, em di wê qenaetê de bûn ku Erebe Şemo dema ku *Şivanê Kurmanca* afirand di bin bandora wêjeyî ya serdema xwe û îdolbûna Maksîm Gorkî de bû. Li gorî berawirdkerên fransiz wêje û çanda gelên serdest û bihêz bandor li wêjeya gelên derdora xwe dikir. Dema ku em li dema afirandina *Şivanê Kurmanca* dinêrin, em dibînin ku wêjeya rûsî li gorî wêjeyên kêmaran gelekî xurtir bû. Yanê wêjeya rûsî ji bo gelek nivîskarên ciwan ên gelên dî mînak bû. Ev komparatîst dibêjin ku wêjeyên xurt ji aliyê cure, mijar û motîfan ve ji yên zeîf re dibin mînak. Em dibînin ku *Şivanê Kurmanca*, ku otobiyografîk e, di heyam û cografyayeke wisa da hatiye nivîsandin ku Maksîm Gorkî û sêbareyên Gorkî ên otobiyografîk gelekî di rewacê de bûn. Li gorî van komparatîstan, em dikarin bibêjin ku *Şivanê Kurmanca* îlhama xwe ji sêbareya Gorkî girtiye.

## **1.2. Ji Bo Wêjeya Berawirdî Çalakiya Wergerê**

Wêjeya berawirdî wergerê wekî qadeke xebata xwe dîtiye. Ji bo qada wêjeya berawirdî wergerên wêjeyî girîng in. Lewra wisa tê bawerkirin ku nivîskar bi xwendinên berhemên wêjeyî yên netewên dî sûd werdigire û dikemile. Lê helbet sûdwegirtin û kemilîn tenê ji berhemên wêjeyî nabin. Bi xwendinên disiplînên dî jî nivîskar dikarên kesayetiya xwe ya wêjeyî biguherin û bikemilînin. Lewma wergerên bi taybetî disiplînên civakî bo wêjeyê girîng in.

---

<sup>44</sup> Aytaç, *h.b.*, r. 10

Çawa ku Damrosch jî îşaret dike, piraniya wêjeya ku niha di zimanên cihê de tê xwendin, wêjeya wergerê ye.<sup>45</sup> Yanê bi saya wergerê berhemeke nivîskarekî dikare di gelek zimanan de ji xwe re xwendevan peyda bike. Bi saya van berhemên wergêr bandor li ser nivîskaran û wêjeyê çêdibe. Ji bo ku nivîskar an jî helbestavek ji wêjeyê de di sîd wergire lazim e yan zimanê wê wêjeyê bizane yan jî wergera berhemên wê wêjeyê hebin. Bijardeya yekê ne gengaz e ku her nûser wê pêk bîne. Lewra li ser dinê bi hezaran ziman hene û di nav van zimanan de sedan ji wan xwedî wêjeya nivîskî ne. Ji van ziman hinek ji hev pir dûr in. Wekî mînak; nivîskarekî/ê alman dibe ku bi rehetî û bi hûrgilî zimanê îngilîzî hîn bibe. Lewra ev her du ziman hem ji heman rehê ne hem jî di nav danûstandineke çandî-civakî ya domdar de ne. Lê gelo derfeta nivîskarekî/ê alman ku ji wêjeyên erebî, hîndûyî û çînî sîd bistîne çi ye? Ev ziman ji aliyê dîrok, çand û erdnîgariyê ve gelekî ji almanyayê dûr in. Lewra hînbûna van zimanan ji bo almanan gelek dijwariyê dihewîne. Di vê rewşê de bijardeya duyem derdikeve holê, yanê bi rêka wergerê nivîskar dikare xwe bigehîne wan wêjeyan. Bi saya wergerê cudahiya biyaniyan, cudahiya nêrînên wan, çand û zimanên gelên di derdive holê û fêmbûna van pêk tê.<sup>46</sup>

Gava ku mirov rewşa piraniya gel a nezanîna zimanekî biyanî bide ber çavên xwe, werger hem di rabirdûyê de hem jî di roja me de ji bo xwendina berhemên navdar hêj jî riya herî û herî rewac e.<sup>47</sup> Ligel vê bi saya wergerê nêrîna mirovan teşe digire, çand diguhere, civak ji qonaxekê derbasê yeka di dibe. Wergerek ligel xwe taybetiyên zimanê hatiye wergerandin, mijar û nêrînên nû tîne. Lewra jî girîngiya wergerê di guherîna çand û wêjeyê de her dem bi pêş bûye. Tu çand bê çandên di nikare xwe bi pêş ve bixe.<sup>48</sup> Bi kurtî “wegera wêjeyî” ji bo nasîna wêjeyên biyanî amûreke sereke ye û avakirina bingeha wêjeya berawirdî û di domandina wê de peywireke girîng pêk aniye û tîne. Di wergerê de ji zimanê resen wergerandin êdî wekî rêgez hatiye pejirandin.<sup>49</sup>

<sup>45</sup> David Damrosch, *Dünya Edebiyatı Nasıl Okunmalı?*, wer. Devrim Çetinkasap, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2010, r. 77.

<sup>46</sup> Mary-Hornby Snell/ Mira Kadric, *Grundfragen der Übersetzungswissenschaft*, Wien, 1995, r. 19, vgz. Oğuz Yücel, *Yabancı Dil Öğretiminde Çevirinin Yeri ve Önemi*, Konya, 2004, r. 4

<sup>47</sup> A.M. Rousseau-CI. Pihois, *h.b.*, r. 68

<sup>48</sup> Enginün, *h.b.*, r. 81

<sup>49</sup> Akşit Göktürk, *Çeviri: Dillerin Dili*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2006, r. 49

## BEŞA DUYEM

# JIYAN Û KESAYETIYA WÊJEYÎ YA EREBÊ ŞEMO Û YA MAKSÎM GORKÎ

## 2.1. EREBÊ ŞEMO

### 2.1.1. Jiyan, Kesayet, Berhem

Erebê Şemo (Ereb Şamîlov) di 23yê Çiriya Pêşî ya sala 1897an de li gundê Sûsîzê ku li ser navçeya Dîgorê ya bajarê Qersê ye, hatiye dinyayê.<sup>50</sup> Ev gund gundê kurdan bûye. Bajarê Qersê di wê demê de di bin desthilatdariya Împaretorîya Rûsî de bûye. Lêbelê li vê herêmê hejmara kurdan pir bûye.<sup>51</sup> Malbata Erebe Şemo li ser dîne êzdiyatiyê bûye û ji Hesenîyan in. Erebe Şemo di nav xwişk û birayên xwe de zarokê sêyem bûye. Her çiqas malbata bavê wî şêx jî bin, rewşa wan a aborî nebaş bûye. Wekî hinek malbatên dîndar xwedî mal û milk nebûne.<sup>52</sup> Lewra jî Erebe Şemo di malbateke xizan de rabûye. Babê wî ji ber tunetiyê havînan şivanî zivistanan jî di malên milkdaran de xulamî dikir. Diya wî jî di malên xelqê de bermalîti dikir. Malbateke boş bûne û zikonanî debar kirine.<sup>53</sup>

Di serdema zaroktiya Erebe Şemo de herêma Qersê pirzimanî û pirçandî bûye. Lewra di wan deman de li herêmê gelên wekî kurmanc, ermen, tirk, yewnan (hurum) û rûs (melegan) dijîyan. Çi ye ku malbata wî xwedî ax û milk nebûye, bavê wî ji bo ku karek bi dest bixe gund bi gund geriyaye. Bi vê yekê jî Erebe Şemo bi van gelan re ketiye têkiliyê û zimanên wan hîn bûye. Hêj di 14-15 saliya xwe de dikarî bi zimanên rûsî, ermenî, tirkî, hurumî (yewnanî) biaxeve û

---

<sup>50</sup> Ebubekir Gören, *Di romanên Erebe Şemo de Folklorê Kurdî*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî, Mardîn, 2013, r. 18.

<sup>51</sup> Herman Tales, *Eski Sovyetler Birliği'nde Kürtler (1927-1994)*, wer. Nadire Işık, weş. Pêrî, Diyarbakır, 2001, r. 41.

<sup>52</sup> Eskerê Boyîk, *Çanda Kurdên Sovête*, weş. Deng, Diyarbakır, 2012, r. 105.

<sup>53</sup> Erebe Şemo, *Şivanê Kurmanca*, weş. Lîs, Diyarbakır, r. 56.

qenc haja wî ji edet, rabûn û rûniştinên wan gelan hebûye.<sup>54</sup> Ezmûnên wî yên jiyanê zêde bûne. Ligel vê, pîrzimanzaniya wî piştî ji bo wî gelek sûdewar bûye. Bi zanîna zimanên cuda entegrebûna wî ligel nêrîn û koman pêkan bûye û deriyê xwendina wêjeyên wan gelan li ber wî vebûye. Eşkere ye ku di kemilîn û afirîneriya Erebe Şemo de rola pîrzimanzaniya wî girîng e.

Erebe Şemo ji ber derfetên malbatî nekariye dest bi xwendina dibistanê bike. Hêj di temenên biçûk de ji bo arîkariya aboriya malê dest bi xebatê dike. Di van temenên xwe yên biçûk de li rastî dijiwariya jiyanê tê. Di malên zengînan de xulamî dike. Dibe berxvan, golikvan û dûajoyê bavê xwe.<sup>55</sup> Erebe Şemo di van demên zaroktiya xwe de pê dihesse ku hinek mirov ji bo ku debara xwe ya rojane bi dest bixin gelek ked didin. Lê hinek mirov bi kêm xebatê yan jî bi xwarina keda mirovên dî bi hêsanî debara xwe dikin û dibin maldar. Erebe Şemo vê rewşê wiha tîne ziman: “Em diçûne çolê ber pêz, belengazî, birçîbûn didît, dewletiya jî xwe ra kêf dikirin, hasil digirtin.”<sup>56</sup> Di zaroktiyê de bala wî kêşaye ku kesên xwe wekî xwedênas û heqnas dizanin, behsa başî û qencyê dikin li hemberî kedkar û xizanan zordest in, gelek tehde li wan dikin û destheqê wan nadin. Heman awayî, beg û axayên kurmancan jî bi heman şeweyê li hemberî xizan û ketiyan tevdigerin. Mirov pê dihesse ku li ber çavên wî du zumre ava bûne: Serdest û bindest yan jî maldar û hejar. Ev dîtin û ceribandînen Erebe Şemo wisa xuyaye ku piştî di bizav û reftarên wî yên polîtîk de diyarker in.

Erebe Şemo hêj di zaroktiya xwe de çalak û jêhatî bûye. Di neh saliya temenê xwe de li gundê Meleganê bûye xulamê mala Visilyayê zengîn. Piştî jî bûye xulamê dibistana Meleganê. Ji bo destheqê xwe jî mehê 3 mûçe standiye. Li vê derê bala wî çûye ser xwendinê. Keça mamosteya polê Marûsiya alfabeya rûsî dide Erebe Şemo û arîkariya wî dike. Erebe Şemo di demên xwe yên vala de xwe bi xwe hînî xwendina rûsî dibe. Dema ku mamosteya polê vê hewl û daxwaza Erebe Şemo dibîne, wî bê pere hildide pola xwe. Erebe Şemo di demeke kurt de dibe jêhatîtirînê pola xwe. Ligel xwendekariyê, Erebe Şemo kar û barên dibistanê

---

<sup>54</sup> Eskerê Boyîk, “Hîmdarê Edebiyata Kurdî yê Ewilîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî”, *Kovara W*, j. 15 Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007, r. 18.

<sup>55</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 105.

<sup>56</sup> Şemo, *Şivanê Kurmanca*, r. 106.



dimeşîne.<sup>57</sup> Her çiqas zarokên polê Erebe Şemo biçûk xistibin û li hemberê wî sar bin jî wî dev ji xwendina xwe bernedaye. Erebe Şemo bi vî awayî li vê dibistanê pênc salên xwe tamam kiriye û kariye heta pola pêncan bixwîne. Bi vê perwerdehiya xwe Erebe Şemo hîne xwendin û nivîsandina rûsî bûye. Di sala 1913an de Erebe Şemo diçe gundê Axdaşê. Li vî gundê kurmancan Erebe Şemo xulamî kiriye. Di sala 1914an de Şerê Cîhanê yê Yekem dest pê dike. Fermandarekî Qazak gava ku dibihîze di gund de ciwanek heye ku zimanên rûsî, ermenî, tirkî û kurdî dizane, gazî wî dike û jê dixwaze ku ji bo Artêşa Rûsî wergêriyê bike. Ji bo karê wî jî gotiye em ê mehane 25 manat bidin te.<sup>58</sup>

Di navbera salên 1914-1916an de Erebe Şemo di Artêşa Rûsan de li hemberê tirkan şer dike. Di vê demê de gelek rûsên xwenda û şoreşger nas dike. Bi wan re dibe heval. Bi pêşniyaz û derfetên wan pirtûkan dixwîne. Di navbera van du salan de asoya nêrînen wî fireh dibe.<sup>59</sup> Heta vî temenê wî, derfetên wî çêbibûn ku li rastî nêrînen cuda bê. Derdoreke wî ya xwenda û bajarî pir çêbibû. Lêbelê di van du salan de bi saya vê derdora nû, bergeha fikrên wî fireh bû.

Gava ku Erebe Şemo ji bo Artêşa Rûsan wergêriyê dike, çend caran gundiyan ku rê nîşanê Erebe Şemo kirine wî dixapînin, rêyên nerast didin ber wî. Piştî dubarekirina vê rewşê fermandarê artêşê ji wî dikeve gumanê. Wî bi sixûriyê tawanbar dike û li wî didin. Pereyê wî yê ku ji bo demeke dirêj heq kiriye jî nadin wî. Piştî ku wî ji kar dûr dixin ew berê xwe dide gundê Qizneferê, gundê meta xwe. Dema ku li vî gundî ye fermandarekî dî saluxa wî dide û ji nû ve wî ji bo wergêriyê hildide kar. Dema ku li gund e, dilê wî û yê keçmeta wî, Karê, li hev germ dibin. Babê Karê Şêx Sefo ji bo qelenê Karê ji Erebe Şemo 150 manat, hespek û tivingek dixwaze. Erebe Şemo qelenê xwe dide, lêbelê Şêx Sefo xwe bi xirabiyê datîne. Ji ber vê sedemê di navbera wan de gengeşiyek çêdibe û Şêx Sefo hewl dide ku li Erebe Şemo bixe. Erebe Şemo her çiqas Şêx Sefo îqaz dike jî fêde nake di navbera wan de qirên çêdibe û di maweya vê gengeşiyê de ji

---

<sup>57</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 106.

<sup>58</sup> Zeynel Abidîn Zinar, "Nivîskarê Kurd, Suxrevan û Kedkarê Wêjeya Kurdî", *Kovara W*, j. 15, Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007, r. 33.

<sup>59</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 107.

tifinga Şemo berek derdikeve û li Şêx Sefo dikeve. Şêx Sefo li wir dimire. Leşker tèn Erebe Şemo digirin lêbelê gundî meselê ji wan re dibêjin. Bi vê yekê, Erebe Şemo tê berdan lê evîna wî ya ji bo Karê jî têk diçe. Erebe Şemo ji gundê meta xwe derdikeve û bi leşkeran re diçe Çiyayê Sîpanê.<sup>60</sup>

Erebe Şemo di sala 1916an de ji karê xwe yê wergêriyê dûr dikeve. Ji bo çêkirina riya hesin diçe Sarîqamişê. Di nav hevalên wî yên xebatê de Bolşevîk jî hebûn. Erebe Şemo bi van kesan re hevaltî datîne û bi nêrînên wan re hemhal dibe. Dikeve nav xebatên wan ên veşartî û peywîrên didin wî pêk tîne. Her roj dikeve nav civata paleyan û wan derbarê rewşa neheq de hişyar dike. Axaftinên li hemberî burjûvaziyê dike. Mafên kedkar û xebatkaran diparêze. Ji ber van xabatên wî Erebe Şemo tê girtin û zordarî lê tê kirin. Piştî demekê gava ku fermandarê girtîgehê pê dihese ku Erebe Şemo kurd e, dibêje kurd ji karên siyasî û şoreşî fêhmakin. Rê dide ku Erebe Şemo berdîn.<sup>61</sup> Di sala 1917an de Şoreşa Kewçêrê çêdibe. Erebe Şemo bi tevî leşkerên rûsan ji Qersê vedikêşe diçe Rûsyayê. Li derdorê Stavropolê ligel Gvardiya Sor beşdarî şerê bajariyê dibe. Du caran birîndar dikeve. Di sala 1918an de li navçeya Dîgorê di nav kurdên êzdî de ji bo Bolşevîkan xebatan dike.<sup>62</sup> Di heman salê de dibe endamê Partiya Komînist a Rûsyayê. Ew çend salan li Bakû, Moskova û Tîblîsê dixebite.<sup>63</sup> Erebe Şemo pê dihese ku bê xwendineke qewî wê ew nekare pak ji bo partiyê bixebite û bîr û baweriyên xwe têkûz bike. Lewra di sala 1920an de diçe Moskovayê di zanîngeha Lazariyan de nêzikî çar salan dixwîne. Di sala 1924an de vedigere Ermenistanê û di Komîteya Navendî ya Partiya Komînist ya Ermenistanê de dest bi xebatê dike. Li vî welatê jî rêçikên Bolşevîkan bi ser ketine. Di wan deman de rewşa gelê kurd hem ji hêla aborî û hem jî ji hêla çandî ve pir paşmayî ye. Piraniya gel koçer yan jî nîvkoçer e, hejmara xwendayan hema bêje tune ye. Li gorî amarên heyî beriya sala 1917an ji %90ê kurdan nexwenda ne.<sup>64</sup> Hûkumeta Ermenistanê li gorî rêçikên sosyalîzmê dixwaze vê rewşa kurdan baş bike. Dest

---

<sup>60</sup> Zinar, *h.g.*, r. 33.

<sup>61</sup> Şemo, *Şivanê Kurmanca*, r. 145, 150.

<sup>62</sup> Eşo, “Çend Rûpel Ji Jiyana Erebe Şamîlov”, *Kovara Çira*, j. 6., Havîn 1966, Spanga, 1996, r. 16.

<sup>63</sup> Xelîlê Çaçan, “Miletêk Di Heyra Wî De Bû”, *Kovara W*, j. 15., Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakir, 2007, r. 27.

<sup>64</sup> Ferhad Pirbal, *Shadow Of The Lion The History of a Cultural Millenium*, wer. The Kurdish Globe, weş. Shahab Printing House, Erbil, 2012, r. 118.

bi xebatan dikin û Erebe Şemo di van xebatan de wekî pêşeng cihê xwe digire. Li zozanê Elegezê 5ê Hezîrana 1924an civîna kurdên nepartîzan tê damezrandin. Di civînê de Erebe Şemo wekî nûnerê Komîteya Navendî ya Partiya Komîst ya Ermenistanê axaftinek dike û navê mijara axaftina wî jî “V.Î. Lenîn û Netewên Biçûk” e.<sup>65</sup>

Dewleta nû, ne bi tenê hewl dida ku gel ji xizaniyê xilas bike. Ligel vê hewl dida gel ji aliyê perwerde û hunerê ve jî bi pêş bixe. Ji bo vê yekê jî pêwîst bû ku pêşî di nav gel de xwendin û nivîsandinê pêk bîne.<sup>66</sup> Di nav sîstema nû de derfet ji bo hemî gelan çêdibin. Armanca ew e ku her gel bikaribe di zimanê xwe de perwerdeyê bibîne. Bo vê yekê jî dewlet sazî û dezgehan ava dike û materyalên fêrkariyê dide amadekirin. Armanca nîhayî ew e ku çîna kedkar bibe xwedî çanda xwe. Yanê divê proletkult bê avakirin.<sup>67</sup> Ji bo avakirina proletkultê divê hemî çîn û gelên paşmayî bîn perwerdekirin. Di sala 1930an de rojnameya *Riya Teze* li Yêrîvanê dest bi weşana xwe dike. Ji bo sazûna rojnameyê Erebe Şemo karekî berbiçav dike. Erebe Şemo diçe Lenîngradê bo xwendinê. Ew ji bo enstîtuya dîroka kulturî tê pejirandin. Di heman demê de li enstîtuya felsefeyê waneyên zimanê kurdî dide.<sup>68</sup>

Di sala 1930an de nivîsên wî yê bi navê *Emirê Lenîn, Terîqa Rêvolûsya Oktobirê, Kolxoz û Kara Wî ji Gundiya re* tîn weşandin. Di heman salê de berhema wî ya bi navê *Koçekê Derewîn* der diçe. Ev berhema şano ye û teqlîda berhema Aleksandr Araratyan e. Aleksandr Araratyan di afirandina vê berhema xwe de ji *Tartuffe* a Moliere sûd wergirtiye. Ku wisa be berhema Erebe Şemo berhemeke bandora bandorê ye.<sup>69</sup> Di heman salê de belavokên wî yê *Jiyana Lenîn, Der Heqê Pirsê Feodalîzmê di Nav Kurda de* derdiçin.<sup>70</sup> Di van salan de nivîsên Erebe Şemo di rojnameya *Riya Teze* û rojname û kovarên ermenî de weşiyane. Parçenin *Şivanê Kurmanca* di heman salê de di kovara *Grakan Dîrkêrûm* (di tabyayên edebiyatê de) bi zimanê ermenî tê weşandin. Heman

<sup>65</sup> Boyîk, *h.g.*, r. 19.

<sup>66</sup> V.Î. Lenîn, “Yeni Bir Dünyanın Sanatı Üzerine”, dnd: *Sanatta Sosyalist Gerçekçilik*, amd. İsmet Gülseçkin, wer. Feyyaz Şahin, weş. Parşömen, İstanbul, 2011, r. 196.

<sup>67</sup> Akif Kurtuluş, *Politika ve Sanat Ekim Devrimi (1917-1932)*, weş. Avesta, İstanbul, 1996, r. 19.

<sup>68</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 109.

<sup>69</sup> Erebe Şemo, *Koçekê Derewîn*, weş. Belkî, Diyarbakır, 2014, r. 6.

<sup>70</sup> Çaçan, *h.g.*, r. 28.

berhem di sala 1931ê de wekî beşeke serbixwe bi rûsî tê weşandin. Ev behrema bi navê *Kûrdskîy Pastûx* 64 rûpelî diweşe. *Şivanê Kurmanca* ya bi kurmancî ku di sala 1935an de hatiye weşandin, ligel navnîşana xwe 155 rûpel e.<sup>71</sup> Ev berhem ji wergerên ên beriya xwe nîne, ji aliyê Erebe Şemo ve ji nû ve hatiye nivîsîn. Ev berhem romaneke otobiyografîk e. Piranî li ser zaroktiya wî disekine ku di nav zor û zehmetiyan de boriye. Ligel vê bûyerên ciwaniya wî, nasîna Bolşevîkan, ketina li refên wan û hişyarkirina gundiyan kurmanc jî mijarên romanê ne. Di gereke xwe ya welêt de Maksîm Gorkî tê Yêrîvanê. Erebe Şemo diçe dîtina wî û destnivîsara vê romanê pêşkêşî wî dike. Gorkî li pirtûkê dinêre û dibêje: “Gelê kurd bi zimanê nivîskarê xwe, Erebe Şamîlov qise dike.”<sup>72</sup> Di sala 1936an de nivîsên wî yên *Li ser Pêwendiyên Fêodalî di Nav Kurdan de, Kurmancêd Elegezê derdiçin*.

Josef Stalîn di sala 1937an de dibe serokê Sovyetê. Bi hatina Stalîn rêveberiya dewletê dirûveke hişk digire. Stalîn dest bi girtin, mişextkirin û kuştina rêberên Bolşevîkan dike. Di nav van girtin û mişextkirinan de Erebe Şemo jî cihê xwe digire. Lewra Erebe Şemo hêj di salên 1916an de bi Bolşevîkan re dikeve têkiliyê, di Artêşa Sor de cih digire û kesekî wekî Bolşevîk di nav civakê de roleke girîng dide piştî xwe û di wê riyê de kar dike. Lewma rêveberiya nû Erebe Şemo digire û sirgûnî li Sîbîryayê dike. Ev girtin û sirgûn 19 sal didome. Piştî mirina Stalîn rêveberiya dewletê nerm dibe û bêheqiyên berê hinekî betal dikin. Di sala 1956an de Erebe Şemo ji sirgûnê vedigere. Di wan salan de ji ber jiyana dijwar û zordestiya heyî Erebe Şemo nekariye berdariya xwe bidomîne. Piştî vegera xwe Erebe Şemo dest bi berhemdayîna xwe dike.

Piştî 23 salan di sala 1958an de romana wî ya duyem *Berbang* li Yêrîvanê çap dibe. Wekî ku ji naveroka vê romanê jî diyar e ku ev roman romaneke serbixwe nîne. Romana *Berbangê* ji nû ve nivîsandina romana *Şivanê Kurmanca* ye. Dema ku Erebe Şemo romana xwe ji nû ve nivîsandiye di romanê de hinek cudahî kirine. Tê xuyan ku navê piraniya beşan hatine guhertin. Mînak; di *Şivanê Kurmanca* de navê beşa duyem “Merkeba me. Rêncberiya nava melegana” ye.

<sup>71</sup> Erebe Şemo, *Şivanê Kurmanca*, “Destpêka Romana Kurdî: *Şivanê Kurmanca*”, Mustafa Aydoğan, Weşanên Lîs, Diyarbekir, r. 10.

<sup>72</sup> Boyîk, *h.g.*, r. 21.

Navê vê beşê di *Berbangê* de bûye “Merkeva me, Rêncbertiya nava ûrîsa”. Dîsa di *Berbangê* de bêje jî hatine guhertin. Di *Şivanê Kurmanca* de peyva “kurmanc” di *Berbangê* de bûye “kurd”. Di *Berbangê* de li hinek beşan îlave hatine kirin. Di binbeşa “Mijûliyêd me” de stran hatiye zêdekirin. Ev stran di *Şivanê Kurmanca* de tune. Di *Berbangê* de di beşa “Hicûma gura” de Erebe Şemo hêkan didize û dixwe bin kumê xwe. Lê ji aliyê xwediyê xanî ve tê girtin. Gava ku dixwaze hêkan ji bin kumê xwe derxîne, hêk di serê wî de dişikên. Ev bûyer di *Şivanê Kurmanca* de cih nagire. Hin mînak; beşa “Nama ji Amerîkayê” ku ji rûpela 35an heta 45an cih digire, di *Şivanê Kurmanca* de tune. Lê dîsa di naveroka vê beşê de bûyerên ku di *Şivanê Kurmanca* de cih girtine jî hene. Ligel van, hinek beşên ku di *Şivanê Kurmanca* de cih girtine, di *Berbangê* de naxuyên. Mînak; beşa “Hazirkirina hasil”, “Li ûrisêtê” û “Înglaba Oktyabrê” di *Berbangê* de cih negirtine. Mirov dikare bibêje ku her çiqas di naveroka *Berbangê* de hinek cihêbûn hebin jî ev roman wekî romaneke serbixwe divê neyê qebûl kirin. Divê ev roman wekî ji nû ve nivîsandina *Şivanê Kurmanca* bê dîtin.<sup>73</sup>

Di salek şûn de romana wî ya sêyem *Jiyana Bextewar* derdikeve. Di vê romanê romanê de Erebe Şemo mijareke dîrokî jî xwe re kiriye mijar. Roman li ser eşîra Sîpka hatiye honandin. Di romanê de di maweya sed salan de bi vegotina serboriyên Eşîra Sîpka nivîskar xwestiye balê bikişîne guherînin li ser kurdên herêma ku di romanê de cih digire. Di sala 1965an de dîsa li Yêrîvanê romana wî ya çarem *Dimdim* diweşe. Ev romana wî jî dîrokî ye. Mijara xwe ji bûyereke sedsala 17an ya Rojhilatê Kurdistanê girtiye. Di bûyerê de şerê kurd û Safeviyan heye. Kurd di keleha Dimdimê de berxwedaneke xurt didin, lê têk diçin. Ev bûyer di nav gelê kurd de belav dibe û heta Erebe Şemo ji aliyê dengbêjan ve wekî destan bi navên cuda tê vegotin. Erebe Şemo ji vê destanê sûd digire û romana xwe li ser vê bûyerê bi dîskurseke dema xwe ji nû ve dihene.<sup>74</sup> Di sala 1967an de li Moskovê berhevoka wî ya *Hikayetên Gelê Kurd* diweşe. Romana wî ya dawî *Hopo* di sala 1969an de derdiçe. Ev roman berdeewama

<sup>73</sup> Me ji bo van nirxandinên xwe vê çapa romanê bi kar anî: Erebe Şemo, *Berbang*, ji tîpên krilî Rûbar Dilşêr, Weşanxana Kurdistan, Stockholm, 1988.

<sup>74</sup> Fahriye Adsay, “Romana Kurdî (Kurmançî) ya Dîrokî: Bîra Civakî û Nasname”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî, Mardîn, 2013, r. 62.

romana *Jiyana Bextewar* e.<sup>75</sup> Di romanê de behsa jiyana gund û kolxozeke gund tê kirin. Bihevrexebitîna gundiyan, çêkirina zeviyan û çandinê, ciwanên xwenda yên kurd, jiyana nû ya li dewsa ya berê, mijarên vê romanê ne.

Bavê romana kurdî, xwediyê xelatên “Beyreqa Sor” û “Dostiya Gelan”, endamê Akademiya Kurdî ya Bexdayê Erebe Şemo di havîna sala 1978an de li Yêrîvanê diçe li ser dilovaniya xwedê. Wî li Goristana Yêrîvanê ya Sovêtêşanê vedişêrin ku mirovên nav û deng ên komarê lê tèn veşartin.

### 2.1.2. Nêrîna Wêjeyî ya Erebe Şemo

Erebê Şemo ku wekî bavê romana kurdî tê nasîn di warê roman, çîrok, şano, rêziman û gotaran de berhem dane.<sup>76</sup> Erebe Şemo di nav van cureyan de bi nivîsandina pênc romanên xwe ve di qada romanê de derketiye pêş. Ligel vê, di dîroka wêjeya kurdî de romana pêşîn nivîsandiye.<sup>77</sup> Nivîsandina romana kurdî wekî li Ewropayê ji ber hêzên aborî û çandî neafiriye. Bêhtir piştî Şoreşa Kewçirê li Sovyetê bi şert û mercên siyasî ve girêdayî derçûye. Yanê romana yekem a kurdî ne li welatê xwe û ne encama pêvajoya dîroka wêjeya xwe derçûye. Erebe Şemo berhemên xwe li gorî cereyan û rewten wêjeyî yên hemdem ên li Sovyetê nivîsandiye. Erebe Şemo di damezrandina dewlet û sîstema nû de roleke aktîf girtiye û ji bo rê û rêçikên saziya nû bi cih bîn pêşengî kiriye. Sîstema nû helbet qada wêjeyê ji bîr nekiriye, bi çavekî nû pênase kiriye û peywireke nû ji bo vê qadê diyar kiriye. Erebe Şemo wekî nûnerekî aktîf ê vê sîstemê xwestiye di afirandinên xwe yên wêjeyî de rêçên jiyana nû derxe pêş.

Di salên 1930yan de li Sovyetê realîzma sosyalîst wekî nêrîneke sereke di qada wêjeyê de derdikeve pêş. Li gorî realîzma sosyalîst divê wêje ne tenê qala mirov bike û wî/wê pênase bike, ligel vê divê wêje arîkariya kemîlina mirov bike û di avakirina civateke nû de rênişaner be.<sup>78</sup> Erebe Şemo di hevpeyvîneke xwe de tîne ziman ku rêbaza wî ya wêjeyî realîzma sosyalîst e û lê zêde dike: “Ji ber ku

---

<sup>75</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 121.

<sup>76</sup> Naci Kutlay, “Romana Kurdî”, *War*, j. 5-6, (Havîn-Payîz 1998), r. 128.

<sup>77</sup> Haşim Ahmedzade, *Romana Kurdî û Nasname*, wer. Fahriye Adsay, weş. Avesta, İstanbul, 2011, r. 12.

<sup>78</sup> André Bonnard, *Yeni Bir Hümanizmaya Doğru Sovyet Edebiyatı Üzerine*, wer. Serdar Canpolat-Mehmet Erdal, weş. Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2001, r. 39.

ez bixwe riyalîst û sosyalîst im. Û di nêrîna min de, ev rêbaz dikare hemû aliyên jiyane ronî bike.”<sup>79</sup> Ji ber vê, dema ku mirov bala xwe dide naveroka berhemên wî û taybetiyên karakterên wî rêçikên realîzma sosyalîst dixuyên. Lewra girîngiya wî ji afirîneriyê bêhtir li ser “erk” û “hewceyî”yên sîstema nû ne ku ji wî tîn xwestin. Li ber çavên wî roman alavek e ku rê li ber çand û perwerdehiyê vedike.<sup>80</sup> Bi gotineke dî, berhemên wî nêzî vê nêrîne ne ku digotin divê wêje “hizirkirina nivîskar”, “partînost (rihê partiyê)”, “narodnost (nêzî gel) û “pêşveçûna hunerî” derxe pêş.<sup>81</sup> Yanê romanên wî armanc dikin perwerdekirina civakê pêk bînin û propagandaya polîtîk û îdeolojîk a sosyalîzmê bikin. Dema ku mirov bala xwe dide vegêrên romanên wî, mirov dibîne ku vegêr wekî mamosteyan li hember xwendevanên xwe tev digerin.<sup>82</sup>

Di pêkhatina kesayetiya wêjeyî ya Erebe Şemo de pirzimaniya wî û herêma pîrgel, bi bandor bûye. Di zarokî û ciwaniya xwe de li gelek herêman geriyaye. Bi saya van gerên xwe, jiyana gelên herêmê ji nêz ve nas kiriye. Di afirandinên xwe yê wêjeyî de cih daye gelên herêmê. Wekî mînak; di berhemên wî de lehengên wekî ermen, gurgî, tirk, ecem, ûris cih digirin. Behsa dostaniya van gelan tê kirin. Helbet ev bi îdeolojiya fermî ya ku dixwest gelên cuda di nav ahangekê de bijîn ve girêdayî ye.<sup>83</sup> Lêbelê em dizanin ku Erebe Şemo bi xwe jî ev nêrîn pejirandiye û di romana xwe ya *Jiyana Bextewar* de parêzvaniya vê nêrîne kiriye. Lewra, dema ku eşîra Sîpka li Rûmê dijî ne rehet e, li ser wan zordarî heye. Lê gava xwe digihînin Êrisetê û piştê Şoreşa Cotmehê çêdibe, ji wan rojên berê yê tarî xilas dibin. Jiyanêke “bextewar” li ber wan vedibe. Hatina herêmekê pirziman û pîrgel ji bo wan pîrsgirêk nîne. Berevajî dûgela nû ji wan re azadî aniye. Maksîm Gorkî jî piştewaniya vê ahengê dike û dibêje ya girîng ew e ku nivîskar van gelan di armanceke hevpar de li hev bîne.<sup>84</sup> Qada romanên Erebe Şemo bi giranî herêma Serhedê ye. Bûyer bi piranî li vê herêmê diqewimin. Lê

<sup>79</sup> Bavê Nazê, “Hevpeyvîna Bi Erebe Şemo Re Ya Berî 25 Salan”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007, r. 32.

<sup>80</sup> Remezan Alan, *Bendname Li Ser Ruhê Edebiyatekê*, weş. Avesta, İstanbul, 2009, r. 196.

<sup>81</sup> Ahmedzade, *Romana Kurdî û Nasname*, r. 18.

<sup>82</sup> Îbrahîm Seydo Aydoğan, *Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*, weş. Rûpel, Stenbol, 2014, r. 111.

<sup>83</sup> Sedat Adıgüzel, *İlyas Efendiyeve Hayatı, Eserleri, Üslup Özellikleri, Sosyalist Gerçekçilik Açısından Kahramanları*, ç. 2, weş. Fenomen Yayıncılık, Erzurum, 2010, r. 82.

<sup>84</sup> Maksim Gorkî, “Maksim Gorki (28 Mart 1868 – 18 Haziran 1936)”, dnd: *Sanatta Sosyalist Gerçekçilik*, r. 87.

piştire qada bûyerên romanên wî fireh dibin. Bûyerên romanên li Moskow, Ukranya û Belarûsê diqewimin. Yanê sînorên cihê romanên ji Sîpanê Xelatê heta Sîbîryayê diçin.<sup>85</sup>

Zanîna wî ya li ser wêjeyên rûsî û ermenî baş bûye. Ew bi gelek rewşenbîr û nivîskarên mezin ên Sovyetê re hevnas bûye. Bi taybetî bandora wêjeya rûsî li ser wî pir e.<sup>86</sup> Ev bi me dide zanîn ku Erebe Şemo ji berhemên van wêjeyan haydar e û wan dişopîne. Wekî mînak ji berhema Aleksandr Araratyan sîd werdigire û teqlîda wê wekî *Koçekê Derewîn* derdixe. Dîsa gava ku Maksîm Gorkî tê Yêrîvanê diçe serdana wî û berhema xwe pêşkêşî wî dike. Em ji vê têkiliyê dikarin bibêjin ku Erebe Şemo Maksîm Gorkî şopandiye û xwe nêzê wî dîtîye. Di wan salan de li Sovyetê gelek ciwanên ku nû dest bi nivîsandinê kirine berhemên xwe nîşanî Gorkî dane da ku Gorkî derheqê berhemên wan de nirxandinan bike. Van ciwanan dane ser rêça wêjeyî ya Maksîm Gorkî. Yek ji van jî Erebe Şemo bûye. Nîşaneyê wê rewşê jî ew e ku Erebe Şemo yekem berhema xwe ya wêjeyî *Şivanê Kurmanca* di şêweyê *Zaroktiya Min* a Gorkî de nivîsandiye. Ligel van, di romana *Jiyana Bextewar* de em dibînin ku Sehîd, lehengekî wê romanê ye, behsa Maksîm Gorkî dike û dibêje min romana wî ya *Ana (Dê) û çîrokên wî xwendine*.<sup>87</sup> Dîsa di romana *Hopo* de dema ku Hesên dikeve oda Zînê di pirtûkdanka wê de berhemên Hovhannês Tûmanyân, Êgîşê Çarêns, Pûşkîn, Tolstoy û Tûrgeniyev dibîne.<sup>88</sup> Ev yek jî gumanek dide me ku Erebe Şemo berhemên nivîskarên navên wan li jorê borî, xwendine. Ligel van Erebe Şemo pak ji çîrok û destanên kurdî haydar bûye. Di heman romana navborî de qala çîrokên *Mem û Zînê* û *Kerr û Kulik* tê kirin.<sup>89</sup> Di afirandinên wî de bi taybetî li ser zimanê afirandinên wî bandora van berhemên gelêrî heye. Ligel van wisa xuyaye ku Erebe Şemo ji berhemên Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî jî haydar

---

<sup>85</sup> Serwet Denîz, “Her Ew Hesret û Ew Xwezî”, *Kovara W*, j. 15, Tirmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007, r. 45.

<sup>86</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 112-113.

<sup>87</sup> Erebe Şemo, *Jiyana Bextewar*, weş. Lîs, Diyarbakır, 2015, r. 255.

<sup>88</sup> Erebe Şemo, *Hopo*, weş. Lîs, Diyarbakır, 2007, r. 80.

<sup>89</sup> Şemo, *Hopo*, r. 163.



bûye. Lewra di romana *Dimdim* de navê van kesan bi kar tîne û behsa beytên wan dike.<sup>90</sup>

Gava ku mirov bala xwe dide dîroka wêjeya kurdî xuya dibe ku di gelek qonaxan de nivîskarên kurdî di heman demê de aktîvistên siyasî ne. Ev yek ji qonaxa Stenbol dest pê dike heta roja me tê. Kar û barên siyasî û wêjeyî bi hev re hatine kirin. Nivîskarên kurdî hewl dane ku bi riya wêjeyê nêrînên xwe di nav gel de belav bikin. Yan jî hewl dane ku wêje di nav gel de bibe qadeke fêrkariyê. Erebe Şemo beriya ku dest bi nivîsandina berhemên xwe yê wêjeyî bike, ku temenê wî 33 ye,<sup>91</sup> di nav xebatên siyasî de cih girtiye. Xebatên wî yê pêşîn jî, wekî amadekirina alfabeya kurdî, bi biryarên siyasî ve têkildar bûn. Li welatê Sovyetê, nivîskar û siyasetmedarên wê demê ji bo pêkanîna jiyana sosyalîst a nû berpirsiyar dihatin dîtin.<sup>92</sup> Wekî aktîvîsteke partiya komînîst Erebe Şemo jî hewl daye ku di romanên xwe de îdealên jiyana nû derxîne pêş.

Erebê Şemo xwe wekî realîstekî sosyalîst dizane. Ev pênasekirina wî helbet li ser naverok û berhemên wî bandor kiriye. Jixwe di dewra nivîsandina wî de nêrînek wisa hebû ku têkilî di navbera naveroka berheman û îdeolojiya nivîskar de dihat danîn. Yanê hîlbijartina naverokê rasterast nîşaneyê îdeolojiya nivîskar dide der. Eger nivîskar derbarê rabirdûyê de binivîsanda, di hate gotin ku ew propagandaya rewşa kevin dike. Lewra wî/ê kesî/ê wekî dijminê Şoreşê, “takekesparêz”, “neteweperest”, “dijminê gel” û “burjûva” didîtin.<sup>93</sup> Lewra Erebe Şemo behsa faydeyên kolxozan, têkoşîna li hember dijminê kedkaran, dilpakiya xebatê dikir.<sup>94</sup> Bûyerên di romanên wî de diqewimin ji jiyana rasteqîn hatine girtin. Bûyer yan di serê wî bi xwe de borîne, wekî naveroka *Şivanê Kurmanca*, yan jî bûyerên ji derdora xwe û ji bihîstinên xwe girtiye, wekî naveroka *Jiyana Bextewar* û *Dimdimê*. Di berhemên wî de surrealîzm û xeyal tunene. Jiyanêke zor û zehmet a ku li derdora wî diqewime heye. Lehengên wî yê pozîtîf hene ku her

---

<sup>90</sup> Erebe Şemo, *Dimdim*, weş. Lîs, Stenbol, 2007, r. 43.

<sup>91</sup> Nazê, *h.g.*, r. 32.

<sup>92</sup> Maksim Gorki, “Maksim Gorki (28 Mart 1868 – 18 Haziran 1936)”, dnd: *Sanatta Sosyalist Gerçekçilik*, r. 93.

V.İ. Lenin, “Yeni Bir Dünyanın Sanatı Üzerine”, dnd: *Sanatta Sosyalist Gerçekçilik*, r. 199.

<sup>93</sup> Kevork B. Bardakçıyan, *Modern Ermeni Edebiyatı*, weş. Aras Yayıncılık, wer. Fatma Ünal-Maral Aktokmakyan, İstanbul, 2013, r. 243.

<sup>94</sup> Alan, *h.b.*, r. 196.

dem serkeftî û rast in. Evîndarê biratiya gelan û pêşveçûnê ne. Xebatkar, paqij û zana ne. Di baweriya lehengên wî de riya xilasiya gelên bindest tenê bi şopandina sîstema nû ve, bi sosyalîzmê ve, girêdayî ye.<sup>95</sup> Di romanên wî yên *Hopo* û *Jiyana Bextewar* de ev taybetî yek car xwe dide der. Parastina hizrên nû bi taybetî di *Jiyana Bextewar* de digihîje asta propagandayê.<sup>96</sup> Di romana wî ya dîrokî *Dimdim* de jî şopên jiyana nû xwe didin der. Dema ku Xano ji kelhê bi leşkerên xwe ve derdikeve li pêşiya wan ala sor heye.<sup>97</sup> Em dizanin ku ala sor ala Bolşevîkan e. Serlehengê vê romanê Xano wisa xuyaye ku mîrê kelhê ye. Lê nivîskar wî di vê nîşanê de nabîne. Dibeje: “Xanoyê Çengzêrîn ne beg e, ne axa ye, ne jî mîr e, kurd e, lê ji began, ji axa û mîran jî zêdetir e çêtir e.”<sup>98</sup> Em dizanin ku di sedsala 17an de di nav civaka kurd de ne pêkan e ku mirov Xano di nav pênaseya “kurd” de bibîne. Baş xuyaye ku Erebe Şemo li gorî nêrîna serdema xwe Xano pênase dike. Tê zanîn ku nivîskarên Sovyetê dema ku dixwestin hestên xwe yên netewî der bikin serî li dîroka wî gelî didan.<sup>99</sup> Mirov dikare bibêje ku dibe ku Erebe Şemo ji bo hestên xwe yên netewî bîne ziman ev mijar ji bo romana xwe hilbijartibe.

Taybetiyeke ekola realîzmê jî ew e ku ew hewl dide di kîjan heyamê de hatibe nivîsandin, wêneya wê demê bikêşe.<sup>100</sup> Erebe Şemo di berhemên xwe de ev taybetî bi awayekî zelal pêk aniye. Lewra mirov dikare di berhemên Erebe Şemo de jiyana kurdan ya sedsalên 19 û 20an bibîne. Şer û koçên çêbûne, zordestiya dewlet, beg û axayan li ser wan, bac û xercên zêde yek bi yek hatine vegotin. Beg û serokeşîran çawa wan di kar û barên xwe de dane xebatê û gelek caran heqê wan nedane. Dema ku gel piçek dengê xwe derxe lêxistineke giran ji destên wan dixwe. Wekî mînak; di romana *Jiyana Bextewar* de Mistefa Beg ewqas li kurê Seyranê Miheme dixwe, ew nexweş dikeve û dimire.<sup>101</sup> Ligel van jiyana kurdan a koçeriyê û li gundan, edet û nerîtên kurdan ên wan çaxan kitekit hatine qîsekirin. Di romana wî ya *Şivanê Kurmanca* de beşên wekî “Merkeba me.

<sup>95</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 120.

<sup>96</sup> Şemo, *Jiyana Bextewar*, r. 154, 195.

Şemo, *Hopo*, r. 64, 124, 259.

<sup>97</sup> Erebe Şemo, *Dimdim*, r. 207.

<sup>98</sup> Şemo, *Dimdim*, r. 125.

<sup>99</sup> Adıgüzel, *h.b.*, r. 102.

<sup>100</sup> Emel Kefeli, *Batı Edebiyatında Akımlar*, weş. Dergah, İstanbul, 2012, r. 94.

<sup>101</sup> Şemo, *Jiyana Bextewar*, r. 93.

Rêncberiya nava melegana”, “Gur nav pez ket. Hicûma gura” û “Li zozana” cih digirin. Di van beşan de jiyana rojane ya kurdan bi çavekî rasteqîn derdikeve ber çavên xwendevan. Çanda gelê kurd bi awayekî xurt mohra xwe li hişmendiya berhemên wî xistiye.<sup>102</sup> Naveroka romanên Erebe Şemo her çiqas pirrengî be jî navenda romanên destnîşankirin û parastina jiyana nû ye. Di vê babetê de her gav rexne li hişmendî û rewşa berê tê kirin. Dîn û nûnerên dîn jî ji van rexneyan behra xwe distînin. Jixwe berhema wî ya *Koçekê Derewîn* yekcar li ser sextekariya koçekî hatiye sekinîn. Di *Hopo* de şêxê gund ji aliyê gundiyan ve çî ye ku kerê xwe birçî hiştiye tê rexnekirin. Kalekî di civatê de ku rewşa kerê dîtiye dibêje: “Hela dibêjin, em terêq in û xwedênas in.”<sup>103</sup> Rexnekirina hizrên dînî di çend cihên *Jiyana Bextewar* de jî derdikevin pêşiya me. Wekî mînak; Emerîk, yek ji ser lehengê vê romanê ye, ji kurê xwe Sehîd re dibêje: “Terêqên me jî dibêjin: ‘Xwendin guneh e’.” Nizanim çima ji hemû miletan re ne guneh e, her ji me re guneh e. Bi aqilê min ê ku xwendin ji me re kiriye qedexe, ew dijminê me ye.”<sup>104</sup>

Dema ku mirov bala xwe dide honandinên berhemên Erebe Şemo mirov dibîne ku girêdanên bûyeran li hev sist in. Ka ji mirov e roman ne ji bûyerên hevgerî berevajî ji bûyerên serbixwe pêk tên. Di *Şivanê Kurmanca* de her bûyer di bin banê navekî de hatiye dayîn û di vê beşê de ew bûyer bûye navend. Di *Jiyana Bextewar* de bûyerên nêzî derdora 60 salî tên derpêşkirin. Di seranserê romanê de navend ne heman leheng in û carinan bûyer li gorî rêzê pêk nayên. Wekî mînak, di romana *Jiyana Bextewar* de di beşa “Milazimê Padşê” de behsa Sertîb û Xezalê tê kirin. Tê gotin ew her du namzetên hev in. Di beşek paşê de ku bi “Rev” nav kiriye, em dibînin ku Xezal şîretan li keça xwe dike. Qet ji nêz ve behsa təkiliya wan û zewaca wan nehatiye kirin. Di gelek bûyerên romanên Erebe Şemo dixwaze peyamek bide xwendevanên xwe. Ev peyam jî li ser mijara rewşa xirab a demên berê û rewşa xweş a dema niha ye. Di vê bûyera Sertîb û Xezalê de Silêman Beg çav berdaye Xezalê û heger mecal bibîne wê bi zorê Xezalê bistîne. Nivîskar bi kurtasî qalkirina vê bûyerê dixwaze zordariya beg destnîşan bike. Lê honandina romanê sist dibe. Ligel vê, di heman berhemê de

<sup>102</sup> Ayhan Meretowar, “Keseyatiya Edebî ya Erebe Şemo”, *Kovara W*, j. 15., Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007, r. 42.

<sup>103</sup> Şemo, *Hopo*, r. 35.

<sup>104</sup> Şemo, *Jiyana Bextewar*, r. 201.

gelek caran nivîskar dev ji vegotina romanê berdide û bangê xwendevan dike ku bi zêdahî agahî bide xwendevan.<sup>105</sup> Carinan bûyerên ne hewce ne, tên dikevin nav romanê. Bi vê yekê jî xwendina romanê giran û zehmet dibe.<sup>106</sup> Ev yek jî qutbûnê tixe nav honandina romanê. Carinan jî serhev qala rojên nexweş tên kirin. Ev yek jî ji bo pesindayîna jiyana nû tê kirin.

Erebê Şemo di honandina romanên xwe de cih dide nameyan. Bi taybetî di romana *Hopo* de nameyên ku Hesên û Zînê, Hesên û Letîf ji hev re dişînin di honandina romanê de cihê xwe girtine. Wisa dixuye ku Erebe Şemo di honandina hemî romanên xwe de cih daye stran û kilamên gelêrî. Gelek caran ev stran bi fonksiyona bibîrxistina jiyana berê ya nebaş hatine bikaranîn. Di staraneke ku di navbera paleyan de dibore, du evîndar nikarin bigehin mirazê xwe. Lewra kur xizan e û nikare qelenê keçikê bide. Piştî stranê yekê di nav guhdêran de rexneya adetên berê dike.<sup>107</sup>

Lehengên romanên Erebe Şemo li gorî ekola realîzma sosyalîst bi piranî di awayê îdealîzekirî de hatine afirandin. Her pozîtîf in, xebatkar û pak in, rewîştawan dirûst û bêqûsur e. Di nêrîna wan de pêşdebirina civakê heye. Wekî mînak; di romana *Jiyana Bextewar* de dema ku Şehîd ders dixwîne yan jî dema ku dixebite xwarinê jî bîr dike. Her di bîra wî de bêhtir hînbûn û karkirin heye. Di romana *Hopo* de Hesên di nameya ku ji Letîf re şandiye de dibêje: “Tu egoîst î... her ji bona xwe difikirî.”<sup>108</sup> Hesên di nameyê de dibêje pêwîst e mirovên xwenda li gundan veşandin û ji gel re xizmet bikin. Şayesandina lehengan a şiklî pirî caran tê kirin, lê ya derûnî sist e. Em di romanên Erebe Şemo de kêr caran dikarin hestên lehengan ên takekesî bibînin. Ew pirî deman behsa îdealên jiyana nû dikin û xirabiya jiyana berê bi bîr tînin. Di romana navborî de dema ku mêrê Zelêxeyê dimire, ew û kurê xwe bê kes dimînin. Malbata wê dixwaze wê bibe malê û dîsa bide mêr ku carek jî qelenê wê bistînin. Dema ku diya wê tê mala wê û dibêje tu tenê yî, tu yê çawa bê xweyî bijî; Zelêxe wiha bersiva diya xwe dide: “Çima ez

---

<sup>105</sup> Şemo, *Jiyana Bextewar*, r. 28, 53, 76, 136, 150, 180.

<sup>106</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 120.

<sup>107</sup> Şemo, *Hopo*, r. 130.

<sup>108</sup> Şemo, *Hopo*, r. 98.

bê xweyî me? Xweyiyê min Dîwana Sovêtê ye, ya ku azadî da min û da we jî.”<sup>109</sup> Di vê bûyerê de jî armanca nivîskar ne ew e ku hestên jineke jinebî der bike, armanc ew e ku rexne li adeteke kevin bike û bibêje jin dikare bê mêr bijî û kurê xwe xwedî bike. Dîsa di romana *Dimdimê* de kurê Xano Sêvdîn tê kuştin, diya wî dike hewar û gazî. Lêbelê Xano li jina xwe dizivire û dibêje: “Tu şerm nakî? Ne gerek tu şa bî, wekî kurê me bi mêranî jiyana xwe da ji bo erdê kal û bavên xwe, ji bo millet, tu gerek kubar bî bi kurê wisa re!”<sup>110</sup> Li vê derê em dibînin Xano wekî bavekî qet li ber kurê xwe nakeve û hestên xwe nade der.

Lêbelê kêma be jî carinan em hestên lehengan ên takekesî seh dikin. Wekî mînak, di *Jiyana Bextewar* de dema ku Şehîd ji Moskovayê dizivire tê gund dibîne ku li malê diya wî tenê ye. Bavê wî derî gund li ser kar e. Şehîd kêmek li ba diya xwe dimîne û diçe bo ku bavê xwe bibîne. Diya wî xwe bi xwe dibêje: “Tu dibînî qet li cem dê nema, revî, çû cem bavê, çû bibîne, ê çî dibû lawo, tu îro li cem min bimayî, bi ciyekî de neçûyayî.”<sup>111</sup> Bûyereke di vê şeweyê de di *Hopo* de dibore. Yek ji lehengê romana navborî Hopo ye. Hopo li ber lodên giyayên gund hatiye peywardarkirin ku şevê giya neyê dizîn. Lewra çend caran giya hatiye dizîn. Şevêkî Hopo dengê dibihîze û dibîne ku tiştêk nêzî lodan dibe. Tiştê ku tê ber lodan kerê şêx bûye. Hopo berikek berdide kerê û dîkuje. Lê dibêje ka kesek kuştîye, xwe di bin lodan de vedişêre heta sibe. Jina wî Zozan dibîne ku heta sibe mêrê wê li meydanê peyda nabe. Ew pir xemgîn dibe. Dibêje ku mêrê wê hatiye kuştin. Lê dema ku Hopo ji bin lodan derdikeve, Zozan xwe diavêje hembêza wî û dibêje: “Xwedê min qurbana te bike, ronahiya çavê min, ruhê min, tu li ku bûyî heta niha, te yê çawa ez tenê bihiştama?”<sup>112</sup> Dîsa di *Dimdim* de Şebab gava ku du leşkerên eceman dîl digire û tîne kelhê fermandarên Xano bi çaveke mêrxasî li Şebab dinêrin û pesnê wî didin. Kurê Xano Sêvdîn çavnebariya Şebab dike û Şebab ji awirên Sêvdîn jê pê dihesê.<sup>113</sup> Bûyerên bi vê şeweyê ku hest û derûniya lehengan der dikin zêde nayên xuyan.

<sup>109</sup> Şemo, *Hopo*, r. 124.

<sup>110</sup> Şemo, *Dimdim*, r. 243.

<sup>111</sup> Şemo, *Jiyana Bextewar*, r. 235.

<sup>112</sup> Şemo, *Hopo*, r. 38.

<sup>113</sup> Şemo, *Dimdim*, r. 212.

Hin caran jî mirov pê dihesa nivîskar di dewsa lehengan de diaxive. Yanê gotinên lehengan li pozîsyona wan a civakî û entelektûel nayê. Wekî mînak; di romana *Hopo* de du bûyer hene ku mirov digihîne vê biryarê. Di romanê de Apê Sertîb kesekî kal û nexwenda ye. Lê di axaftina xwe de ya ku ji Zînê re dike: “Ji we tirê ez nizanîm. Ez pak dizanim, berê hemû tişt di destên jinan de bû. Jinan çi bixwestina dikirin...”<sup>114</sup> Zanîna agahiyên derbarê maderşahiye de li gorî me ji bo gundiyekek normal nîne. Tê xuyan ku nivîskar di ber lehenge ve diaxive. Ev yek jî zerar dide afirandina lehengan. Lewra bi vê yekê rastiya leheng qels dimîne.

Dema ku em bala xwe didin zimanê romana *Jiyana Bextewar* em dibînin ku zimanê wê paqij, zelal û dewlemend e.<sup>115</sup> Dîsa vegotineke herikok di *Şivanê Kurmanca* de hatiye bikaranîn.<sup>116</sup> Dema ku mirov bi giştî li romanên Erebe Şemo dinêre, dixuye ku zimanê wî nêzî zimanê rojane ye. Vegotina wî cih bi cih di şewaza çîrokên de ye. Di *Jiyana Bextewar* de paragrafeke wiha cih digire:

“Lê gerek ê em bibêjni, di nav wan xulam û xizmetkarên Mîstefa Beg de hebû mîrekî helal, xebatçî û bêqusûr; ew meriv Îbrahîm bû, navê jina wî seyran bû, ji zaran her kurekî wan hebû, navê wî danîbûn Mihemed. Kal û bavên Îbrahîm ji qebîleyeke din bûn, pismamên wan li wê derê tune bûn, maleke tenê bû. Di eslê xwe de Reşkotî bû.”<sup>117</sup>

Ji vegotina paragrafa jorê jî dixuye ku ev vegotin ji vegotina romanê bêhtir di bin bandora zimanê rojane û vegotina çîrokên gelêrî de ye. Zimanê ku bi giranî dixuye devoka Serhedê ye. Zimanê gel e, gel çawa diaxive wî jî di wê meqamê de nivîsandiye.<sup>118</sup> Di romana xwe ya *Dimdimê* de di lêkeran de li dewsa tîpa “b”yê de tîpa “w”yê bi kar aniye. Wekî mînak; li şûna ku bibêje “bibe” gotiye “biwe”, dîsa di dewsa “bibin” de gotiye “biwin”. Ev awa tîpguherîn di devoka Serhedê de dixuye. Fêmkirin û şopandina zimanê wî ne dijwar e. Xwendevan bi hêsanî dikare romanên wî bixwîne. Di berhemên Erebe Şemo de

---

<sup>114</sup> Şemo, *Hopo*, r. 212.

<sup>115</sup> Boyik, *h.b.*, r. 120.

<sup>116</sup> Alan, *h.b.*, r. 198.

<sup>117</sup> Şemo, *Jiyana Bextewar*, r. 87.

<sup>118</sup> Abdurahman Baqir, “Ji Şivantiye Ber bi Zanyariye ve”, *Kovara W*, j. 15, Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007, r. 46.

gelek peyv û têgehên zimanên dî hene. Bi taybetî bandora zimanê tirkî û rûsî berbiçav e. Gelek peyvên wekî “dûşîrmîşbûn, yazî, esker, teyamîşbûn...” yê tirkî û “padval, vagzal, sapok, qerewil, pagranîc...” yê rûsî di berhemên wî de cih digirin. Ligel van biwêjên wekî “arxayîn be” di gelek cihan de dibore. Ji kontekstê mirov tê digihe ku wateya wî “xem neke” ye.

Vegêrê romana *Şivanê Kurmanca* ji devê kesê yekemîn ve hatiye vegotin. Jixwe ev roman otobiyografîk e, lewra ji devê kesê yekemînûna wê hewce ye. Romanên *Jiyana Bextewar*, *Berbang* û *Hopo* ji devê kesê sêyemîn ve hatine vegotin. Di van her sê romanên de pozîsyona vegêr, vegêrê îlahî ye, ew her tiştî dizane. Hebûna xwe di gelek cihan de dide der. Carinan bi aşkere bangî xwendevan dike û agahiyên dide.

## 2.2. MAKSÎM GORKÎ

### 2.2.1. Jiyan, Kesayet, Berhem

Aleksey Maksîmovîç Gorkî (Aleksey Peşkov), di sala 1868an de li Nîjniy Novgorod tê dinyayê. Bavê wî xerat bûye. Diya wî jî wekî gelek jinan bermalî bûye. Di temenên wî yê biçûk de bavê wî dimire. Ew, birayê wî yê biçûk û diya wî vedigerin mala bapîrê xwe. Di rê de birayê wî yê biçûk dimire. Bapîrê wî xebatkerê boyaxkirinê bûye. Piştî mirina diya wî ew li ba dapîr û bapîrê xwe mezin dibe. Rewşa wan a aborî ne baş e. Bapîrê wî kesekî cirnexweş û şerker e. Lewra di malê de herdem atmosfereke giran û bêhteng heye. Lê di van demên xirab de tenê kêfxweşî û şahiya ku wî hîs dikir bi saya dapîra wî ya qenc û dilovan e. Bi saya dapîra xwe haj ji dilşadiyê dibe û pê dihese ku her çiqas rewş xirab û nexweş jî be wateya jiyanê dilşadî ye.<sup>119</sup> Roja mirina diya wî bapîrê wî jê re dibêje: “Dê, Aleksey, tu di stûyê min de gerdanbend nînî ez te bi xwe re bigerînim. Di vê malê de cihê te tune, biçê, bikeve nav insanan...”<sup>120</sup> Qesta bapîrê wî ew e ku Gorkî biçê, bikeve pê nanê xwe. Dema ku dest bi xebatê dike 10 salî ye.

<sup>119</sup> Vladimir Nabokov, *Rus Edebiyatı Dersleri*, wer, Yiğit Yavuz-Fatih Özgüven-Ayşe Nihal Akbulut, weş. İletişim, ç. 2., İstanbul, 2013, r. 390.

<sup>120</sup> Maksim Gorki, *Çocukluğum*, wer. Ergin Altay, weş. Can Sanat Yayınları, İstanbul, 2013, r. 272.

Maksîm Gorkî tenê 2 salan çûye dibistanê. Ji ber rewşa aboriyê nekariye xwendina xwe bidomîne. Piştî di xortaniya xwe de dema ku dikeve nav komên lîseyî û zanîngehî her gav kêmasiya kêmxwendina xwe dikêşe. Lewra derdora wî çî ye ku wî xwendina bilind nekariye, bi çavekî biçûk lê dinêrin.<sup>121</sup> Lê bi saya van koman ji berhem û nivîskaran haydar dibe. Di derbarê wêjeyê de dibe xwedî nêrînên cuda. Derheqê jiyanê de nêrînên wî zû bi zû nagihîjin rêkûpêkiyekê. Sedema vê jî bi gerîna gelek cihan, serboriyên wî yên pir û nexwendabûna wî re têkilîdar dixuye. Lê her çiqas Gorkî perwerdehiyeke rêkûpêk nedîtibe jî hêj di temenên xwe yên biçûk de li xwendina pirtûkan germ dibe. Dema ku di keştiyekê de dixebite, tê de firaxan dişûşt, bi teşwîqa Smuriy gelek pirtûkan dixwîne. Smuriy gelek caran ji bo ku Gorkî bixwîne jê re eqilmendî dike û dibêje: “Tu bixwîne! Eger ji xwendinên xwe fêm nekî wan heft caran bixwîne, eger te dîsa fêm nekir diwazdeh caran bixwîne...”<sup>122</sup> Bi van pêşniyazên Smuriy, Gorkî êdî li ku derê be nêzî pirtûkdarên dibe û ji wan pirtûkan digire, dixwîne.

Di sala 1884an de bi saya piştgiriya hevalekî xwe yê xwendekar ji bo ku li Kazanê zanîngeh bixwîne diçe vî bajarî. Li vî bajarî li rastî gelek dijwariyên aborî tê û di armanca xwe ya xwendinê jî nikare pêk bîne.<sup>123</sup> Li vê derê bi marksîstan re hevnas dibe. Xwe wekî marksîstek pênase dike. Li vê derê di nanpêjxaneyekê de dixebite û nêrînên populîstan nas dike. Piştî ji vî bajarî derdikeve û di gelek bajarên Rûsyayê de kar dike. Di van salên xortaniya xwe de gelek xirabî, zorî dibîne. Dûçarî êş û tirsan dibe. Dinya li ber çavên wî reş dibe. Wisa ku di nozdeh saliya xwe de qesta xwekuştinê dike, lê namire. Piştî ji ber vê tevgera xwe gelek poşman dibe. Bi gotina wî: “Piştî vê hewla xwe, min nekarî bi salan xwe ji hestên şermê û xwebiçûkdîtinê xilas bikim.”<sup>124</sup> Jiyanê Gorkî ewqas dijwar û nexweş dibore lê dîsa jî dev ji mirovheziyê û jiyanheziyê bernade. Dema ku rojek Gorkî serboriyeke xwe ji Tolstoy re vedibêje, Tolstoy jê re dibêje: “Îhtîmala ku tu bûyayî mirovekî xirab zêde bûye. Li dewsa wê qencbûna te mirov heyîrî

<sup>121</sup> Maksim Gorki, *Edebiyat Yaşamım*, wer. Şemsa Yeğin, weş. Payel, ç. 3., İstanbul, 2007, r. 166.

<sup>122</sup> Maksim Gorki, *İnsanlar Arasında*, wer. Ergin Altay, weş. Can Sanat Yayınları, İstanbul, 2014, r. 113.

<sup>123</sup> Tovah Yedlin, *Maksim Gorky: A Political Biography*, weş. Praeger, London, 1999, r. 6.

<sup>124</sup> Gorki, *Edebiyat Yaşamım*, r. 48.



dihêle.”<sup>125</sup> Di demên xwe yên vala de pirtûkên ku ketine destê wî dixwîne. Rêzgirtina wî ya ji xebatê re û eşqa wî ya ji xwendinê re bûn sedem ku Gorkî bibe nivîskarekî navdar.

Di hewlên xwe yên nivîskariyê de Gorkî arîkariyên pêşîn ji nivîskarê navdar Korolenko standiye. Di demên xwe yên pêşîn de her hewl dide ku taybetî û şiyana ziman gelek baş bizane. Bi alîkariya Korolenko çîroka wî ya yekem di rojnameyeke herêmî de, di sala 1892yan de bi navê *Makar Çudra* tê weşandin. Vê çîroka xwe bi mexlesa “Gorkî” diweşîne. Wateya “gorkî” di zimanê rûsî de “êş” e. Lewra Gorkî hêj di temenên xwe yên biçûk de gelek êşan dikêşe û di karên curbicur de dixebite. Arîkariya Korolenko ji Gorkî re ne bi tenê rênîşandayîn bû. Korolenko di 1895an de, di rojnameyeke Samarayê de ji Gorkî re karek dibîne, bi vê xebata nû Gorkî tam dikeve nav nivîsandin û wêjeyê. Di nav wê salê de ku dikeve nav xebatê gelek bi karê xwe re mijûl dibe. Şêweya nivîsandina xwe baştir dike. Bê navber di rojnameyê de çîrokên wî diweşin. Di dawiya salê de dibe nivîskarekî serkeftî û li herêma Volgayê gelek rojname pêşniyaza xebatê lê dikan. Ji wan pêşniyazeke ku ji bajarê Nîjnî hatiye, dipejirîne û vedigere bajarê xwe.

Maksîm Gorkî dest bi xebatên xêrê dike. Ji bo sedan zarokên feqîr partiyeke Noelê pêk tîne. Ji bo bêmal û xebatkaran pirtûkxaneyekê ava dike, ji bo van kesan avahiyeke ku piyanoya wê jî heye ava dike. Ji bo zarokên gundî nivîstokên biwêne çêdike û ji wan re bi rê dike. Di heman deman de Gorkî beşdarî derdorê Korolenko yê şoreşger dibe. Lewre jî du caran ji aliyê polîsan ve tê girtin, lê çî ye ku polîs tu delîlan nabînin, lewra wî serbest berdidin. Di sala 1898an de pirtûka wî ya ku bi navê *Yaşanmış Hikayeler* (Çîrokên Jiyayî) wekî du cild çap dibe. Mirov dikare bibêje ku vê berhemê di navdarbûna Gorkî de zêdetirîn rol lîstiye.<sup>126</sup> Di 1899an de romana wî ya yekem *Foma Gordeyev* diweşe. Di van deman de Gorkî ji bilî çîrok û romanên berhemên şanoyê jî dinivîsand. Di sala 1901ê de şanoya wî ya *Küçük Burjuvalar* (Burjûvayên Biçûk)

---

<sup>125</sup> Maksim Gorki, *Tolstoy'dan Anılar*, wer. Akşit Göktürk, weş. Adam Yayıncılık, İstanbul, 2003, r. 29.

<sup>126</sup> Ataol Behramoğlu, *Rus Edebiyatı Yazıları (XIX. ve XX. Yüzyıllar)*, weş. Tekin Yayınevi, ç. 2., İstanbul, 2012, r. 159.

ji aliyê Şanoya Huner ya Moskovayê ve hate lîstin û serkeftineke mezin bi dest xist. Di nav şanoyên wî de berhema *Ayaktakımı Arasında* (Di Nav Berdûşan De) baştirîn şano tê pejirandin. Ev berhem ji xeynî Rûsyayê, pêşî Almanyayê piştîre jî li Parîs û Pragê tê lîstin.

Ev serkeftina Maksîm Gorkî rê li ber wî vedike ku bibe endamê fexrî yê Akademiya Zanistên Petersburgê. Lê rêvebirên dewletê vê biryara Akademiya Zanistên Petersburgê napejirînin. Lewre jî Anton Çehov û Korolenko ji ber vê helwesta dewletê xwe ji endamtiya Akademiyê vedikêşin.

Piştî salên 1900î Gorkî bi çalak nêzî nêrînên şoreşgerî dibe û piştgirî dide Bolşevîkan. Bi taybetî têkiliyên wî bi Bolşevîkan re xurt dibe. Piştî salên 1903yan pê ve xwe Bolşevîk dizane.<sup>127</sup> Di 1904an de beşdarî civîneke Bolşevîkan dibe ku di civînê de xwişka Lenîn A.I. Ulianov-Elizarova jî heye.<sup>128</sup> Ji bo rêxistinê arîkariyên aborî dike. Gorkî her çiqas alîgir û arîkarê partiyan bibe jî li gorî A. Kanun ku jiyana Gorkî nivîsandiye, ew tu dem nebûye endamê tu partiyê.<sup>129</sup> Di sala 1905an de Maksîm Gorkî ji ber tawanbariya ku di Serhildana Çileyayê Pêşîn de cih girtiye, tê girtin. Piştî girtina wî hem li Rûsyayê hem jî li welatên Ewropayê gelek zana û rewşenbîr nerazîbûna xwe tînin ziman. Ji ber vê piştevanîyê, dewlet mecbûr dimîne Gorkî serbest berde. Piştî berdana wî Gorkî kovareke bi navê *Novaya Zihn* (Jiyana Nû) derdixê. Ev kovar peywireke wekî weşana yekem a Bolşevîkan hildigire ser milên xwe. Gotara Lenîn ya navdar “Rêxistina Partiyê Nivîsa Partiyê” di vê kovarê de diweşe.<sup>130</sup> Di sala 1906an de ji bo ku ji Bolşevîkan re arîkariya aborî û siyasî pêk bîne, diçe Amerîkayê û li wê derê di heman salê de berhema xwe ya *Amerîka'da* (Li Amerîkayê) dinivîse. Di vê berhema xwe de cih dide ceribandîna û dîtînen xwe yê li ser jiyane. Li Amerîkayê derdorên ku ji Gorkî hez nakin jiyana wî ya taybet ji xwe re dikin bahane û gotegotan dikin û nivîsên nerast diweşînin. Gorkî ji ber van reftaran di heman salê de ji Amerîkayê dizivire Îtalyayê. Welatê ku li Ewropayê dikare wî bihewîne tenê Îtalya ye. Tê li vir û heta sala 1913an li girava Kapriyê dimîne. Di

---

<sup>127</sup> Ataol Behramoğlu, *Rus Edebiyatının Öğrettiği*, weş. Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2008, r. 158.

<sup>128</sup> Yedlin, *h.b.*, r. 46.

<sup>129</sup> Yedlin, *h.b.*, r. 59.

<sup>130</sup> Akif Kurtuluş, *h.b.*, r. 102.

van salan de navbera wî û Lenîn xirab dibe. Di salên ku li Ewropayê dimîne ji nêz ve Rojavayê û gelên wê nas dike. Digihîje wê biryarê ku baştirîn rê ji bo guherîna gelê rûs xwendin û perwerdehî ye.<sup>131</sup> Di 1913an de vedigere Rûsyayê û wekî nivîskarê rojnameyê, wêjevan, aktîvîst dema xwe diborîne.

Piştî salên 1906an pê ve berhemên Gorkî yên serkeftî derdiçin û navûdengê wî her diçe berbilavtir dibe. Di sala 1906an de *Dê*, di 1913an de *Zaroktiya Min*, di 1916an de *Di Nav Mirovan De*, di 1923an de *Zanîngehên Min*, di 1925an de *Artamanovan* tê weşîn. Romana xwe ya *Dê* li Amerîkayê dinivîse û ev roman pir deng dide. Roman li Rûsyayê tê qedexekirin.

Piştî Şoreşa Kewçêrê Gorkî ji bo avakirina çanda sosyalîzm, dikeve nav xebatan. Beşdarî xebatên vekirina Zanîngeha Yekem a Karkerên Gundî û weşanxaneyêke bi navê Wêjeya Cîhanê dibe. Ligel van li bajarê Petrogradê di avakirina şanoyêke mezin a dramatik de cih digire.<sup>132</sup> Her hewl dide ku xwendin di nav gel de berbelavtir bibe. Gelekî girîngî dide avahî, berhem û yadîgarên hunerî yên beriya şoreşê. Bangî hemwelatîyan dike ku li wan xwedî derkevin û zerar nedin wan. Bangî gel dike ku hêjahiya azadiya xwe zanibin û ji anarşiyê dûr bisekinin. Gorkî bi çavê Bolşevîkan li çînen arîstokrat û bûrjuvayê nanêre ku dixwestin her awayê wan tune bihesibînin. Li gorî wî nirxên hêja yên van çînan divê bên parastin û di avakirina sîstema nû de ji wan sûd bê wergirtin.

Li Petrogradê, piştî salên 1918an pê ve, Gorkî, di bin banê Weşanên Dewletê de hewl dide berhemên wêjeya cîhanê bi awayekî berfireh bide wergerandin. Bi saya van wergeran gelek nivîskar dibin xwedî kar.<sup>133</sup> Di sala 1921ê de rewşa wî ya tendûristî xirab dibe. Ji ber avûhewayê xweş a Îtalyayê diçe wê derê. Heta 1928an li Îtalya û li Fransayê dijî. Di sala 1926an de cilda yekem a romana xwe ya mezintirîn *Klim Samgin'in Hayatı* (Jiyana Klîm Samgîn) dinivîsîne. Di 1928an de vedigere Rûsyayê. Ew vê berhema navborî di van salan de diqedîne. Di vê berhema xwe de ya ku rewşa burjûvayên biçûk ku 30-40 salên

---

<sup>131</sup> Yedlin, *h.b.*, r. 98.

<sup>132</sup> Ö. Aydın Süer, *XIX. Yüzyıl Rus Edebiyatı Üzerine Yazılar*, weş. Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2006, r. 166.

<sup>133</sup> Jean Bonamour, *Rus Edebiyatı*, wer. İsmail Yerguz, weş. Dost Kitapevi, Ankara, 2006, r. 91.

beriya Şoreşê û paşî Şoreşê dihewîne, cih dide rewşa civakê.<sup>134</sup> Piştî vegera xwe Gorkî dikeve nav xebateke xurt ya hunerî û civakî. Seranserê Rûsyayê bi coşî digere. Di damezrandina saziyên çandî, perwerdeyê û wêjeyê de cih digire. Gelekî girîngî dide perwerdeya zarok û ciwanan.

Maksîm Gorkî pir girîngî dide wêjeya cîhanê jî lewra bi rewşenbîr û nivîskarên welatên di re dikeve têkiliyê da ku berhemên wan bide wergerandin. Ji bo vê armancê weşanxaneyê Wergerên Ji Wêjeya Cîhanê ava dike û rêveberiya wê jî hildide ser xwe. Di 1931ê de dîsa nexweş dikeve, vê carê wî dişînin Qirimê. Cara yekem Kongreya Nivîskarên Sovyetê di 23.08.1934an de dicive. Serokatiya kongreyê Gorkî dike. Di vê kongreyê de teblîxekê pêşkêş dike. Di 1936an de Maksîm Gorkî diçe ser dilovaniya Xwedê. Her çiqas nexweş jî be ji nişkê ve mirina wî dibe sedema hinek gumanan. Pirsê “Gelo Gorkî hate kuştin?” dikare bi bersiva erê bê bersivandin. Lê çima û ji aliyê kê ve kuştina wî pêk hat hêj jî nediyar e.<sup>135</sup> Gava ku mirov bi seranser li jiyana Gorkî dinêre, dibîne ku her gav xwe nêzî maxdûran dîtiye û xwestiyê piştgiriya bide wan. Heta Şoreşa Kewçirê her li ber rêveberiya çar sekiniyê û mafên bindestan parastiye. Di dema Şerê Cîhanî yê Yekem de li Rûsyayê gava ku cihû tîrperçiqandin û kuştin ji bo wan bi her du çavan digirî. Di rojnameyan de bo ku xwedî li cihûyan derkevin bangî gel dike. Piştî Şoreşa Kewçêrê dema ku Bolşevîk li çînên di zordestiyê dike Gorkî dîsa helwesta xwe nîşan dide. Lewra bi taybetî piştê mirina Lenîn, Gorkî bêhtir bala Partiyê dikêşe û Partî dixwaze dengê wî bifetisîne, rê li ber wî bigire. Dibe ku sedema mirina wî di vê helwesta wî de bê dîtin ku rêveberiya Stalîn jê aciz dibû.

### 2.2.2. Nêrîna Wêjeyî ya Maksîm Gorkî

Maksîm Gorkî di cureyên wekî roman, çîrok, şano de berhem nivîsandine. Her çiqas bi çîrokan dest bi nivîskariyê kiribe û deng dabe jî, navûdengê xwe bêhtir ji romanên xwe standiye. Sedemên ku rê li ber nivîskariya wî vekirine helbet gelek in. Lê li gorî me hinek ji van berbiçavtir in. Hêj di emrên xwe yê biçûk de di navbera wî û dapîra wî de têkiliyeke xurt dest pê dike. Gava ku mirov

<sup>134</sup> Behramoğlu, *Rus Edebiyatının Öğrettiği*, r. 161.

<sup>135</sup> Kurtuluş, *h.b.*, r. 130-131.

bala xwe dide dapîra wî, taybetiya wê ya çîrokbêjîyê bala me dikêşe. Wisa dixuye ku dapîra wî jê re bûye îlham.<sup>136</sup> Dema ku hêdî hêdî dest bi nivîsanda helbestên kurt dike, van helbestan ji dapîra xwe re dixwîne. Gorkî rojek dixwaze ji dapîra xwe re helbesta ku nivîsandiye bixwîne, lê dapîra wî xwendina wî di nivî de dihêle û dibêje jixwe stranek wiha heye, dest bi xwendina wê dike.<sup>137</sup> Diyar e ku Gorkî hewl dide di şêweya stranên dapîra xwe de helbestan binivîse. Carinan jî dema ku bi tenê dimîne xwe bi xwe stranan dibêje.

Dîsa em ji pirtûka wî ya otobiyografîk a *Di Nav Insanan De* pê dihesin ku ew ji jiyana zehmet û bêhteng dixwaze dût bikeve û bikeve nav jiyana pirtûkan ku wî kêfxweş dike. Jixwe dema ku jê dipirsin daxwaza nivîsandinê ji ku tê, wiha dibersivîne: “Helbet, li dewsa behreya nivîskariyê, tenê ji bo ku jiyana zordest û bêhteng dewlemendtir û ronîtir bibe...”<sup>138</sup> Bi saya xwendina pirtûkan repertûara wî ya wêjeyî fireh dibe. Bi vî awayî jî ji bo afirandinên wî xîmek çêdibe. Mirov dikare gerokîya Maksîm Gorkî jî li van sedeman zêde bike. Lewra ji demên berê ve tê zanîn ku mirov bi du awayan ceribandînan xwe yê cîhanê zêde dike. Ya ewil xwendin e û ya duyem jî ger e. Bi saya gerên xwe Gorkî rastî bûyer û jiyânên curbicur tê. Ev yek mahzena afirandinên wî fireh dike. Jixwe beriya ku Gorkî dest bi nivîsandinê bike van serboriyên xwe û xwendinên xwe têkilhev dike û ji kesên derdora xwe re vedibêje. Dibîne ku vegotinên wî gelekî bala mirovan dikêşe. Carinan hinek kes dibêjin wî van serboriyên xwe binivîse. Jixwe gava ku mirov bala xwe dide naveroka berhemên wî, mirov dibîne ku ew tam ji nav rastiya jiyânê derketine. Rojek Tolstoy ji Gorkî re dibêje ku ev tiştên tu dinivîsî hemî derew in rastiya wan tune. *Kuvaldaya* jî ne rast e. Gorkî dibêje min *Kuvalda* ji jiyânê hildaye. Bûyera mehkemeyê jê re vedibêje. Tolstoy xemgîn dibe û digirî.<sup>139</sup>

Dema em bala xwe didin berhemên ku Gorkî xwendine, bêtir pirtûkên ji wêjeya fransî û rûsî derdikevin pêş çavên me. Bi gotina wî: “Di kemilîn û têgihîştina min de bandora kesên wekî nivîskarên mezin ên fransîz Stendhal,

---

<sup>136</sup> Yedlin, *h.b.*, r. 3.

<sup>137</sup> Maksim Gorki, *İnsanlar Arasında*, r. 145.

<sup>138</sup> Gorki, *Edebiyat Yaşamım*, r. 36.

<sup>139</sup> Gorki, *Tolstoy'dan Anılar*, r. 72-73.

Balzac û Flaubert pir girîng e... Dixwazim bibêjim ku ez nivîsandinê ji nivîskarên fransî hîn bûm.”<sup>140</sup> Gorkî van nivîskaran pêşniyazê kesan dike ku dest bi nivîsandinê dikin. Ji nirxandinên wî yê di gotara “Ez Çawa Nivîsandinê Hîn Bûm” de dixuye ku Gorkî gelekî serwextî wêjeya rûsî ye û piştî xwendinên wêjeya fransî dest bi xwendina berhemên rûsî kiriye. Lê mirov dikare bibêje ku bandora nivîskarên wekî Pûşkîn, Gogol, Turgenyev, Gonçarov, Tolstoy, Korelenko û Çehov bêhtir diyarker in. Lewra Gorkî xêza wan a realîzmê şopandiye û vê xêzê gihandiye realîzma sosyalîst. Gorkî û Çehov dibin dostê hev û her gav derbarê berhemên hev de li hev pêşniyazan dikin. Gorkî gelekî nivîskariya Çehov dicibîne. Wekî mînak; gelek caran diçe li *Vanya Dayı* (Xalê Vanya) dinêre. Di nameyeke bo Çehov de dibêje: “Ez nizanim heyraniya xwe ya ji bo te çawa bînim ziman.”<sup>141</sup> Ji wêjeya îngilîzî Shakespeare, Dickens û ji wêjeya fransî Dumas nivîskarên sereke ne ku wî berhemên wan xwendine. Gorkî di nav van nivîskarên navborî de helbet ji hemiyarên sîd wergirtiye, lê li ber dilê wî hinek hêjatir bûne. Bi gotina wî: “Li gorî min Shakespeare, Balzac û Tolstoy ji bo mirovahiyê sê abîde ne ku bi destên mirovahiyê hatine saz kirin.”<sup>142</sup>

Maksîm Gorkî ji bilî rûsî zimanekî di nezaniyê.<sup>143</sup> Lê ev ji bo ku ew wêjeya cîhanê bişopîne nebûye asteng. Gelek caran ji nivîskarên navdar yê dema xwe daxwaza berhemên wan kiriye û bi hevalên xwe van berhemên daye wergerandin û piştê ew xwendine. Piştê ji nivîskarên wan re nirxandinên xwe şandiye. Yan jî wekî şopînerê wêjeya cîhanê di demeke zû de xwe gihandiye berhemên ku di rûsî de weşiyane. Bi kesên wekî Romain Rolland, Stefan Zweig, Bernard Shaw û H.G. Wells re di nav tîkiliyê de bûye.

Maksîm Gorkî dibêje mijara sekeke ya wêjeya Ewropa û Rûsyayê ya sedsala 19an takekes bûye. Di vê demê de mijara çînan û birin jêr nebûne mijara wêjeyê. Lêbelê li gorî Gorkî nivîskar li hemberî civaka xwe berpisiyar e. Pêwîst e jiyana ku li derdore wî diqewime di berhemên xwe de vebêje. Ev vegotin jî divê

<sup>140</sup> Gorki, *Edebiyat Yaşamım*, r. 53-55.

<sup>141</sup> Maksim Gorki, *Gorki'nin Mektupları*, wer. Zeyyad Özalpsan, weş. Engin Yayıncılık, İstanbul, 2006, r. 21.

<sup>142</sup> Maksim Gorki, *Edebi Portreler*, wer. Ayşe Hacıhasanoğlu, weş. Yordam Kitap, İstanbul, 2007, r. 164.

<sup>143</sup> Gorki, *Gorki'nin Mektupları*, r. 127.

civatê derbarê jiyânê de agahdar bike û di kemilîna kesan de sûdewar bibe. Divê nivîskar wekî rêberê hewl bide gelê xwe ji paşdemayîne xilas bike. Di berhemên xwe de cih bide xebat û geşedana ferdên civata xwe û hewce ye ev xebat û kes ji xwe mezintir û hêjatir bên vegotin. Divê wêje ji bo hemî gelên proleter kar bike û wan bike xwedî hişmendiya mafên wan. Nivîskar hewce ye nêrînen sosyalîzmê di jiyana rojane de derxe pêşiya xwendevan ku di xwîner de nêrîneke sosyalîst û şoreşger çê bike. Bi wan bide zanîn ku hemî gelên proleter birayên hev in û divê li hember mafxwiran hevkarî bikin. Divê bi çînen jêr û gelan bide zanîn ku hewce ye ji bo ku mafên xwe bi dest bixin û pêşve biçin. Nivîskar divê bi gel nîşan bide ku ji bo bi destxistina mafên xwe amadeyê têkoşîne bibin.<sup>144</sup>

Maksîm Gorkî dema ku dest bi xwendina berhemên wêjeyî dike, dibîne ku naveroka berhemên û jiyana rasteqîn ne wekî hev in. Di berhemên de jiyana û kes bi awayekî ne li gorî rastiyê ne hatine vegotin. Dema ew dest bi nivîsandinê dike her hewl dide jiyana û insan çawa bibin wisa jî binivîse. Jixwe gava ku mirov bala xwe dide berhemên wî yê pêşîn mirov dibîne ku naveroka berhemên rasterast serboriyên Maksîm Gorkî ne. Berhema wî ya pêşîn *Çîrokên Jiyayî*, ku guldesta çîrokên wî yê di kovar û rojnameyan de weşiyayî ne, mirov dibîne ku çîrok wekî serboriyên Gorkî tîne vegotin. Di çîroka *Yol Arkadaşım* (Hevrêyê Min) de jixwe navê serlehengê çîrokê Maksîm e.<sup>145</sup> Ji navê berhemê jî diyar e ku di vê çîrokê de Maksîm Gorkî qala çûna xwe ya Tîblîsê û hevrêyê xwe dike. Di berhemên xwe yê pêşîn de ligel serboriyên xwe Gorkî cih dide serboriyên hevalên xwe yan jî cih dide serboriyên ku ji wî re hatine vegotin. Wekî mînak; mijara çîroka *Konvalov* serboriya hevalê wî Aleksandr Îvanoviç Konvalov e. Di vê çîroka dirêj de Gorkî qala jiyana hevalê xwe û xwekuştina wî dike. Xwekuştina hevalê wî wekî nûçe di rojnameyekê de derketiye. Di serê çîrokê de ev nûçe jî hatiye dayîn.<sup>146</sup> Di çîroka *Makar Çudra* de mijara çîrokê ji devê kalekî mitirb tê vegotin. Ji destpêka çîrokê diyar e ku Gorkî di gereke xwe de rastî wî kalî hatiye. Wisa dixuye ku bûyerên di çîrokan de diborin di serê Gorkî de borîne.

<sup>144</sup> Maksim Gorki, dnd: *Sanatta Sosyalist Gerçekçilik*, r. 91

<sup>145</sup> Maksim Gorki, *Arkadaş*, wer. Gülen Aktaş, weş. Oda Yayınları, ç. 11, İstanbul, 2013, r. 44.

<sup>146</sup> Maksim Gorki, *Yaşanmış Hikayeler*, wer. Ataol Behramoğlu, weş. Can Sanat Yayınları, ç. 3, İstanbul, 2013. r. 113.

Yek ji lehengê çîrokan ew bi xwe ye. Gorkî carinan naveroka çîrokên xwe li ser çîrvanokan jî ava dike. Di çîrokên wî *Masal* (Çîrvanok) û *Han ve Oğlu* (Mîr û Kurê Xwe) de em dibînin ku naverok çîrvanok in. Jixwe di destpêka çîroka *Çîrvanok* de nivîskar dibêje ku “Ev tiştê hûn ê bixwînin çîrvanok e, li gorî wî guh bidinê.”<sup>147</sup>

Maksîm Gorkî di wê baweriyê de ye ku mirov ji pirtûkan bêhtir ji jiyane tiştan hîn dibe. Li gorî wî kesên rasteqîn ji yên afirandî hewcetir in. Lewra Gorkî di berhemên xwe de qet tev li lehengên xwe nabe. Çawa tevgeriyabin wisa cih daye wan. Reftar û nêrînên wan bi zelalî û bê rexne vegotiye. Em gelek caran bi hest û derûna lehangên dihesin. Carinan ev pêhesîn li mikûrhatina lehangên bixwe çêdibe. Di çîroka *Çelkaş* de Gavrîlo di dilê xwe de dibêje ez Çelkaş bikujim û peran ji wî bistînim. Lê dema ku Çelkaş derdixê ji heqê wî zêdetir pere dide wî Gavrîlo şa dibe û hestên ku di dilê wî de borîne ji Çelkaş re dibêje.<sup>148</sup> Dîsa di çîroka *Hevrêyê Min* de Maksîm her gav arîkariya Şakro dike. Wisa ku ji bo Şakro heta Tîblîsê pê re peyatî diçe. Di rê de hewce dibe dema ku di ser rûbarekê re biborin sandalekê bidizin. Plana wan li gorî dilê wan naçe serî, li rastî çend şivanan tên. Şivan dibêjin em wan bidin polîs. Piştî dev ji vê gotina xwe berdidin û wan serbest berdidin. Şakro ji Maksîm re dibêje eger wan em bidana polîs min ê bigota vî kesî xwestiye min bixeniqîne.<sup>149</sup> Di van çîrokan de leheng pir xwezayî ne. Hestên wan û reftarên wan tam li gorî civata Rûsyayê ya wê demê bûne.

Maksîm Gorkî di gelek cihan de qala rihê gelê rûs dike. Wisa xuyaye wî xwestiye vî ruhê bi awayekî zelal der bike. Leheng pir xwezayî û rast in. Mirov dibêje ka bûyer li ber çavên mirov diqewimin û leheng li ber mirov diçin û tên. Di çîroka *Seyirciler* (Tamaşevanan) de mirov dibîne ku leheng pir xwezayî û jidil in. Çawa bibin wisa tevdigerin. Axafîn û nêrînên lehangên tam li gorî jiyana wan a rastî ye ku xwendevan qelek qenc ruhê van lehangên û jiyana wan tê digihe. Axafînên wan li hember hev zehf rojane û heqaretwarî ne. Di çîrokê de ereba

---

<sup>147</sup> Maksim Gorki, *Fırtınanın Habercisi*, wer. Pelin Atayman, weş. Bordo Siyah Yayınları, İstanbul, 2008, r. 141.

<sup>148</sup> Gorki, *Yaşanmış Hikayeler*, r. 83..

<sup>149</sup> Gorki, *Arkadaş*, r. 35.



hespan zarokekî sêwî, Koska, bin pê dike. Kurik li erdê birîndar dimîne. Kesên taxê li ser serê kurikî dicivin, lê kes hewl nade arîkariya wî bike û wî bibe nexweşxanê. Di dewsa vê de gotinan di ber hev de diavêjin. Mamê Koska jî tê heqeret lê dike û diçe. Kurik bi saetan wisa li erdê dimîne. Piştê kesekî bi navê Saşa wî dibe nexweşxaneyê. Di dawiya çîrokê de em dibînin ku Koska dimire. Dema ku darbesta wî di taxê re dibore taxî ecêbiya xwe tînin, ber wî dikevin. Yek dibêje: “Zarokê feqîr miriye ha!”<sup>150</sup> Lê wicdana tu kesî naêşe ku wan çima terkexemî kir û ew zû nebîr nexweşxaneyê. Mirov wisa têdigehe ku Gorkî dixwaze bi xwendevan bide fêmkirin ku çawa gelê rûs li hember zarokekî xizan terkexem e û mirina kesekî wiha li ber çavên wan çiqas ji rêzê ye.

Dema mirov bala xwe dide romanên Gorkî yê *Zaroktiya Min*, Di *Nav Insan De* û *Zanîngehên Min*, ku ev roman otobiyografîk in, mirov dibîne ku Gorkî bi çavekî qenc û evînî li kesên derdora xwe dinêre. Di dilê wî de li hember kesan rik tune. Dema ku qala wan dike bê alîgir behsa wan dike. Kesayetiya wan û reftarên wan rexne nake. Gorkî ew çawa bibin wisa wan qebûl dike. Ev mirovhezîya Gorkî di hemî roman û çîrokên Gorkî de dixuyin. Lehengên Gorkî mirovhez in. Wekî mînak; di çîroka *Bozkırda* (Li Deştê) sê hevalên zehf birçî li deştê li rastî kesekî tîn. Her sê heval dixwazin nêzîkî wî kesî bibin û jê nan bixwazin. Lê kesê tenê ye gule berdide wan. Hewa tarî dibe. Her sê heval di ser kesê tenê de diçin û wî digirin. Xwarina wî jê distînin. Lê azar nadin canê wî, her çiqas wî gule berdabe wan jî. Her sê heval agir vêdixin. Kesê ku tenê ye bangî wan dike: “Birayên ezîz!... Dikarim bêm li wê, li ber agir?”<sup>151</sup> Heval rê didin wî bo bê cem wan. Dest bi axaftinê dikin. Li hember hev rik nagirin. Mirov dibêje ka ew nebûn çend dem berê dibezîne hev. Li vî derî jî leheng dilovan û mirovhez in.

Di hemî berhemên Gorkî de mirov dibîne ku di derbarê xweza û mirovan de raçavkirineke xurt heye. Helbet ev yek bi jiyana Gorkî re girêdayî ye. Lewra Gorkî li dewsa ku demên xwe yê zaroktî û ciwanîyê li dibistanên fermî û di polan de biborîne, di malekê de û di derdoreke teng de bisekine; ew bi peyatî gelek bajaran geriyaye û bi gelek mirovan re hemhal bûye. Vê yekê derfeta

---

<sup>150</sup> Maksim Gorki, *Seyirciler*, wer. Ayşe Hacıhasanoğlu, weş. Yordam Kitap, İstanbul, 2008, r. 124.

<sup>151</sup> Gorki, *Yaşanmış Hikayeler*, r. 273.

jinêzvenaskirina mirov û xwezayê daye wî. Wî jî di berhemên xwe de cih daye van çavdêriyên xwe. Di romana *Di Nav Insanan De* de xaniyê ku ew dimîne dişibîne kesekî feqîr ku dema zengîn dibe, piştî di demekê kurt de pir dixwe û dibe zikfiş.<sup>152</sup> Gelek caran jî şayesandina kesan bi riya şibandina ajal û hebûnên xwezayê dike. Wekî mînak; di cihekî çîroka *Karşılıksız Bir Aşk* (Evîneke Yekalî) de lehengê çîrokê, şêlûbûna rûbarê dişibîne jiyana xwe.<sup>153</sup> Lewra leheng bi xwe jî di nav hestên tevlehev de ye. Di çîroka *Vapurda* (Di Keştiyê De) destê kesekî kal dişibîne pêyên dikekî.<sup>154</sup> Dîsa çîroka *Şahin Türküsü* (Strana Baz) jî ji aliyê teswîrkirina xwezayê ve pir dewlemend e.

Zimanê ku Maksîm Gorkî di berhemên xwe de bi kar aniye zimanekî zelal û rojane ye. Axafînên lehengan tam li gorî asta wan a sosyal tê. Zimanê vegotinê tîr nîne. Xwendevan dema ku dixwîne naweste. Cih cih vegotin di şêweya vegotina zimanê rojane de tê kirin Ev yek pîranî dema ku bûyer ji devê kesekî/ê di tê kirin xwe dide der. Mirov dikare mînakên vî awayî vegotinê di çîrokên Gorkî yên ku li Îtalyayê nivîsandine nîşan bide. Mînak: "... li gundê Saracena jineke pir xweşik dijiya...mêrê wê çûbû Amerîkayê, ew li mala xezûrê xwe dima...dengê jinikê xweş bû û ser quweta xwe bû...ji ken û axafînê hez dikir..."<sup>155</sup> Çawa ku li hevokên jorê jî xuyaye, ziman pir sade û hevok bi awayê zimanê rojane hatine saz kirin.

Çîrokên Maksîm Gorkî yên li Amerîka û li Îtalyayê hatine nivîsin, ka ji mirov e li gorî çîrokên wî yên li Rûsyayê hatine nivîsîn, kêmtir li ser lehengan sekinîne. Bi taybetî çîrokên li Amerîkayê hatine nivîsîn bêhtir bi şayesandina bajarên Amerîkayê xurt in û jiyana civaka li wî derî derxistine pêş. Naveroka çîrokan tehlîl kirina bajar û civatê ye. Di çîrokan de teswîrkirina bajêr û jiyana bajêr xurt e. Bi taybetî çîrokên wî yên *Sarı Şeytan'ın Kenti* (Bajarê Şeytanê Zer) û *Can Sıkıntısı Krallığı* (Keyatiya Bêhtengiyê) ji bo van gotinên me di cih de ne. Çawa me gotî Gorkî jiyana û kesên gelê rûs pak nas dike. Loma kariye li ser derûna lehengên rûs bisekine. Lê wisa xuyaye ku dema li Amerîkayê ye hewl

<sup>152</sup> Gorki, *İnsanlar Arasında*, r. 68.

<sup>153</sup> Gorki, *Seyirciler*, r. 178.

<sup>154</sup> Gorki, *h.b.*, r. 102.

<sup>155</sup> Maksim Gorki, *Amerika'dan İtalya'ya*, wer. Ayşe Hacıhasanoğlu, weş. Heyamola Yayınları, İstanbul, 2007, r. 168.

daye ji kesan bêhtir derdora xwe û jiyana wan derxe pêş. Di van çîrokên navborî de, ku li Amerîkayê hatine nivîsîn, rexne ji bo bajarvanî û awayê jiyane heye. Di çîrokên ku li Îtalyayê hatine nivîsandin de, derpêşkirina jiyane û mantalîteya gelê Îtalî heye. Gelek çîrok wekî ku berê qewimîne, tên vegotin yan jî bi devê kesekî/e di wekî ku ew çîrok di serî wî/wê de boriye yan jî wê çîrokê bihîstiya tên vegotin.

Naveroka çîrokên berê yê Maksîm Gorkî wisa xuyaye ku yan serboriyên wî ne yan jî bûyerên hatine guhên wî ne. Lê çîrokên wî yê piştî vegera wî ya ji Îtalyayê hatine nivîsîn cuda ne. Mirov pê dihesa ku yek ji lehengê çîrokê Gorkî nîne. Bûyer di serê wî de neboriya. Li gorî rastî û rihê demê hatiye honandin. Çîrokên wî yê *Evîna Yekalî û Mavi Bir Yaşam* (Jiyaneke Hişîn) divê di vê kategoriyê de bîn hesabandin. Zimanê van çîrokan li gorî yê berê tîtir e.

Maksîm Gorkî di qada wêjeyê de navûdengê xwe piştî çîrok û romanên xwe deyndarê berhemên xwe yê şanoyê ye. Şanoyên wî yê *Burjûvayên Biçûk* û *Dipte* (Di Kûrahiyê de) eleqeyeke mezin dîtin. Taybetiya şanoyên Gorkî ne tenê bûyeran pêşkêş dike, lêbelê derbarê bûyeran de tameşevanan digihîne biryarekê jî. Armanca peyitandinê di xwe de dihevin. Bi vî awayî şanoyên Gorkî ji yê Çehov vediqetin. Lehengên şanoyên Gorkî kesên ketî, xebatkar, axa, burjûva û rewşenbîr in ku hişmendiya berê diparêzin. Di şanoyên xwe de Gorkî çînen xizan bi awayekî zelal û sade derdixe ser dikê. Jiyana wan a dijwar û hişmendiya wan li ser dikê tê veçirandin. Ji lehengên axa, burjûva û rewşenbîran armanc ew e ku bi tamaşevan bide nîşan ku dema van kesan û hişmendiya wan boriye. Awayê jiyane û mantalîteya wan rast nîne. Di şanoyên xwe de cih dide hêza hişmendiya şoreşger a kedkar. Di şanoya *Burjûvayên Biçûk* de lehengê Nîl temsîla vê şîarê dike.<sup>156</sup> Leheng di nav xwe de wekî baş û xirab nayên debeşkirin. Dibe ku leheng xwediyê van her du taybetiyan jî be. Di şanoyên xwe de Gorkî her xwestiya mirov derxîne pêş.

Beriya ku Maksîm Gorkî di qada romanê de bi sêbareya xwe derkeve pêş, bi romana xwe ya *Dê* dengê xwe hem li Rûsyayê hem jî dinê berbelavtir kir. Armanca nivîsandina vê romanê ew bû ku piştgirî bide şoreşgerên Rûsyayê.

---

<sup>156</sup> Behramoğlu, *Rus Edebiyatı Yazıları (XIX. ve XX. Yüzyıllar)*, r. 162.

Serlehengê romanê Pelageya ye. Palegeya jineke xizan e. Piştî kurê wî Pavel dibe şoreşger Palegeya jî dikeve derdora kurê xwe. Bi vê yekê jî hêdî hêdî nêrînên wan nas dike. Nêrîn û daxwazên wan bi jiyana û sîstema heyî dide ber hev. Roj bi roj heq dide nêrînên şoreşger û dikeve nav xebatan heta ku tê girtin. Maksîm Gorkî dema ku Pelageyayê afirandiye ji civaka rûsyayê sûd wergirtiye. Lewra di wan deman de kêm be jî dayîkên şoreşger hebûne. Helbet armanca romanê ew e ku bi xwendevan bide zanîn ku jineke dîndar û adetî jî dema nêrînên şoreşger nas dike wan nêrînan rast dibîne û yên heyî hêjatir dibîne. Ligel şanoyên xwe Gorkî di vê romana xwe de dîdaktîk e. Hewl dide milê rast nîşanê xwendevan bide. Lê di romanên xwe yên otobiyografîk de mirov nagihîje wê qeneetê ku Gorkî dixwaze bi vî awayî peyamek rasterast bigihîne xwendevan. Çi di romanên xwe yên otobiyografîk de çi çîrokên xwe de Gorkî xwestiye xwendevanan û lehengan tenê bihêle. Xwendevan bi xwe bi leheng û jiyana rût hemhal be. Di romanên xwe yên navborî de Gorkî alîgir nîne. Leheng wekî xwe tevdigerin û bandora nivîskar li ser wan tune.

## BEŞA SÊYEM

### BERAWIRDKIRINA NAVEROKÎ Û ŞÊWEYÎ YA ŞIVANÊ

#### KURMANCA Û SÊBAREYA MAKSÎM GORKÎ

#### 3.1. CUDAHÎ Û WEKHEVIYÊN JIYAN Û NÊRÎNA WÊJEYÎ YÊN EREBÊ ŞEMO Û MAKSÎM GORKÎ

Erebê Şemo li gund, di malbateke xizan de tê dinê. Ji ber jêhatîbûn û zîrebûna xwe ji aliyê dê û bavê xwe ve tê hezkirin. Ji aliyê dê û bavên xwe ve di nav xwişk û birayên xwe de ew fêmdartirîn tê dîtîn. Di vê mijarê de Şemo di romana xwe ya otobiyoğrafîk de wiha dibêje: “Wextê me pincar berev dikir brêd min bîr dikirin –pincara xwarinê û heşnayî ji hev kifş nedikir, nas nedikirin. Min pincar hemû nîşanê wan dida.” (Şivanê Kurmanca, r. 57.) Ev jîrbûna wî di dibistanê de jî derdikeve pêşberî me: “Li mektebêda, nav şagirtada ez xwandinêda pêşiya teva bûm, loma jî min mekteba me rind kutta kir.” ( r. 90.) Ji ber xizaniya xwe Şemo di temenên biçûk de dest bi xebatê kiriye. Ji nav malbat û gund derketiye ketiye nav gel û kesan.

Maksîm Gorkî ji Erebe Şemo cudatir ne li gund li bajar hatiye dinê. Malbata wî jî xizan bûye û di temenên wî yê biçûk de dê û bavê wî dimirin. Maksîm Gorkî salên xwe yê pêşîn ên sêwîtiyê li ba dapîr û bapîrê xwe diborîne. Lê çî ye ku rewşa wan ya aboriyê ne baş e, Gorkî dikeve pê nanê xwe. Ew jî ji malê derdikeve, dikeve nav kesan. Çawa tê xuya dibe hem Erebe Şemo hem Maksîm Gorkî zaroktiyeke wekî hev jiyane: xizanî dîtine û ketine pê nanê xwe. Lê mekanên wan cuda bûne. Erebe Şemo bêhtir di nav gundiyan de bûye û bi karê gundîtiyê re mijûl bûye. Maksîm Gorkî li bajar bûye û karên bajarvaniyê kiriye. Helbet vê yekê piştî bandor li ser nivîsandina wan kiriye. Wekî mînak giraniya berhemên Erebe Şemo derbarê gund û kesên gundî de ne. Lêbelê bi çavekî gelemper dema ku em li berhemên Gorkî binêrin, em dibînin ku berhemên wî derbarê lehengên bajarî de ne. Mekan jî ji gund bêhtir bajar in.

Ji ber ku Erebe Şemo û Maksîm Gorkî di temenên xwe yê biçûk de dûçarî zorî û neheqiyê bûne, li hember sîstema heyî di hişê wan de guman peyda dibin. Maksîm Gorkî dikeve nav derdorên şoreşger. Erebe Şemo jî heman awayê di nav refên şoreşger de ye û ji bo ku sîstema nû ava bibe li dijî sîstema berê şer dike. Her du nivîskar jî dûçarî lêpîrsîna polîsan dibin û tîna binçavgirtin. Di salên berî Şoreşa Kewçêrê de wekî propagandîst û di pêvajoya Şoreşa Kewçêrê de Erebe Şemo wekî şervan û propagandîst alîkariya sîstema nû dike, Maksîm Gorkî jî wekî aktîvîst rolek digire. Ew ji bo Partiyê weşanan derdixe û ji bo aboriya Partiyê organîzasyonan çêdike. Demekê ji bo vê yekê heta Amerîkayê jî diçe. Ev nêrîn û lebatê wan bo sîstema nû di berhemên wan ên wêjeyî de jî xwe dide der. Mirov dibîne ku Erebe Şemo her xwestiyê jiyana sîstema nû di romanên xwe de derxe pêş. Sîstema berê û ya nû dide ber hev û pesnê sîstema nû dike. Xirabî û neheqiyên berê tîna bîra mirov. Di romana *Jiyana Bextewar* de ev yek digihîje radeyekê mezin, hinekan ev berhem propagandîst bi nav kiribû. <sup>157</sup> Maksîm Gorkî jî bi taybetî di romana xwe ya *Dê* de propagandaya sîstema nû dike. Bi heman awayî di şanoyên wî de jî hêla peyamdayîne xwe dide der. Di şanoyên wî de jî nêrîn û sîstema berê wekî nerast û xirab tîna nîşandin. <sup>158</sup>

Hem Erebe Şemo hem jî Maksîm Gorkî di zaroktiya xwe de berhemên wêjeya devkî hîn dibin. Pîr Cewo hevalê bavê Erebe Şemo bûye. Erebe Şemo dibêje: “Şevêd zivistanê dirêj dihate mala me, ber tendûrê rûdinişt, ji emrê xwe, dîtina xwe mera gilî dikir. Carinan jî mera çîrok digotin.” (Şivanê Kurmanca, r. 65.) Di cihekî di de jî dibêje: “Çimku cara kala wextê zivistanê mera gelle çîrok digotin û wan çîrokada giliyêd ussa tirs hebû.” (r. 86.) Heman tişt di Gorkî de jî derdikeve pêşiya me. Navbera Gorkî û dapîra wî Akulîna Îvanovna baş bûye. Dapîra wî jê re gelek çîrvanok gotine. Bapîrê wî carek jê re dibêje: “Dema ku wext tê guhdayîna çîrvanokan kêf kêfa te ye. Lê dem bê xwendina Zebûrê tu xwe didî alî.” (Zaroktiya Min, r. 91.) Maksîm Gorkî bi xwe jî dibêje: “Bapîrê min jî gelek çîrokên wiha ji min re qiset kiribûn.” (Di Nav Insanan De, r. 267.) Bandora zanîna wêjeya devkî xwe di behmenên her du nivîskaran de jî dide der. Zimanê wan ê vegotinê wekî yê berhemên

<sup>157</sup> Remezan Alan, “Bextewariya Îdeolojîk”, *kovara Pelîn: Kovara Bîr*, <http://www.kovarabir.com/2011/01/remezan-alan-bextewariya-ideolojik/>, 26.08.2015

<sup>158</sup> Behramoğlu, *Rus Edebiyatı Yazıları (Xix. ve Xx. Yüzyıllar)*, r. 162-164.

wêjeya devkî kurt û hêsan e. Em dibînin ku carinan her du nivîskar jî rasterast cih didin nimûneyên wêjeya devkî. Bi taybetî romana Gorkî *Di Nav Insanan De* ji aliyê stranên gelêrî ve dewlemend e.

Dema mirov bala xwe dide salên ciwaniya Şemo û Gorkî xuya dibe ku hinek cudahî hene. Erebe Şemo li gundan dijî û li derdora wî gundî hene. Komên xwenda û têgihîştî tunene. Tenê dema ku wergêrî dike ji bo artêşa rûsan hinek xwendeyan dibîne û bi riya wan hinek berhemman dixwîne. Ev berhem jî helbet ne di zimanê kurdî de bûne. Li ber destên Şemo paşxaneyê wêjeya kurdî tune bûye ku wê bixwîne û jê sûd bigire. Ligel vê Maksîm Gorkî çî ye ku li bajar bûye her dem kariye xwe bigihîne komên xwenda û kesên têgihîştî. Ji nêrînên van kesan û ji pirtûkxaneyên wan îstîfade kiriye. Beriya Gorkî wêjeya rûsî gihiştîye qonaxê bilind. Ji wêjeyên Ewropî bi taybetî ji fransî bo rûsî gelek berhem hatine wergerandin. Gorkî xwînerekî pak yê wêjeya fransî bûye. Jixwe tê zanîn ku di sedsala 19an de di qada wêjeyê de Fransa ji gelên di re mamostetî dikir. Gorkî bi xwendina nivîskarên rûs û derve yê beriya xwe kariye nivîskariya xwe bikemilîne.

Hem Erebe Şemo hem jî Maksîm Gorkî girîngî dane perwerdeyê. Her du nivîskaran jî hewl dane ku di perwerdekirina gel de cihê xwe bigirin. Erebe Şemo ji bo ku zarokên kurd hînî zimanê xwe bibin, ligel zanayên di dikeve nav xebatan. Yek ji van xebatên wî yê di vê çarçoveyê de ev e ku ew di sala 1928an de ji bo amadekirina alfabeya kurdî ligel Îsahak Maragûlov cih digire. Ev xebat bi navê “Xu Xu hînbûna xandina nvîsara kurmancî” derdiçe. Maksîm Gorkî jî di vî warî de helwesteke xurt nîşan dide. Ji bo zarokên gundî nivîstokên biwêne dide amadekirin û ji wan re dişîne. Erebe Şemo ji bo perwerdeya gel di saziyan de jî cih digire. Li Yêrîvanê dibistana gihandina mamosteyan ava dibe. Serokê yekem ê vê dibistanê Erebe Şemo bûye. Maksîm Gorkî jî girîngî dide gihandina ciwanan lewra jî di avakirina dibistana Kaprî de cih digire û ji bo xwendekarên ku ji Rûsyayê hatine waneyên dîroka wêjeya rûsî dide. Piştî Şoreşê jî xebatên xwe yê perwerdeyê sist nake. Ji bo zarokên bêkes û sêwî avahiyek vedike. Di vê avahiyê de pirtûkxane û piyano cih digirin. Zarok li vê derê tî perwerdekirin.

Dema ku em bala xwe didin naveroka berhemên Erebe Şemo û Maksîm Gorkî em dibînin ku wan li gorî dema xwe di hest û nêrînên xwe de bi baldarî cih

dane jinan. Her du nivîskar jî di mijara jinan de hesas in. Li hemberî jinan dilovan in û qiymetnas in. Erebe Şemo di berhemên xwe de pozîsyona jinan derxistiye pêş. Lehengên wî yên jin êdî wekî mêran dikarin bixwînin. Di romana *Hopo* de Zîne keçeke xwenda ye û dikare bê gundekî biyanî ji gundiyan re bibe mamosteya çandiniyê. Di ser de jî giregirên gund ên wekî Sertîp guh didin gotinên wê. Dîsa di heman romanê de Zelêxe guh nade edetên berê ku divê jineke jinebî ji nû ve bizewice. Ew naxwaze bizewice, dixwaze xwedî li kurê xwe yê biçûk derkeve û wî bide xwendin. Jin êdî nêrîn û daxwazên xwe ne li gorî civatê, li gorî rastiyên xwe tînin cih.

Dema ku em li naveroka berhemên Gorkî dinêrin em dibînin ku Gorkî wekî mêrên derdora xwe li jinan nanêre. Di serdema wî de jin gelek caran dihate biçûkxistin. Gorkî li hemberî vê rewşê baweriya xwe wiha tîne ziman: “Vê bîr neke: divê ji jinan re rêz bê girtin, yanê ji dayîkan re...” (Zaroktiya Min, r. 79.) Her dem li hemberî wan dilovan e. (Zaroktiya Min, r. 209.) Ber dilê wan digere. Di wê baweriyê de ye ku neheqî li wan tê kirin. (Di Nav Insanan De, r. 326.) Bala xwendevan dikêşe ser kar û barên wan ên zehmet. Gorkî di romanên xwe de bi taybetî li ser lêxistina jinan rawestiyaye û hewl daye nerastiya vê bi xwendevan bide hîskirin: “Bapîrê min wekî gurekî har xwe avête ser dapîra min. Serê wê da ber kulman. Dapîra min ne hewl dida xwe biparêze ne jî wî dûr bêxe. Wiha digot: -Dê lêxe, lêxe, tu yê ehmeq! Hêj bi hiştir lêxe, dewam bike!” (Zaroktiya Min, r. 185.)

Wisa xuyaye ku jin jî ji vê dilteniktiya Gorkî ya derheqê xwe de hesiyane. Lewra piştî Şoreşa Kewçêrê jinên orispî dixwazin ji xwe re sendîka ava bikin. Ji bo avakirina sendîkayê ji Gorkî arîkarî dixwazin.<sup>159</sup> Ev berketina her du nivîskaran dibe ku bi jiyana wan re têkildar be. Yekem mamosteya Erebe Şemo jin e û keça wê jinê ye. Şemo bi van her du jinan dest bi xwendinê dike. Di heman demê de beriya xwendinê mamosteya wî ya jiyane jî diya wî bû ku nasîna giyayan fêrî wî kiribû. Maksîm Gorkî jî di zaroktiya xwe de têkiliyeke xurt bi dapîra xwe re daniye. Dapîra wî jê re hem hevaltî hem jî rêbertî kiriye.

---

<sup>159</sup> Kurtuluş, *h.b.*, r.113.



Em dibînin ku her çiqas Erebe Şemo û Gorkî di zaroktî û ciwaniya xwe de zîrek bibin jî di navbera vê zîrekiya wan de cudahiyekek heye. Erebe Şemo ligel xwendinên xwe pir aktîf e. Di nav koman de û li gundan nêrinên xwe tîne ziman û hewl dide bi mirovan jî bide bawer kirin. Maksîm Gorkî ji aktîfbûnê bêhtir li ser xwendinê kûr bûye. Di nav kes û koman de ji axêver bêhtir guhdar e. Her gav di hişê wî de raman û guman hene. Ji aliyê hiş û derûniyê ve pirsgerêkan dijî. Wisa ku demekê qesta xwekuştinê dike. Bi gotina wî:

“Min li bazarê ji dahûlvaneke tebanecek girtibû ku çar şarjorê wê de çar berik hebûn, ji dewsa ku gule berdim dilê xwe min berdabû singê xwe û cîgerê xwe qul kiribû. Piştî mehekê pir xirab bibû, dîsa di firinê de dixebitîm û min xwe gelekî ehmeq hîs dikir.” (Zanîngehên Min, r. 102.)

Em di jiyana Erebe Şemo de tevliheviyeke bi vî rengî nabînin. Erebe Şemo ji xwe bawer her gav hewl daye ku ber xwe bide. Mirov dibêje ev cudahiya derûna her du nivîskaran bandor li berhemên wan yên wêjeyî kiriye. Lehengên Erebe Şemo di jiyana xwe de sade ne. Derd û xwestekên wan yên sofistîke tunene. Her hewl didin ji bo jiyane ber xwe bidin. Karê xwe baştir bikin. Ji hest û derûniya wan bêhtir tebatên wan yên derveyî berbiçav in. Di romana *Hopo* de Hesen û Zînê bi vî awayî ne. Ji evîn û hestên wan ên hundurîn zêdetir armanca xwendinê û xebata wan li pêş e. Armanca wan vegeftina nav kurmancan e. Nêrin û reftarên wan piçek bi rengê kesayetiya Şemo didin. Helbet ev yek bi nêrinên Erebe Şemo re têkildar e ku dixwaze lehengên îdealîze biafirîne. Lehengên Maksîm Gorkî komplekstir in. Em ji hest û derûniya wan haydar dibin. Em guman û têkçûnên lehengan dibînin. Ev yek jî rengê kesayetiya Gorkî dide. Dema ku em berhemên Erebe Şemo û Maksîm Gorkî didin berhev, em dibînin ku berhemên Erebe Şemo bêhtir îdealîzekirî ne û piştevaniya sîstema nû dikin. Erebe Şemo dema ku Bolşevîkan nas dike, dikeve nav refên wan. Di Şerê Navxweyî de li hemberî leşkerên çar şer dike. Piştî ku Bolşevîk li Rûsyayê dibin serdest û dewlet dikeve destê wan Erebe Şemo rasterast dibe endamê partiya Bolşevîkan. Di sala 1924an de di Komîteya Navendî ya Partiya Komînîst ya Ermenistanê de dest bi xebatê dike. Dema ku em bala xwe didin Maksîm Gorkî, her çiqas ew ji bo şoreşgeran û ji bo Partiyê xebitî be jî tu dem nebûye endamê partiyeke siyasî. Ligel vê gelek caran di navbera wî û ya Partiyê de alozî çêbûne. Heta ku

sedema mirina wî tam ne zelal e. Li gorî hinek agahiyan, ew bi destê partiyê hatiye kuştin.<sup>160</sup>

Mirov dikare hem di berhemên Erebe Şemo de hem jî yên Maksîm Gorkî de ji nêz ve gelê wan nivîskaran nas bike. Erebe Şemo di berhemên xwe de cih dide awayê jiyan û edetên gelê xwe. Ji gotin û biwêjên kurdî îstîfade dike. Bi heman awayî Maksîm Gorkî di berhemên xwe de cih dide biwêj û cure cure kesên gelê xwe. Di gelek cihan de ji nêzvenasîna gelê xwe tîne ziman. Wekî mînak dibêje: “mizmizokahiya rûsan”. Di pir cihan de dibêje “ruhê rûsîtiyê”. Ev awa pênasekirin îşaret e ku Gorkî taybetiyên gelê xwe raçav kiriye.

Mirov dibêje Erebe Şemo di berhemên xwe de cih nade mijar û rîtûelên dînî. Hestên dînî yên lehengên xwe aşkere nake. Ji malbateke şêxan tê, lê qala peywendiya xwe ya ligel dîn qise nake. Perwerdeya dînî dîtiye yan nedîtiye ji romana wî ya otobiyografîk dernakeve. Tenê carcaran rexne li peywirdarên dînî dike. Jixwe şanoya wî ya *Koçekê Derewîn* rasterast derheqê rexneya peywirdarên dînî de ye. Wisa xuyaye ku Şemo perwedeyeke dîn negirtiye. Lê Gorkî di vê hêlê de ji Şemo vediqede. Gorkî di biçûkahiya xwe de kêmbê jî çûye dêrê. Metnên dînî xwendine. Lê berevajî Şemo, Gorkî bi riya lehengên xwe têgihîştina xwe ya dînî jî derdixe holê. Wekî mînak, li ber çavên wî xwedayê dapîr û bapîrê wî yek nîne û xwedayên wan xwedî taybetiyên cuda ne. Ligel têgihîştina xwe ya dînî Gorkî di berhemên xwe de cih dide îlahiyan jî.

Di awayê vegotina berhemên xwe yên otobiyografîk de taybetiyeke hevpar a her du nivîskaran heye. Nivîskar dema ku behsa kesekî/ê di demên berê de dike, dizivire halê wî/ê yê piştî yan yê îro jî dibêje. Wekî mînak dema ku qala xebata xwe ya zaroktiyê dike, dibêje: “Xûşka min e Gogê –ya ku niha saxe, li Tîblîsê ser fabrika tutunê dixebite, –alî min fikir.” (Şivanê Kurmanca, r. 78.) Wisa xuyaye ku nivîskar vegotinê qut dike, tê de behsa dema niha dike. Heman taybetî di Gorkî de jî heye. Gorkî jî qala hevalemî xwe ya zaroktiyê wiha dike: “Ez û Pavel Odîntsov hevalên hev ên zehf qenc bûn. Piştî demekê bûye hosteyekî baş ê dîwaran, lê pir di ser re neboriye di salên xwe yên bîstî de xwe berda vexwarina meyê. Ji atolyeyê derket.

---

<sup>160</sup> Kurtuluş, *h.b.*, r. 130-131.

Piştire min ew li Moskowê li bazara Hîtrovê di halekî perîşan de dît.” (Di Nav Insanan De, r. 300.)

Ev cure vegotin di gelek cihên cuda de di berhemên otobiyografîk ên her du nivîskaran de jî tîn xuya dibin. Ev yek her çiqas herikîna vegotina berhemê sist bike jî berhemên wan yên otobiyografîk ji aliyê rastiye ve xurtir dike.

### **3.2. BANDORA SERDEMÊ, NASNAMEYA POPULER A GORKÎ Û BANDORA WÊ YA LI SER EREBÊ ŞEMO**

Piştî ku li Rûsyayê Bolşevîk dibin serdest pirsra erkê wêjeyê çî ye, ji bo Partiyê dibe pirsnişan. Her çiqas wekî gotara Lenîn a “Rêxistina Partiyê û Wêjeya Partiyê” hebin jî, ku di sala 1905an de di Novaya Zhîn de weşiyabû, li ser têgihîştina peywira wêjeyê nezaliyek hebû. Rewşenbîr û nivîskarên sosyalîst wisa bawer bûn ku divê wekî hemî çînan, çîna proleter jî bibe xwediyê çanda xwe. Çawa ku burjûvaziye li gorî jiyana û têgihîştina xwe ji xwe re çandek afirandibe, divê dewleta nû ya sosyalîst jî çanda proleteriyê ava bike. Di vê çarçoveyê de derdora Proletkultê ava bû. Kesên ku endamê Proletkultê bûn di wê baweriyê de bûn ku, dibe ku bi rêya wêjeyê jî gel bibe xwedî çanda proleter. Li gorî wan wêje dikariya gel ji bo sîstema nû perwerde bike. Lêbelê li gorî endamên Proletkultê wêje ne divê tam di bin bandora Partiyê bibe. Divê serbixweyiya wêjeyê jî hebe. Wisa dixuye ku Partî ji vê nêrîna derdorên Proletkultê aciz dibe û biryara belavkirina Proletkultê dide.

Piştî ku di sala 1920an de Proletkult hate tasfiyekirin, di sala 1921ê de NEP ava dibe. Wisa dixuye ku NEP jî tam li gorî siyaseta Partiyê tevnagere ku di dewsa wê de Yekitiya Nivîskarên Proleter (RAPP) ava dibe. Tê xuyan ku RAPP ji sedema têkçûna Proletkultê haydar e. Lewra li gorî RAPPê “Serdestiya Partiyê li ser wêjeyê” nebe nabe.<sup>161</sup> Ligel vê nêrîna xwe jî, diyar e ku RAPP jî tam li gorî biryarên siyasî yên Partiyê gavan navêje ku ber bi dawîbûna salên 1920î Partî tasfiyekirina RAPP pêk tîne û dikeve nav lêgerînan ka çawa nêrîneke wêjeyî pêk bîne ku rasterast bi nêrînen Partiyê re yekdest bibe.

---

<sup>161</sup> Kurtuluş, *h.b.*, r. 67.

Partî ji bo vê biryara xwe pêk bîne dikeve nav hewildanan. Diwxaze nêrîneke nû çêbike ku li hemû Rûsyayê rewa bibe û nîfşên nû jî li ser vê nêrînê rabin. Partî bo vê armanca xwe di sala 1928an de bangî Maksîm Gorkî dike da ku vegere welêt. Dema ku Gorkî vedigere welêt ji hêla Partiyê ve bi çöseke mezin tê pêşwazîkirin. Ji bo wî organîzasyonên mezin pêk tînin. Armanc ew e ku ber çavên gel wî wekî kesekî mînak û di hêla wêjeyê de rêber nîşan bidin. Maksîm Gorkî piştî vegerîna xwe di nav 4-5 salan de seranserê Rûsyayê digere, beşdarî konferansan dibe. Bi xwendevan û nivîskarên ciwan re dikeve nav diyalogê. Wisa xuyaye ku bi Erebe Şemo re jî di van deman de li rastî hev tîn.<sup>162</sup> Jixwe Gorkî her dem hewl dida ku têkiliya wî bi nivîskarên ciwan re hebe. Gelek nivîskarên ciwan berhemên xwe ji Gorkî re dişandin. Derbarê berhama xwe de ji Gorkî pêşniyaz û rexneyan dixwestin. Gorkî bersiva van hemû ciwanan dida û ji bo berhemên pêşîn yê gelek ciwan jî pêşgotin dinivîsand.<sup>163</sup> Tê dîtin ku Maksîm Gorkî xwedî populîteyeye mezin e û ev yek jî ser nivîskarên ciwan bandoreke aşkere dike. Yek ji van ciwanan jî Erebe Şemo ye. Lewra Şemo jî berhema xwe *Şivanê Kurmanca* pêşkeşî wî dike. Çawa ku me li jorê got, ciwanan dixwestin hîn bibin ka gelo Gorkî dê derbarê berhema wan de çi bibêje. Bêguman nivîskarên ciwan didan ser şopa Gorkî û di bin bandora wî de diman, wan dixwezin bi Gorkî re bikevin têkiliyê.

Di vê navberê de navê realîzma sosyalîst jî hêdî hêdî di weşanan de xwe da der. Cara yekem navê realîzma sosyalîst di 23yê Gulana 1932yan de di weşana nivîskî de derdikeve. Piştî jî roj bi roj ev nêrîna wêjeyî di nav rewşenbîr û nivîskaran de belav dibe. Dema ku Partî rêverberiya dewletê bi dest dixwe, her hewl dide ku kar û barên wêjeyî bi nêrîna siyasî ya Partiyê re hemaheng bike. Bi seranserê deheya 1920î Partî ser saziyên nivîskaran vê helwesta xwe didomîne. Dema ku di sala 1928an de Yekem Plansaziya Pêşketinê tê pejirandin, tê xwestin ku wêje jî di vê maweyê de peywira xwe hilde. Di vê çarçoveyê de di 19ê Gulana 1932an de Yekitiya Nivîskarên Sovyetê ava dibe. Di avabûna vê saziyê de armanc ew e hemû nivîskarên Sovyetê di bin banê heman saziyê de bin û ev sazî jî dibin hikmê Partiyê de be.

<sup>162</sup> Eskerê Boyîk, *h.g.*, r. 21.

<sup>163</sup> Kurtuluş, *h.b.*, r. 113.

Helbet aşkereye ku kesekî wekî Erebe Şemo ku di nav saziyên siyasî yê Partiyê de cih girtibe, di afirandinên xwe yê wêjeyî de dê beşdarî nerîna serdemê bibe ku ew jî ji aliyê Partiyê ve tê diyarkirin. Erebe Şemo jî wekî nivîskarên serdema xwe nêrîna serdemê ya wêjeyî pejirandiyê ku ev nêrîn wekî realîzma sosyalîst tê binavkirin.<sup>164</sup> Realîzma Sosyalîst di 20ê Tebaxa 1934an de di Yekem Kongreya Rêxistina Nivîskarên Sovyetê de wekî rêbaza rêxistinê hatiye qebûlkirin. Serokatiya vê kongreyê jî Maksîm Gorkî kiriye. Ev yek jî dide der ku Gorkî xwediyê nêrîna realîzma sosyalîst e. Jixwe di axaftina xwe ya kongreyê de dike, qala realîzma sosyalîst dike û dibêje ev nêrîn bi me dide zanîn ku jiyan afirandinek e.<sup>165</sup> Dixuye ku ev nêrîna ku Gorkî dibêje, wêje afirandinek e, yekcar bi polîtîkayên dewletê re têkildar e. Di Yekem Plansaziya Pêşketinê de hatibû gotin ku divê dewlet ji aliyê çandinî û sanayî ve bê pêşxistin. Gelê nexwenda bê perwerdekirin. Di çarçoveya vê biryarê de di gundan de “kolxoz” tên avakirin. Gundî di kolxozan de tên rêxistinkirin. Erd ji bo çandiniyê tên vekirin. Ji bo avdaniyê av ji bo zeviyan tên kêşan. Em dibînin ku di berhemên van salan ev kar û biryarên dewletê pêjna xwe nîşan didin. Dema ku em bala xwe didin berhemên Erebe Şemo jî em dibînin ku Erebe Şemo jî cih daye van armanc û biryarên Partiyê. Bi taybetî di romana *Hopo* de nimûneyên van biryaran berbiçav in. Edî xortên kurdan, di romanê de Hesên û Zîn, diçin dixwîn. Di gund de kolxoz tê avakirin. Ji bo çandiniyê zevî tên vekirin. Ji gund û zeviyan re av tê kêşan...

### 3.3. BERAWIRDKIRINA HIN ŞOPÊN NAVEROKÎ

#### 3.3.1. Perwerde

Erebe Şemo li gorî serdema xwe û rewşa malbata xwe bisiûd e ku xwendinê hîn dibe. Li gorî amarê heyî di çaryeka yekem a sedsala 20an ji % 90ê kurmancan nexwenda bûne.<sup>166</sup> Tê zanîn ku di wan salan de piraniya kurmancên xwenda zarokên malbatên dewlemed yan jî zarokên serokeşîran bûn. Malbata Şemo pir xizan bûye. Di wan deman de ne pêkan bû ku malbatek xizan zarokên xwe bida xwendin. Jixwe xwendin bi peretî bûye. Mamosteyê wî dibêje ku ew bê pere ders dide Şemo. (Şivanê Kurmanca, r. 89.) Erebe Şemo di dibistaneke rûsan de wekî xedeme dest bi xebatê

<sup>164</sup> Bavê Nazê, *h.g.*, r. 32.

<sup>165</sup> Maksîm Gorkî, *Edebiyat Yaşamım*, r. 262.

<sup>166</sup> Pirbal, *Shadow of The Lion The History of a Cultural Millenium*, r. 118.

dike. Mamosteyê dibistanê wî hildide pola xwe û wî hînî xwendinê dike. Erebê Şemo hem xedemetiya dibistanê dike hem jî xwendekariya xwe didomîne. Navbera wî û keça mamoste, Marûsya, pir baş e. Marûsya jî di xwendinê de arîkariya Şemo dike. Mamosteya wî dema dibîne ku ew hînî xwendinê dibe, cesaret didê. Di romanê de diyalogeke wiha cih digire:

“Rojekê Marûsiyê ji min pirsî:

-Tu vê kitêba tezeda qe çi hîn bûy, -û seyfeke pêşîn vekir, da min, wekî ez bixunim.

Min zûzûka xwand. Marûsiya revî, çû cem diya xwe gotêda:

-Were binêre Ereb Şamîlov van du rojada çi zû dixûne.

Dê hate cem min, careke dinê ew cîyê ku min xwendibûn, da min, min xwand. Destê xwe li piştê min xist got:

-Eferîn, tu yê zû hînî xwandinê bî.

Ji wan paya ez soro-moro bûm, ji eşqa hêsir ji çavê min hatin, hindik mabû ez bigrîyama. Eşqa xwandinê ussa dilê minda hebû, wekî gav sihet fikra min ew bû.”

(Şivanê Kurmanca, r. 89-90.)

Tê dîtîn ku Şemo derfeta xwendina xwe piştguh nekiriye. Berevajî hem bîaqil e hem jî bi dilûeşq xwe daye hînbûna xwendinê. Her çiqas karûbarê hemî dibistanê ser piştê wî bibin jî û her çiqas zarokên rûsan di polê de çi ye ku ew xizan e zordarî li wî kiribin û lê xistibin jî wî dev ji xwendina xwe bernedaye. Ev yek bi me dide zanîn ku Şemo heqê xwendina xwe daye. Car bi car qut bibe jî perwedehiya xwe didomîne û zanîngehê jî kuta dike.

Maksîm Gorkî di malbateke bajarî de hatiye dinê. Em dikarin bibêjin ku hema hemû kilfetên malbatê xwenda bûne. Di malbatê de Gorkî ji gelek kesan ders girtiye. Ev dersên pêşîn derbarê zanînen dîni de bûne. Piştî çend rojan bi hatina wî ya Nijniyê, bapîrê wî dest bi hînkirina duayan dike. Jinxala wî Natalya dersên dîni hînî wî kiriye. Gorkî yekem car dersên xwendinê ji bapîrê xwe girtiye.

“Bapîrê min ji nişkê ve, her ji ku dîtibe, pirtûkeke nû hilgirt destê xwe. Bi nava lepên destê xwe li pirtûkê xist û bangî min kir:

-Were li vir, zarokê nehewayî! Li rexê min rûne. Tu zanî ev îşaret çi ye? Ev ‘A’ ye. Bibêje A...B...V... Ev çi ye? ‘B’. Baş e! Lê ev? ‘V’. Di ber xwe de diaxivî,

ev ‘A’ ye! Bala xwe bide, ev çi ye? ‘D’. Baş e, te zanî! Lê ev? ‘G’. Aferîn. Lê ev? ‘A’. (Zaroktiya Min, r. 87.)”

Gorkî di malbatê de ji diya xwe jî ders girtiye: “Piştî çend rojek, diya min ji bo min dersên xwendin û nivîsandinê da destpêkirin. Ji min re pirtûk kirîn. Navê pirtûkeke min *Makezimanê Me* bû”. (Zaroktiya Min, r. 179.) Gorkî ligel perwerdehiya xwe ya malê çûye dibistanê jî. Lê tu dem dilê wî li dibistanê germ nebûye: “Di derba yekem de kêfa min ji dibistanê re nehat.” (Zaroktiya Min, r. 200.) Piştî yekcar dilê wî lê sar dibe: “A rastî, hêj di roja pêşîn de min ji dibistanê nefret kir.” (Zaroktiya Min, r. 241) Gorkî jî wekî Şemo di ber dibistana xwe de kar jî dike:

“Di wê navberê de min ji dest bi perê qazanckirinê kiribû: rojên bazaran hêj siba zû min torbeyek diavête piştî xwe, ez li kolan û hewşan digeriyam. Min hestî, çatikên kevin, parçeyên kaxizan, bizmaran kom dikirin. Kesên ku van tiştan dikirîn ji bo pundeke çatikên xirab û kaxizan bîst kapîk didan; hesin jî bi heman bihayê bû. Ji bo hestiyar hejdeh kapîk didan. Min di nava heftiyê de jî piştî dibistanê ev kar dikir.” (Zaroktiya Min, r. 253.)

Zarokên polê çawa ku bi xizaniya Şemo dikenin, heman awayê zarokên hevpolê Gorkî jî bi wî dikenin: “Li dibistanê pirsgirêkên min dîsa dest pê kiribûn. Zarokan wekî ku ez parsek im, tiştan dicevînim henekên xwe li min dikirin.” (Zaroktiya Min, r. 264.) Çawa ku kes naxweze ligel Şemo li ser heman maseyê rûne, tu kes Gorkî jî qebûl nake: “Rojek piştî şerê me ji mamoste re derheqê min de gotin ku bêhna çala ava firaxan jê tê. Lewra em nikarin li ba wî rûnin. Tê bîra min vê gotina wan çawa ez rencîde kirim û piştî çûna dibistanê ji bo min çiqas zor bû.” (Zaroktiya Min, r. 264.)

Tê dîtîn ku hestên Şemo û Gorkî derheqê dibistanê de wekî hev nînin. Şemo çi ye ku derfet dîtiye û çûye dibistanê xwe bi siûd hîs dike. Gelek kêfa Şemo ji dibistanê re tê, lê berevajî Gorkî ji dibistanê hez nake. Jixwe piştî sê salan nikare xwendina xwe bidomîne û dev ji xwendinê berdide. Lê her du jî di dibistanê de serkeftî ne. Şemo çi ye ku di xwendinê de serkeftî ye mamosteya wî pesnê wî dide. Pirtûk diyariyî wî dike. Bi heman awayî Gorkî piştî sê salan ji mamosteyê xwe belgeya serfiraziyê û hinek pirtûkên diyarî distîne. Dîsa hem Şemo hem jî Gorkî di

demên xwendinê de ji aliyê aboriyê ve zorî kêşane. Her duyan hem pere qazanc kirine hem jî hewl dane bixwînin.

Şemo her çend zorî kêşandibe jî kariye heya zanîngehê jî bixwîne. Lê Maksîm Gorkî wekî Şemo bi şans nebûye. Piştî sê salên pêşîn nekariye xwendina xwe bidomîne. Lewra piştî salan çavnebariya xwendekarên lîseyê dike: “Dema ku min guh dida hevalên xwe, min xwe ji wan azadtir hîs dikir û ez ji sebra wan heyirî dimam lê dîsa jî min çavnebariya wan dikir, lewra ew diçûne dibistanê.” (Di Nav Insanan De, r. 338.) Gorkî gelekî dil kiriye ku zanîngehê bixwîne. Ji bo vê yekê heta bajarê Kazanê diçe. Lê her çend dest bi zanîngehê dike jî nagîhije mirazê xwe. Hestên xwe yên xwendina zanîngeh wiha tîne ziman:

“Min wisa hizir dikir ku ji bo bigihîjim şadiya xwendina zanîngehê ez dikarim hedara îşkenceyê jî bikim. Eger pêşniyazeke wiha ji min re bikirina: ‘Here, zanîngehê bixwîne, lê bi yek mercê, em ê her roja bazarê li Meydana Nîkolayevskayayê bi daran li te bidin!’ teqez min ê qebûl bikira...” (Zanîngehên Min, r. 100.)

### 3.3.2. Xebat

Di hevoka yekem ya *Şivanê Kurmanca* de tê gotin ku bavê Erebe Şemo xizanek e. Ev hevok îşareta serboriyên zor û zehmet e ku di çend beşên pêşî yên romanê de dê bên qalkirin. Şemo hêj di temenên xwe yên biçûk de dest bi xebatê dike. Xebata wî ji dûajotiyê dest pê dike û bi golikvanî, xulamtî, xedemetî, wergêriyê heta karkeriya riya trêne didome. Şemo di gund de hatiye dinê lewra jî karên wî yên pêşîn, karên gundîniyê bûne. Di cihekî de wiha qala karê xwe yê xulamtiyê dike:

“Xebata mine nehêsa bû. Gerekê ez sibê-şebeqê rabûma, tewle paqîş kira, rêxa dêwêr têkira, (sankê) xirekê bibra, piş tewlêda lod kira; paşê afirê dêwêr rind temiz kira, bin cîyê wan peyn û kurçom lê bireşanda, wekî cîyê wanî zuha biya, alifê dêwêr bidayê, ya lape çetin ew bû, wekî min alûrke ji kapeka êr û kayê gara û hespara çêkira. Wexta min nedigihîştê, wekî ew hezîmêta terikî: kapek, ka û av bi dara pak li hev xista. Dizî axê xwe ez diketime afirêd mezine bilind, min bi desta ew alûrke li hev dixist. Eva xebata tev gerekê min nîvê şevê yan berî berbangê sibê bikira, kuta bikira.” (Şivanê Kurmanca, r. 76.)



Bi rêka xebata xwe Şemo nav gelan digere û zimanê wan hîn dibe. Hînî jiyane dibe. Bi gelek kesan re hevnas dibe. Lê xebata wî ya di dibistanê de û ya çêkirina riya trêne de ji bo kemilîna kesayetiya Şemo pir girîng e. Eger em ji xwe bipirsîn çî taybetiyê Şemo hebûn ku wî wiha di nav civakê de bi pêş xistin û kir xwedî qiymet? Helbet dibe ku gelek bersiv ji bo vê pirsê bêne dayîn. Lê li gorî me ji van çend heb pirr sereke ne: Şemo xwenda bû, gelek ziman dizanî û kete nav refên Bolşevîkan. Bêguman çavkaniya van hemû taybetiyên wî jî baqiltî û jîrtiya wî bû. Lê wisa xuyaye ku her xebata wî bûye sedem ku Şemo kemilîna kesayetiya xwe pêk bîne. Eger di nav gelên curbicur de nexebitiya dê zimanê wan gelan nizanibûya. Eger di dibistanê de xedemetî nekira dê xwendinê hîn nebûya. Eger di riya trêne de nexebitiya dê fikrên Bolşevîkan nas nekiriya û neketiya nav refên wan.

Em ji jiyannameya Şemo pê dihesin ku xebata wî ji wî re bûye dibistan û ew her bi pêş ve biriye. Hinek deman ji kesên nexwenda û xizan tê bihîstin ku mecbûr mane bixebitin lewra jî derfeta wan çênebûye bixwînin û xwe bikemilînin. Em dibînin ku xebata Şemo jê re nebûye asteng, berevajî rê li ber vekiriye ku xwe bikemilîne.

Maksîm Gorkî jî wekî Erebe Şemo hêj di temenên xwe yê biçûk de mecbûr dimîne dest bi xebatê bike. Her çend malbata Gorkî bi qasî malbata Şemo xizan nebe jî ewqas bobelat tî serê malbatê -mirina dê û bavê wî, cudabûna xalên wî ji bapîrê wî- ku dawîya dawî ew gelek xizan dibin. Gorkî jî wekî Şemo di gelek karên curbicur de dixebite. Ji kolanan kevnetîştên xelkê kom dike, di malan de wekî Şemo xulamtiya malê dike, di keştiyan de firaxan dişo, di firinan de dibe nanpêj... Gorkî jî wekî Şemo di van karan de gelekî zehmetî dibîne. Wekî Şemo, Gorkî jî qala xulamtiya xwe ya malê dike:

“Karê min gelek bûn: wekî xizmetkarê odê dixebitîm, rojên çarşeman min erdên aşpêjxanê dişuştin, min firaxên sifir û semawer paqij dikirin, min rojên şemiyên hemû erdên xanî û her du merdiwan dişuştin. Min ji bo sobeyan dar hûr dikir û dikêşa malê, firax dişuştin, hişnahî dişuştin, ez ligel xanima malê diçûm bazarê û min tiştên kirî di selikê de dikêşa, ez wirda virda diçûme beqal meqalan û dermanfiroşan.” (Di Nav Insanan De, r. 74.)

Çawa ku xebata Şemo ji bo kemilîna Şemo nabe asteng, beravajî rê li ber wî vedike ku ji aliyê behre û zanîne ve xwe bi pêş dixê, bi heman awayî xebata Gorkî jî derfet daye wî ku insanan ji nêz ve nas bike û ji van insanan sûd werbigire. Ew van insanan ji xwe re wekî mamoste wekî fêrgeh dibîne. Jixwe watedar e ku navê du pirtûkên xwe wiha nav kiriye : *Di Nav Insanan De û Zanîngehê Min*.<sup>167</sup> Dema ku em van her du berhemên wî dixwînin, em dibînin ku ew kesên derdora xwe wekî mamoste û zanîngeh dibîne. Her hewl dide ji wan tiştan hîn bibe:

“Min wisa bawer dikir ku ew ji hemû kesên ku min nas kiriye baqiltir e. Çawa ku ez derdora Yakovê qazanvêxer digeriyam wisa jî bi kelecânî derdora wî jî digeriyam. Min dixwest wî binasim, fêr bikim lê min nedikarî nêzê wî bibim, ji destên min difilitî diçû. Raza wî çi bû? Divê min bawerîya xwe ji kîjan gotina wî bianiya?” (Di Nav Insanan De, r. 369.)

### 3.3.3. Çalakiyên Siyasî

Xebatkarên siyasî di wan salan de piranî bi çêkirina riya trêne re mijûl dibûn. Erebê Şemo jî diçe Sarîqamişê bo ku di riya trêne de bixebite. Li wî derê xebatkarên ku ji Moskovê hatine jî hene. Ev xebatkar Bolşevîk in û di nav karkeran de nêrînen Bolşevîzmê belav dikin. Dema ku ew kes dibînin Şemo gelek zimanan dizane û zîrek e, wî dikêşin nav refên xwe. Şemo guh dide nêrînen wan. Ji wan pirtûk û belavokan digire û wan dixwîne. Piştî ew jî van nêrînan di nav karkeran de belav dike. Bi gotina wî:

“Ew cara teze bibû, wekî ez gihîştîme xebatçiyê înglabkar. Gava ku wana gazî min dikirin, ez dibirme nava xwe, sed carî temî didane min, wekî ez kesekîra nebêjim, yêkî jî wana digote min, -ez herim palara kurmanca, tirkara û yê mayîna bêjim, wekî pak xebitin, dawa rojheqê zêdekirinê bikin. Min jî giliyê wan diqedand, diçû, tevra dizîkava digot. Lê kurmanca û milletêd mayîna ew gilî zaf qebûl dikirin û daw dîwanê dikirin.” (Şivanê Kurmanca, r. 145.)

Tê dîtin ku Şemo bûye alîgirê Bolşevîkan û bi awayekî aktîf ji bo nêrînen wan dixebite. Ji ber vê xebata xwe jî ew tê girtin û qasî du mehan di zindanê de

---

<sup>167</sup> Çawa ku me berê jî diyar kir, Gorkî her çend xwestibe jî nekariye biçê zanîngehê. Lê di wê baweriyê de ye ku ji insan, tişt û mekanan gelek tişt hîn dibe. Lewra her yek ji wan ku tiştê hînî wî kiriye, wî wekî zanîngeh ji xwe re pejirandiye.

dimîne. Erebê Şemo ne tenê propagandaya nêrînên Bolşevîkan kiriye. Ew dibe partîzanê Bolşevîkan jî. Bi gotina wî: “Ne ez jî firqecî me”. (Şivanê Kurmanca, r. 168.) Ligel vê, dema ku Şerê Navxweyî dest pê dike Şemo beşdarî refên leşkerî yên Bolşevîkan dibe û li hemberî Artêşa Çar şer dike, birîndar dikeve. Bûyer ji devê wî wiha tê vegotin:

“Kornîlov berê xwe dabû Kûbanê, dihat xwe digihande qazaxê Kûbanê. Hinda şehere Krasnodarê, -ew şehere merkeza Kûbanê bû, -Kornîlov kuştin. Me eskerê wî ji hev bela kir. Wî şerîda ez hatme birînadrkirinê. Gulle li ranê min ketibû, birîne cîkî bê fesal bû, ez nikaribûm pê re biçûma.” (Şivanê Kurmanca, r. 174.)

Di ciwaniya Gorkî de jî refên çepgir û mûxalîfên sîstemê hebûne. Ev kes piranî derdorên xwendekar û xebatkarên xizan bûne. Gorkî jî wekî Şemo nêzî van koman bûye û ketiye nav refên wan:

“Di mala Derenkovê de wiha bi dehan kes diciviyên. Di nava wan de xwendekarekî Japon ê Akademiya Îlahiyatê bi navê Panteleymon Sato jî cih digirt... Her kes bi dengê bilind, ji xwe bawer û bi biryar diaxivî.. Deng çiqas bilind be, bêguman, kêfa min ew qas pê dihat. Demeke dirêj min ferq nekir ku di bin dengê bilind de nêrînên kêrnehatî, durû tîn veşartin.” (Zanîngehên Min, r. 40.)

Maksîm Gorkî jî wekî Şemo di navbera hevalên şoreşger de qasidiyê dike: “Ev peywira razdar pir xweşa min çûbû. Bi leza hehecîkekî ez firiyam gundê Admîralteyskayayê... Ez bi şanaziya pêkanîna peywirê zivirîm malê. Di karên ‘veşartî’ de peywira min a yekem ev bû.” (Zanîngehên Min, r. 27.) Her çend Gorkî di ciwaniya xwe de wekî Şemo nehatibe girtin jî hevalên derdora wî tîn girtin: “Polîs dema singê xwe yê pîrpirç dixurand bi awayekî melhezeyî li min dinêrî. Got ‘Erê wisa’. ‘Wî girtin. Di oda wî de qazaneke boyaxê dîtine. Wisa xuyaye armanca wî ew bûye ku li dijî dewletê nivîsan amade bike.” (Zanîngehên Min, r. 86.)

### **3.3.4. Xizaniya Nivîskaran**

Dema ku em *Şivanê Kurmanca* û sêbareyên Maksîm Gorkî dixwînin, em dibînin ku di gelek cihan de xizaniya malbatê bi awayekî trajîk derdikeve ber me. Ji ber vê xizaniya malbatên xwe her du nivîskaran jî birçîtî kêşaye. Ev birçîtiya wan bêguman ne birçîtiyeke navbera du danan e. Nivîskar ewqas di nav tunetiyê de ne ku

nikarin pêwîstiyêke bingehîn a debara xwe dabîn bikin. Qala vê birçîtiyê di gelek cihên romanê de tê dîtin. Ka ji mirov e, nivîskaran xwestine vê rewşa xwe bi baldarî nîşanî xwendevan bidin. Şemo bi van gotinên xwe gotina me tesdîq dike: “Çimku halê gavanê kurmanca ussa pîse fikira wî her ser wêderêye, çika kengê zikekî têr nan bixwe. Lê bihara 1917-da, idî ew parîyê nan nebû fikra min e eseyî, min fikir dikir çewa xebatê rind bibin.” (Şivanê Kurmanca, r. 148.)

Dixuye ku pariyekî nanê zûwa her di bîra nivîskar de bûye. Dem hatiye ev parî jî neketiye destê Şemo: “Birçîbûnê zor dida min, min nizanbû çewa bikira, pincar jî qe dest nediket.” (Şivanê Kurmanca, r. 124.), “Wexta pincara çolê idî pîr dibû, halê me, rênçberê çolê hinekî xirab dibû, tişte tunne bû –me pê nanê xwe bixara; em timê birçî dibûn. Ew birçîbûna me dikşand, hetta genimê zevîya digîhişt.” (Şivanê Kurmanca, r. 67.), “Lê dîsa xema min nînbû alîyê birçîbûnê, çimku gelle rojêd ussa birçî min derbaz kiribû.” (Şivanê Kurmanca, r. 72.) Yan jî car hatiye Şemo ji bo ku zikê xwe têr bike dizîtî kiriye: “Wekî me kartol dixwast û wana kartol nedida me, me li çolê kartolê bostana didizî, xwera dipat.” (Şivanê Kurmanca, r. 68.)

Wekî Şemo Gorkî jî her pê nanê xwe bûye. Çawa ku me berê jî gotibû malbata Gorkî bi qasî ya Şemo xizan nîne. Lewra bi qasî birçîtiyêke Şemo nekêşaye. Lê cih hatiye Gorkî jî ji bo ku pereyekî pir kêr bikeve destên wî bo ku zikê xwe têr bike, wî jî wekî Şemo dizîtî kiriye:

“Em hemî xwediyên benan bûn. Li serê wan bizmarên tûj û stûr hebûn. Me bizmar dikuta depan yan jî kêranan û me ew li ser cemedê, berfê kaş dikirin. Hema bibêjin nobedaran tu dem em ferq nedikirin. Ferq bikirina jî nedikarîn me bigirin. Tiştên ku me dibir me difirost û dikir şeş par. Serî hevalê pênc yan jî şeş kapîk dima. Bi vî pereyî me dikariya em rojekî zikê xwe têr bikin.” (Zaroktiya Min, r. 256.)

Dem tê malbata Gorkî ji ber xizaniyê kilfetên malê parsekiyê dikan. Hem dapîr hem jî bapîrê wî mecbûr dimînin ku ji xelqê alîkariyê bixwazin. Bapîrê wî dibîne roj bi roj destê wan de tişte namîne, dibêje: “Em ê feqîr biçin milê dî, feqîr!” (Zaroktiya Min, r. 175.) Dapîra wî wiha bersiva bapîrê wî dide: “Ka lê binêrin tîrsa te ji çi ye! Waa, tu ji parsekiyê ditirsî! Eger em parsekiyê bikin, em bikin, ka çi bûye!”

Tu yê li malê rûnî, ez ê biçim parsekiyê. Bawer im dê tişteke bidin me, em birçî namînin!” (Zaroktiya Min, r. 175.)

### 3.3.5. Di Romanan de Nimûneyên Zargotinê

Carinan hinek metin ji berhemên dî yan jî cureyên metnên dî tî honandin. Ev yek jî metnê dike navmetnî. Erebe Şemo di honandina *Şivanê Kurmanca* de cih daye stran û destanan. Vê yekê jî *Şivanê Kurmanca* kiriye metneke navmetnî. Di *Şivanê Kurmanca* de ev stran û destan rasterast hatine girtin. Di romana *Şivanê Kurmanca* de 2 stran û destanek cih digire. Strana yekem di bin banê beşa “Merkeba me. Rêncberiya nava melegana” de cih girtiye. Ev stran aîdê rûsan e û dînî ye. Angaşt dike ku riya wan heq e û yê ku nadin riya wan di nav şaşitiyê de ne:

“Şherekî rindî mezin  
Li ser çemê Feratê.  
Em xapandin wî ‘etlawî’,  
Çavê wan jî kor bû.  
Merîyêd biçûk diçe rast  
Lê aliyê çepê tev bi kom.” (Şivanê Kurmanca, r. 63.)

Erebê Şemo qala cemeetên gundê Alêksandrovske dike. Wisa dixuye ku armanca wî ew e ku bibêje ev her du cemeet îddia dikin ku riya wan heq e û dînê wan ser rastiye ye. Lê Şemo dibîne ku gotinên wan kirinên wan ji hev nagirin. Lewra endamên van her du cemeetan jî gelek zordarî li pale û xulamên xwe dikin. Wan herwe didin xebatê. Ji bo Şemo ew girîng e ku bibêje ev mirov durû ne. Gava ku behsa vê rewşa wan dike cih dide strana wan a duayî. Lewra ev cih dayîn ji aliyê honandinê ve di cih de dixuye.

Strana duyem di destana Siyabend û Xecê de dibore. Ev stran ji devê Xecê tê gotin. Dema ku Siyabend ji aliyê gakovî ve tê birîndarkirin Xecê û Siyabend nerazîbûna xwe tînin zimên:

“Xecê vira dest bi kilama kir, got:  
Serê çiyayê Sîpanê-Xelatê wê bi mije,  
Binê çiyayê Sîpanê-Xelatê wê bi mije.  
Kê dîtiye, kê bînaye,

Wekî nêçîr-nêçîrvan bikuje?  
 Gakûvîyo, te stru dirêje weke bejna mino,  
 Çewa te ji hev kir destê jin û mêro?  
 Stru drêje weke dara sûkê  
 Çewa te xirab kir bextê xort û bûkê?  
 Siyabend got:  
 Xecê, Xeca mine delal,  
 Çewa nebû mirazê min te,  
 Meyê xwera serê Sîpanê-Xelatê,  
 Çêkira konekî rindî delal  
 Xecê, meke melûbîne,  
 Hêsira ser sûretê sorda mebarîne..” (Şivanê Kurmanca r, r. 137-138.)

Ev stran di nav destana Siyabend û Xecê de dibore. Şemo di bin beşa “Li welatê Romêda. Klama Siyabendê Silêvîn û Xedcê” cih daye vê destanê. Erebe Şemo dema ku wekî wergêr di Artêşa Rûsan de ber bi Çiyayê Sîpanê ve diçe ev destan tê bîra wî û di beşa navborî de cih dide vê destanê. Ev destan ji paragrafa dawî ya rûpela 135an dest pê dike heta rûpela 138an didome. Strana ku di nav destanê de cih digire ji aliyê honandinê ve di cih de ye. Lewra di destanê de her du evîndar nagihin mirazê xwe û di ser de jî gakovî Siyabend ji terazin davêje birîndar dike. Xecê wî di binê terazinê de birîndar dibîne. Di rewşeke wisa de straneke wiha ku hestên wan der dike, li honandina metna destanê tê. Lê di romanê de ev destan bê peywend dixuye. Diyar e ku Erebe Şemo xwedî zanîna destan û stranên kurdî ye. Ji devê lehengekî/ê nayê vegotin ku Şemo pê re di nav têkiliyê de bibe. Destan bi pêş û paşê xwe re bestî nîne. Wekî giraveke ji parzemînê qutbûyî, destana li vî derî jî ji metnê qut maye. Lê dibe ku armanca Şemo ew be ku ji xwendevan re bibêje, hûn dibînin berê çawa neheqî li mirovan dihat. Edetên çawa ne rast hebûne.

Wekî Erebe Şemo Maksîm Gorkî jî di her sê romanên xwe de rasterast cih daye stran, dua û çîrçîrokan. Em dibînin ku Gorkî li gorî Şemo gelekî pirtir cih daye van cureyan. Jixwe di beşa duyem de hatibû gotin ku Gorkî zehf ji çîrçîrokan hez dike. Di zaroktiya xwe de çawa ku ji çîrokan hez kiriye, di ciwaniya xwe de heman awayî ji stranên gelêrî hez kiriye. Bi baldarî ketiye pê stranbêjan û guh daye stranên wan:

“Min xweziya xwe bi wî mêtî dianî, min gelekî çavnebariya behreya wî, serdestiya wî ya ser mirovan dikir; bê hed ji vê serdestiya xwe sîd werdigirt! Min dixwest bi vî zînkê re hevnas bibim, dixwest pê re dîrûdirêj tiştan biaxivim; lê min nediwêrî biçime ba wî... Kleşkov bi çavên xwe yên spîlok wisa ecêb li kesên li hemberî xwe dinêhîrt, ka ji mirov e kes li beriya wî tune. Di ser de jî tişteke dî hebû ku ji min re dibû manî ku ji wî hez nekim. Lê min nedixwest tenê demên ku wî stran digot ji wî hez bikim” (Di Nav Insanan De, r. 292-293.)

Gorkî di berhemên xwe de cih daye bi dehan stran. Ev stran geh tê ji devê dapîra wî geh tê ji devê xebatkarekî û geh jî tê ji devê stranbêjekî wekî Kleşkovê dertê. Di mal de xalê Gorkî Yakov jî stranbêj bûye. Dema ku stranên xwe dibêje li gîtarê jî dixê. Vê yekî gelekî bala Gorkî kêşaye û cih daye gelek stranên wî. Yek ji wan:

“Xweziya seyek bûya Yakov,  
Şevan heya sibeyan bireya Yakov:  
Ax, bêhteng im ez!  
Ax, hestiyar im ez!  
Ji kolanê rahîbeyek dibore;  
Qijikek li sincê vedaye,  
Ax, bêhteng im ez!  
Li pişt sobeyê kêzîkek dîke çîreçîr,  
Kêzîkên navmalê ji xwe aciz in,  
Ax, bêhteng im ez!  
Parsekek goreyê xwe ji bo ziwa be aliqandiye,  
Parsekekî dî goreyên wî dizîne!  
Ax, bêhteng im ez!  
Ax, hestiyar im ez!” (Zaroktiya Min, r. 47.)

Di her sê romanên Gorkî de bi vî awayî dehan stran hene. Bi taybetî romana wî ya *Zaroktiya Min* bi mînakên stran, dua û çîrçîrokan tijî ye. Gorkî wekî Şemo car tê cih dide duayan jî.

Di romana xwe de Erebe Şemo cih dabû çîroka gelêrî Siyabend û Xecê. Em dibînin ku di romanên Gorkî de jî gelek çîrokên gelêrî diborin:

“Demekê bi navê Gordîon şervanekî xayîn hebû,  
 Ruhê wî wekî pizotê, wicdana wî mîna hesinê,  
 Rastiyan nedidît, zilmê li gel dikir,  
 Wekî çûka kukumav çawa ku di kunekê de dijiya , ew jî di kunekê de dijiya.  
 Bêhtirîn ji xalê xalvetnişîn Mîronê,  
 Piştevanê rastiya zelal,  
 Piştevanê dinyayeke bêtirs, zelal  
 Nefret dikir Gordîon.  
 Bangî servanê xwe yê sadîq, şervanê qehreman, Îvan kiriye:  
 “Biçe, Îvanê min, bikuje wî kalî,  
 Ew Mîronê pir ji xwe bawer,  
 Biçe, jê bike serî,  
 Ji rihên wî yên spî bigire,  
 Bîne ji min re, serê wî biavêjim ber seyan!”  
 Guh daye van gotinan çûye Îvan,  
 .....” (Di Nav Insanan De, r. 134.)

Şemo di romana xwe de çîrokê bi xwe neqil dike. Çîrokên ku di romanên Gorkî de diborin ji devê lehengekî/ê dî tîen vegotin. Wekî mînak ev çîroka li jorê ji devê dapîra wî tê vegotin. Dema ku em bala xwe didin van berhemên gelêrî yên di romanên Gorkî de cih girtine, em dibînin ku Gorkî van baş di honandina romanên xwe de bi kar aniyê. Lewra naveroka piraniya van berhemên gelêrî jiyana gel nîşan didin. Maksîm Gorkî hem bi behskirina jiyana xwe hem jî bi van berhemên gelêrî bi me nîşan daye ku gelê rûs ê çînen binî çawa dijîn, çi hîs û fikr dikin. Erebe Şemo kême cih dabe berhemên gelêrî jî em dimînin ku mînakên wî jî dayî heman peywira yên ku Gorkî lîstine hildaye li ser milên xwe.

Gorkî hewl daye jiyana derdora xwe û lehengên pê re hemhal bûye di romanên xwe de nîşan bide. Bi xwezayî çî ye ku kesên derdora wî ev berhemên gelêrî vegotine yan jî gotine, Gorkî jî cih daye van berhemên. Em dizanin baştirîn rê ji bo nasîna gelekî ew e ku mirov bala xwe bide berhemên devkî. Dema ku em bala xwe didin stran, dua û çîrokên gelêrî yên Gorkî, em dibînin ku jiyana, hest, xwezî û êşên gelê rûs yê wê çaxê derdikeve pêşiya me. Jixwe diyar e ku Gorkî xwestiye rewşa dema xwe li ber çavên xwendevan aşkere bike. Lewra bi van berhemên devkî



Gorkî heyama xwe zelaltir kiriye. Erebe Şemo jî di her du jêgirtinên xwe de xwestiye ev mînak ji civakê re bibin neynik. Di duaya romana xwe de Şemo bi me dide zanîn ku civaka ku xwe wekî dîndar dihesibîne, ne ewqas jî dîndar e û bi çîroka Siyabend û Xecê bi me dide zanîn ku civak nahêle mirov, du evîndar, bigihîjin mirazên xwe.

### 3.3.6. Şopên Jiyana Civakî

Li ser pirsê “Erkê wêjeyê çi ye?” gelek wêjezan gotinên xwe gotine. Di tevan de xalên hevpar ev in ku wêje dikare gelek tiştî bike. “Ji ber xweseriyên xwe û wek cureyekî hunerê, edebiyat, xwediyê gelek erkan e. Ew dikare zewqê bide me, tiştina hînî me bike, daxwaz û hewesên me rake ser piyan, me bikişîne nav dinyayeke xeyalî, ji bo hin zanistan (dîrok, psîkolojî, civaknasî) bibe belgeyên duyem...”<sup>168</sup>

Her wiha berhema wêjeyî dikare rewşa civakî ya serdema xwe raxîne ber çavên xwendevan. Ev yek di *Şivanê Kurmanca* de heye. Mirov dema ku vê berhemê dixwîne, digihîje vê qeneetê ku di navenda romanê de ne leheng hene, belkî tiştê bêhtir li ber çavên me dikeve, rewşa civakî û ya siyasî ye. Kesek serûber jî li romanê binêre dê bigihîje vê qeneetê. Lewra sernavên romanê bi xwe bi rewşa civakî û siyasî ve têkilîdar in. Ji navên beşên wekî “Li zozana”, “Li dagerê. Rojêd ezîze paîzê-beranberdan”, “Li şherda. Şerê împêrialîsta”, “Li firqêda”, “Înglaba Oktyabrê” û “Şerê grajdaniyê” jî xuyaye ku naveroka beşê dê derbarê rewşa civakî û ya siyasî de agahiyan dihewîne.

*Şivanê Kurmanca* dikare panoromaya civakî û siyasî ya ji destpêka salên 1900î heya salên 1920î bide. Di hinek cihên romanê de agahî ji van salan jî derdikeve. Wekî mînak; di navbera salên 1877-1878an de Şerê Osmanî û Rûsan çêdibe. Di vî şerî de hinek bajarên wekî Erzurum, Qers û Bazîd dikevin destê rûsan. Şemo di berhema xwe de wiha cih dide vî şerî: “Qers ketîye bin bandûra Ûrisêtê pey şerê 1877-1878 salê. Çewa ku mezin salixa didin, wextê Qers hate standinê, sereskeriyê şer, Lorîs Mêlikov, dikir.” (*Şivanê Kurmanca*, r. 118.)

Şerê Cîhanê yê Yekem jî xwe di romanê de dide der. Di bin beşa “Li şherda. Şerê împêrialîsta” Şemo qala şerê di navbera dewletên Osmanî û Rûsî de dike. Şemo wekî wergêr di Artêşa Rûsan de cih digire. Qala bûyer û serboriyên xwe dike:

<sup>168</sup> Remezan Alan, *destpêkek ji bo Zanista Edebiyata Modern*, weş. Peywend, İstanbul, 2015, r. 85.

“Eskerê me danîbû le Entabê, ew çend gund berê gundê Sîpka bûn. Êla îpka revîbû, hatîbû welatê Qersê.” (Şivanê Kurmanca, r. 132.) Şemo dema ku di nav artêşê de ye dibîne ku leşker gelekî zordarî ser gelî herêmê dikin: “Wê îstindaqîyêda kifş bû, wekî gelle şixulê netê zabit û qazax tîne serê riatê. Lê kesekîra ji wanra dengê xwe nekir...” (Şivanê Kurmanca, r. 135.)

Di serdema Erebe Şemo de piraniya kurdan gundî û koçer bûn. Kurdên bajarî kêr bûne. Lewra jî di *Şivanê Kurmanca* de kurd wekî gundî û koçer derdikevin li hemberî xwendevan. Bi taybetî di beşên “Li zozana”, “Li dagerê. Rojêd ezîze paîzê-beranberdan” de jîyan û edetên kurdan hatine behskirin. Ji sernavê beşê jî xuyaye di nav kurdan de roja beranberdanê wekî rojêke pîroz tê dîtin. Şemo di rûpelên 109 û 110an de cih daye vê cejna kurdan. Erebe Şemo çî ye di nav gundên rûs, ermen û yewnan (hurum) de mezin bûye cara pêşîn dema ku pîrozbahîya vê cejnê dibîne pir bala wî kêşaye. Şaşbûna xwe wiha tîne ziman:

“Gava ku min pirsî, -ev çima ussane, xortekî mezin, kêleka min sekinîbû, wa binçava li min nihêrî, got:

-Çima tuyî korî, tu nabînî, wekî îro beran-berdane, xelq tev karê xwe kirîye?

Ez nêzîkê wê bûm jêra salîxa xwe da û gotê, -sî û pênc sale, bavê min eşîrat hiştîye, çûye bûye rênçberê melegana, huruma û êrmenîya, loma hê jî em pak nizanin qeyde-qanûnê eşîratê.” (Şivanê Kurmanca, r. 109.)

Erebe Şemo di gelek cihên romanê de gundîbûn û neşarezatîya kurdan bi devê gelên dî tîne ziman. Bi van gotinan em pê dihesin ku gelo cîranên kurdan bi çî çavî li kurdan dinêrin. Ber çavê ermeniyekî, kurd: “Kurmancê ker çî terane, em şer kin yan şer nekin, tu xwara çobantîyê bike, bigre gopal-here zozanî...” (Şivanê Kurmanca, r. 149.) Piştî axaftineke xwe li nav civatê Erebe Şemo diçe ku ji dikanê jî xwe re nanek bikire: “Gava ku ez hatime dikanê Dîgorê, min xwara nan bikirîya, teva li kûçê difitande min, li min dikenîyan. Hineka dikire gazî: ‘kurd, kurd’ û didane çêra...” (Şivanê Kurmanca, r. 154.) Dema ku Şemo di nav hevalên xwe yên rûs de qala nêrînên Bolşevîk û şoreşê dike, rûs dikevin ser kirê Şemo û dibêjin: “Mera gotine-hûn kurmanc sal donzde meha merîya dikujin, talana dikin, kuda tu van gilîya zanî?” (r. 161.) Piştî şaşfêmkirina dizîna çetel û kêrê çend jinên ermenî dibêjin: “-Kurmanca teve ussa dizin, qaçaxin, hila binêr- eve çûk hatîye vira, dîsa jî bê dizî

nahewe” (Şivanê Kurmanca, r. 82.). Qumandarê Şemo jê re dibêje: “-Hevalê Şamîlov, ez zanim, -mêrê kurd zafe mêrxasin û wekî soz dan, tu carî xayîntiyê nakin.” (Şivanê Kurmanca r. 169.) Dema ku tê girtin: “Kurmancê heywan, wekî tu gilîya fêm nakî, çima xeber didî û dibêjî?” (Şivanê Kurmanca, r. 150) Ev nezaniya kurdan di gelek cihê romanê de di devê gelên dî de bûye benîşt.

Her wiha gelek şopên jiyana civakî di *Şivanê Kurmanca* de xwe didin der. Di seranserê romanê de nêrînek heye ku xizan di bin lepê zengînan de dipelçiqin. Ka ji mirov e, Erebe Şemo xwestiye bi rêya vegotina jiyannameya xwe bide nîşan ka çawa beriya Şoreşê neheqî û zordarî li ser gel hebû. Şerokeşîr û began çawa belengaz ji bo karê xwe didane xebatê. Mela û koçekan çawa mil bi milên axayan xwîna gel dimijandin. Mirov dikare bibêje ku di her beşê romanê de mînaeke neheqiyê peyda dibe. Jixwe di beşa dawî ya bi navê “Dîsa nava kurmanca” de êdî Şemo ne tenê bi xwe bi tevê hinek lehengên dî jî neheqiyên berê Şoreşê ku li wan hatiye kirin, bi gazincî ji Şemo re qise dikan. Di vê beşa dawî de ev nêrîna Şemo pir tîrtir xuya dike. Di ser de jî progandaya sîstema nû tê kirin û roman bi paragrafên propagandayî diqede:

“-Bavo! Lê kê destê me eşîrê kire hevdu, berî hev dan, me xûna birêd xwe dirêt. Em jî xebatçî ewana jî xebatçî. Bega bona kara cêba û kara daşnaka em muxluqet berî hev didan, me hevdu qir dikir. Lê çima niha kesek nabêje. “Eva kurmanca, eva êrmenîye, eva rûse yan eva eceme.” Niha em tev, mîna bira, dixebitin, dengê xwe hevra nakin. Her dîwana şêwrê eva azaya anî nav me.

Rastî, her înglaba Oktyabrê û dîwana şêwrê zulma patşê Nîkaleyî xûnxur, zulma bega, şêxa, axalera û mella, zûlma daşnaka ser gundîyêd xebatçî dane lildanê

Gundîyê xebatçî, kesîb û betrak idî zanin-şêx, melle, beg û axaler dijminê wanin. Wekî roja bê lazim be, ewê hazir ver dîwana şêwrêda xûna xwe birêjin.” (Şivanê Kurmanca, r. 198.)

Çawa ku em dikarin ji *Şivanê Kurmanca* rewşa civakî û siyasî ya serdemê bibîn, bi heman awayî em dikarin ji her sê romanên Maksîm Gorkî jî rewşa civakî û siyasî ya serdemê bibînin. Lê bêguman awayê pêşkêşkirina şopên demê yê Erebe Şemo û Maksîm Gorkî pir cuda ye. Çawa me li jorê jî gotî Şemo pir bi awayekî aşkere, cih bi cih jî di asta propagandayê de rewşa demê pêşkêş dike. Lê Gorkî tabloya demê vî şeklî nade. Gorkî di nav honandina romanê de bi awayekî

nixûmandî, bi jiyana leheng û qewimîna bûyeran rewşa serdemê bi xwendevan dide zanîn. Wekî Şemo rewşa heyî bi devê xwe yan jî bi devê lehengekî/ê dî tenê bi riya neqilkirinê nabêje. Wekî mînak Gorkî jî qala Şerê 1877-8 ya Osmanî-Rûsan dike:

“Li erebaya dî, pîrejin bi kurê xwe yê fermadar re rûniştibû, wekî wêneyekê rûniştibû. Kurê wî jî pê qabza şûrê xwe rihê xwe rast dikir, car car jî bawîşk dihatinê.

Bapîrê min ji wî dipirsî:

-Hûn şervan in, erê?

-Bêguman!

-Dê qenc be. Divê hûn tirkan têk bibin!” (Zaroktiya Min, r. 231.)

Gorkî dema ku vê hevpeyvînê dibihîze neh deh salî ye. Yanê salên 1877-8an e. Wisa xuyaye ku qala heman şerî tê kirin. Lê çawa tê dîtîn di navbera pêşkêşkirina Şemo û Gorkî de cudahiyek heye.

Di sala 1861ê de li Rûsyayê reforma ax, erd û ereziyan tê kirin. Dewlet axê ji axayan distîne û di ser gundiyan de belav dike. Bi vî awayî li Rûsyayê serfî<sup>169</sup> radibe. Ev guherîna mezin li ser jiyana gelê rûs bandoreke mezin çêdike. Li gorî dema xwe bûyereke mezin a civakî ye. Gorkî jî di berhemên xwe de cih dide vê reformê. Lê rasterast vê reformê neql nake. Di nav axaftinên lehengan de, bi nîrxandinên wan tê dayîn:

“Suslovê çeleng li ser kevirê herî jor rûniştibû, gazincan dikir:

-Di vê dinê de karê gundiyan baş nîne, Mihaylo Antonov. Di dema axayan de qiymeteke jiyane hebû, her gundiyeke karê xwe dizaniya...

-Eger wisa be daxwaznameyekê binivîse, bila dewra koletiya axê dîsa bê...”

(Zanîngehên Min, r. 114.)

Şemo ji ber ku li gund çêbûye û mezin bûye, di berhema xwe de cih daye jiyana sosyal a gund û eşîran. Lewra mekan û jiyana ku derdixe pêşiya xwendevan bêhtir derveyî malê û xwezayê ye. Gorkî kesekî wekî bajarî û di bajar de mayî bêhtir jiyana sosyal a navmalî û hundurî radixîne ber çavên me:

---

<sup>169</sup> Serfî: di Qirna Navîn de li Ewropayê awayekî xulamtiyê ye. Axa ku serf li ser dixebitin milkê axa ye. Ev ax ji bavan dibore kuran. Lêbelê, serf kara ku ji vê axê tê piçek ji xwe re hildidin a mayî jî didin axê.

“Bûk û xezî her roj şer dikirin. Bi rehetî û zû dikariyan dest bi şer bikin, vê yekê ez pir ecêb dihiştim. Sibeyan zû, ka ji mirov e di malê de agir derketiye, ji odê direvine odeyekê, sibe heta êvarê bi endîşeyekê navmalê diçin û tîn, tenê firavînê, dema çay û şîvê li ser masê dikarîn bêhna xwe bidin. Heta ku serxweş bibin vedixwarin, heta ku giraniyek bikeve bedena wan dixwarin. Li ser masê ji xwarinan xeber didan û hêdî hêdî di ber hev de diavêtin. Bi vî hewayî xwe ji bo gengeşiya mezin amade dikirin. Xezî çî pêjandibe bila bibe, bûkê teqez wiha digot:

-Dayîka min a ezîz ev wiha çênedikir.

-Eger wiha nebe, tê wê meneyê ku ji vê xirabtir e!

-Nexêr, ji vê baştir bû!

-Ku wisa be tu jî biçê ba diya xwe ya ezîz.

-Ez xanima vê malê me!

-Ê, ez çiyê vê malê me?

Xwediyê malê dikete navbera wan:

-Bes e, mirîşkên hov! We hişê xwe xwariye?” (Di Nav Insanan De, r. 70.)

Erebê Şemo di seranserê romana xwe de rewşa kesên feqîr kiriye mijara xwe. Ligel vê xizaniya gel, rewşa milkdar û zengînan jî daye. Şemo qala zehmetiyan dike ku feqîr û gundî dikêşin. Çawa jiyanêke zor û zehmet dijîn û serdestên wan çawa ji keda wan dixwin. Gorkî jî wekî Şemo di romanên xwe de cih dide rewşa xizanan. Lehengên wî jî xebatkar, gundî û çînên herî jêr yên civakê ne. Gorkî her çend wekî Şemo rewşa wan rasterast neql neke jî, bi devê lehengên xwe, bi serboriyên wan vê mexdûriyeta wan tîne ziman. Çawa ku Şemo dide nîşan ku hinek birên civakê pir dewlemend in û birek jî yanê xebatkar û gundî xizan in; Gorkî jî bala xwe dide vê rewşê:

“Dev ji daristanan berdin, digot Osip, ew yan yên dewletê ne yan jî yên asîlzadeyan in, daristana gundiyan tune. Bajar dişewitin, divê mirov ber wan jî nekeve, li wir zengîn dijîn, hewce nîne dilê mirov pê bişewite! Bila gundên biçûk û mezin xema te bibin...Tu dizanî her havînê çend gund dişewite? Ji sedî kêmtir nîne... A xirab ev e ha!” (Di Nav Insanan De, r. 406.)

Em di her sê romanên Gorkî de dibînin ku Gorkî bi girîngî li ser rewşa jinan disekine. Gorkî dibîne ku di civakê de jin gelek tîn perçiqandin. Mêr bi rehetî dikarin

bi hişkî li jinên xwe bixin, zordarî li ser wan bikin. Gorkî nîşanî me dide ku jinek çawa bi rihetî dikare bikeve kolanan û neheqî lê bê kirin:

“Piştî demeke bêdengiyê ji min pirsî:

‘Erê, wiha ye! Pêwîstiya te bi jineke cilşo heye? Baş e, lê bi orispiyekê?’

Jixwe ez di derbê de pê hesiyabûm ku ew ‘jineke xirab’ e. Jineke cuda tune di nav jinên vê kolanê de. Lê, dema ku vê lixwemikurhatinê Natalya bi xwe got, cîgera min şewitî. Ji şerman, ji ber êşa dilê xwe hêstir ketine nav çavên min. Lê di heqîqetê de, heta demeke nêz jî ev jin çiqas ji xwe bawer, jêhatî û zîrek bû!” (Di Nav Insanan De, r. 383.)

Piştî ku Gorkî li ser maseya Natalya radibe û diçe, çend demek xwe diavêje ciheke dî. Piştî dema ku ji wir derdikeve dîsa li rastî Natalyayê tê. Natalya bi çavteji di ber wî re dibore. Li pişt wê jî Ardalon û Robenok hene. Ev her du kes tinazên xwe li wê dikin û gotinên nexweş jê re dibêjin. Robenok bangî hevalê xwe dike û dibêje wî carek jî li wê bixe. Gorkî li hemberî vê dîmenê matelmayî dimîne û pir xemgîn dibe. Li hemberî her du hevalên xwe radiweste û wan hişyar dike ku dev ji vê reftarê xwe berdin. Çawa xuyaye ku Maksîm Gorkî derbarê jinan de pir hesas e. Herdem hewl dide heqê jinan biparêze û balê dikişîne ser neheqiyên ku li jinan tên kirin.

Me li jorê gotibû ku Erebê Şemo di romana xwe de cih daye îmajên derbarê kurdan jî. Bi vî awayî ka di nezera gelên dî de kurd çi kes in, kê-m-zêde qeneetek çêdibe. Maksîm Gorkî jî di gelek cihên romanên xwe de navê gelê rûs bi kar tîne û li ser taybetiya gelê xwe radiweste. Cudahiya di navbera her duyan ew e ku di Şemo de kurd bi çavên gelên dî jî tên nasandin. Lê di Gorkî de rûs bi çavên xwe tên nasandin: “Ji baxçeyê dijûneke rûs a ewqas xirab û pîs bersiva wê dida ku ew dijûn nedihate hişê nebaşîrîn kesî/ê.” (Zaroktiya Min, r. 107.), “Herçend sik be jî, piranî ruhên esîl xirab bike jî, gelê rûs xwedî ruhekî wisa hêzdar û saxlem e ku dikare hemûyan têk bibe.” (Zaroktiya Min, r. 251.), “Bi revtara xwe ya bêtirseke hundirîn ku tenê di rûsan de tê dîtin, li gotina xwe zêde kir:” (Zanîngehên Min, r. 54.), “Jiharev bi fermanî diqêriya: -Wekî rûsan! Hevalê ezîz, ji te rica dikim!” (Di Nav Insanan De, r. 290.)

Di berhemên her du nivîskaran de jî rexne li rewşa jiyana civakî tên kirin. Gorkî bi devê Andrey Derenkov wiha bangî xwendevan dike: “Mirovên wiha qenc

dê bi sedan, hezaran bigihîjin hev, dê bên hemî astên jor ên Rûsyayê cih bibin û jiyane biguherînin.” (Zanîngehên Min, r. 42.) Me li jorê wisa îddia kiribû ku Şemo berhema xwe ji bo piştevaniya sîstema nû nivîsandiye. Her hewl daye ku neheqî û xeletiyên dewra berê nîşan bide. Diyar e ku Gorkî bi xwe jî wekî Şemo xwestiye xirabî û neqehiyên serdemê nîşan bide. Em di wê baweriyê de ne ku Şemo jixwe vê hêla romana xwe ji Gorkî girtiye. Ferqa wan jî ew e ku Şemo vê yekê pir aşkere dike. Lê Gorkî bêhtir vê armanca xwe veşartî kiriye. Di cihekî romana xwe de ew bi aşkerekî dibêje ku hewce ye rewşa serdema berê bê vegotin ku bê nasîn û seresatkirin:

“Dema ku ez wan keraxiyên zirincî yê jiyana rûs a hov bi bîr tînim, ji xwe dipirsim: ‘Gelo hêja ye ku em îro behsa van tiştan bikin?’ û di heman demê de bi baweriyê xurt bersiva xwe didim: ‘Erê, hêja ye! Lewra ew tişt hatin jiyîn, hemî rastiyên kerax in. Hêj di roja me de jî hene. Ji bo ku ev ji hişê me, ji ruhê mirovan, ji jiyana me ya giran û kirêt bên derxistin, divê ji her aliyên xwe ve bên zanîn...’” (Zaroktiya Min, r. 250.)

Maksîm Gorkî romana xwe ya *Zaroktiya Min* di sala 1913an de diqedîne. Vê romana xwe beriya Şoreşa Kewçêrê dinivîse. Hem di vê romana xwe de hem jî yê piştî Şoreşê yanê *Di Nav Insanan De* û *Zanîngehên Min* de rexneya jiyana civakî dike. Lê di yê piştî Şoreşê de îfadeyê wekî “Hêj di roja me de jî hene” bi kar nayîne. Rexne û xirabiyên di van romanên de hemî beriya Şoreşê ne. Gorkî wekî paragrafê jorê nabêje ku êdî rewşên wiha tunene. Şemo ji ber temenê xwe di romanên xwe de cih daye hem beriya Şoreşê hem jî piştî Şoreşê. Lê wekî Gorkî li hemberî Şoreşê bê deng nemaye. Di bin beşa “Dîsa nav kurmanca” de cih daye îfadeyên qenciya Şoreşê: “Ez ji 1920-salê şûnda her îsal, 1924-da vegeyîyam, hatim. Lê aykê min û yê zarê min wîra nema. Dîwana şêwrê xweyê me, kesîb-kûsîba hat, em aza kirin ji destê van xûnxura, ji destê van zalima...” (Şivanê Kurmanca, 191.)

### **3.4. BERAWIRDKIRINA HIN ŞOPÊN HUNERÎ**

#### **3.4.1. Leheng**

Em dizanin ku tiştê ku romanê dike roman ne qalkirina bûyerê ye, tiştê romanê dike roman rê û rêçik in ku hewl didin nêrînên lehengan derxînin holê. Di

romanê de bi serleheng û lehengan bûyerên honandî dewlemend dibe. Di cîhana honandî ya romanê de leheng di nav hêmayên romanê de ya herî berbiçavtir e.<sup>170</sup> Çawa ku Foster jî dibêje roman û çîroka modern bi giranî li ser lehengan ava dibin.<sup>171</sup> Lodge jî ser girîngiya lehengan disekine û dibêje: “Leheng, bi serê xwe bi îhtîmaleke mezin girîngtirîn hêmaya romanê ye.”<sup>172</sup> Alan girîngiya lehengan ji bo romanê wiha tîne ziman: “Roman, vegotina serboriya şexsan e û di vê pêvajoyê de destnîşankirina guherînên wan e. Du tiştên wê bivênevê ne: Bilêvkirina dinyaya derûnî û derveyî ya şexsan, û merhale merhale çavdêrîkirina tekemûl an tîkçûyîna wan!”<sup>173</sup>

Nivîskar li gorî nêrîna xwe ya wêjeyî lehengên xwe diafirîne. Eger nivîskar girîngî bide şeweya berhema xwe û ji bo wî/wê takekes girîng bibe “karakter” diafirîne, ji bo wê civak girîng bibe, wêjeya civakî bipolarêze “tîp” diafirîne.<sup>174</sup> Nêrîna wêjeyî ya Şemo realîzma sosyalîst bû.<sup>175</sup> Di vê nêrînê de wêje riyek e ku xizmeta gel dike. Lehengên Şemo ji “karakter”ê bêhtir di asta “tîp” de ne. Ev yek jî bi nêrîna wî ya wêjeyî re di nav ahengê de ye.

Romana *Şivanê Kurmanca* romaneke otobiyografîk e. Lewra serlehengê romanê, nivîskar bi xwe ye. Jixwe di gelek cihên romanê de Erebe Şemo navê xwe bilêv dike. (*Şivanê Kurmanca*, r. 75, 89, 147, 169.) Ji bilî Erebe hinek jî ew kes in ku Erebe ji zaroktiya xwe heta ciwaniya xwe bi wan re hemhal bûye. Kesên pêşîn ku di romanê de derdikevin pêş, kilfetên malbata wî ne. Romana *Şivanê Kurmanca* bi vê hevokê dest pê dike: “Şemo kurmançekî kesîb bû.” (*Şivanê Kurmanca*, r. 53.) Em dibînin ku yekem lehengê ku navê wî dibore bavê wî Şemo ye. Piştî navên xwişk û birayên xwe Biro, Dewrêş, Çîçek û Gogê dide. Dixuye ku lehengên pêşîn ku di romanê de xwe didin der malbata Şemo ye. Jixwe wî navê beşa yekem a romana xwe “Kulfetê me. Zarotiya min” daniye. Erebe Şemo qet qala dapîr û bapîrê xwe

---

<sup>170</sup> Mehmet Tekin, *Roman Sanatı Romanın Unsurları 1*, weş. Ötüken Yayınları, 12. Basım, İstanbul, Mart-2014, r. 79.

<sup>171</sup> E.M. Forster, *Roman Sanatı*, wer. Ünal Aytür, weş. Milenyum Yayınları, İstanbul, Mart 2014, r. 108-120

<sup>172</sup> David Lodge, *Kurgu Sanatı*, wer. Aytaç Ören, weş. Hece Yayınları, Ankara, Mayıs 2013, r. 92.

<sup>173</sup> Remezan Alan, *Folklor û Roman Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn*, weş. Weşanên Peywend, Stenbol, 2013. r. 87.

<sup>174</sup> Murat Belge, *Edebiyat Üstüne Yazılar*, weş. İletişim Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, 2012, r. 23.

<sup>175</sup> Nazê, *h.g.*, r. 32



nake. Lê têkiliyeke xurt ya Maksîm Gorkî bi dapîr û bapîrê wî re heye. Bi taybetî peywendiya wî ligel dapîra wî gelekî xurt e. Bandoreke mezin ya dapîra wî li ser wî çêbûye.

Erebê Şemo zarokê malbatekî feqîr ê kurmanc bû û malbata wî li gundan dijiya. Bavê wî ne xwediyê ax bû. Lewra debara xwe bi paletî û xulamtiya maldaran dikir. Piraniya lehengên romanê kesên gundî yan jî eşîrî ne. Di nav wan de pale, cotyar, şivan, golikvan, serokeşîr hwd. hene. Di bin beşa “Hukum” de em dibînin ku bavê Erebe Şemo ji bo debara malbata xwe li gundên rûsan digere. Şemo navê malbatên kurmanc dide ku ev malbat di van gundan de dijîn û kilfetê van malbatan yek û yek dijmêre. Di bin banê vê beşa çar rûpelî de qala bi dehan kesan dike. Wekî vê beşê, di beşên dî de jî Şemo qala gelek lehengan dike. Erebe Şemo ji ber ku kesekî aktîf bû, ew di dema Şerê Cîhanê de, Şerê Navxweyî de bi gelek kesan bajarî re jî hevnas dibe. Di nav van de xebatkar, leşker û xwendayên siyasî gelek in.

Lehengên Erebe Şemo bala xwendekar nakêşe ser xwe. Lewra wekî birûskekê pirî caran ji nişkê ve vedidin û bi heman lezê jî ji nav honandina romanê wenda dibin. Wekî mînak di bin banê beşa “Li firqêda” wiha behsa çend paleyan dike: “Li wê derê min nasîna xwe da palêd Ûrisêtê Klîmov, Mîxaîlov, Popov û Şûrka Kornêv, yê ku niha dixebite G.P.U-ya Moskovê.” (Şivanê Kurmanca, r. 144.) Erebe Şemo dibêje ji xeynî Kornêv ev giş Bolşevîk bûne. Şemo hildane nav xwe û tembîhan li wî kirine. Ji bilî van gotinên Şemo em di romanê de carek jî salûxa van kesan nabînin. Derbarê derûna van kesan û taybetiyên wan yên fizikî tiştek nayê gotin.

Dema ku em bala xwe didin van lehengan, em dibînin ku di honandina romanê de zêde erk hilnagirin ser milên xwe. Ka ji mirov e, Erebe Şemo tenê xwestiye ku kesên ku wî ew nas kirine navên wan bide. Dema ku navê wan dide, eger ev kes gundî bibin navê gund û malbata wan bi bîr dixîne, hew! Lehengên bi vî awayî re dibêjin lehengê dekoratîf yan jî figûran. Armanca cihdayîna van lehengan ev e ku hêmanên romanê yên bûyer, cih, dem û leheng ber çavên xwendevan rastir bînin xuyandin. Atmosfêra ku ji romanê re hewce ye bê pêkanîn.<sup>176</sup> Wekî mînak: “wî gundîra digotin Vladîqers. Li vî gundîda dima mala Eslên. Eslan xwe merifekî zafî

---

<sup>176</sup> İsmail Çetişli, *Metin Tahliline Giriş/2 Hikaye Roman Tiyatro*, Akçağ Yayınları, 4. Baskı, Ankara, 2014, r. 93.

pak bû. Hebûn sê kurê wî: Emo, Elî û Kekan.” (Şivanê Kurmanca, r. 94.) Erebe Şemo piştî ku navê van lehangen dibêje derbarê wan de tenê dibêje ku ev malbat niha li filan cihê ye. Mirov ji xwe dipirse gelo niha bi qalkirina van navan armanca nivîskar pêk hat? Van kesan di honandina romanê de peywireke çawa hilgirtin? Ji me re wisa tê ku ji dekoratîfê wêdetir e ev rewş. Şemo ne ku xwestiye van kesan honandina romana xwe bike, belkî wî ev nav rasterast daxîlî romana xwe kiriye. Nivîskar van kesan nas kiriye û di romana xwe de cih daye van kesan.

Dema ku em bi giştî li lehangên Erebe Şemo dinêrin em dibînin ku Şemo li ser kesayetiya wan a fîzîkî û derûnî zêde nasekine. Xwendevan bêhtir silûetên lehangen dibîne. Xwendevan nikare dîmena fîzîkî ya lehangen bîne ber çavên xwe û hest û ramanên wan yê takekesî bibihîze. Wekî mînak dibêje: “Nava jinêd meleganada jineke zaf rind hebû. Navê wê Paraşa bû. Ewê gellekî ez hiz dikirim. Kifş bû gunê wê min dihat.” (Şivanê Kurmanca, r. 68.) Erebe Şemo du paragraf ji bo Paraşa veqetandiye. Di hevoka dawî ya paragrafa yekem de tê gotin ku zarokên Paraşa tune. Şemo di paragraf duyem de jî dîsa rindbûna Paraşa aniye ziman û qenciye ku Paraşa li wî kiriye rêz dike. Şemo ji bo Paraşa dibêje rind e. Lê derbarê taybetiyên wê yê fîzîkî de tu tişt nabêje. Dema ku xwendevan rindbûna Paraşa bifikire wê her xwendevan di hişê xwe de Paraşayeke cuda biafirîne. Lewra li gorî her xwendevanê rindbûna jinekê cuda ye. Em qet ji hestên Paraşa jî haydar nabin. Belê gunehê wê li Şemo tê. Arikariya Şemo dike. Lê çima? Em ji devê wê tiştek nabîhizin. Şemo bi awayekî veşartî dibêje ku çî ye ew xwedî zarok nîne, lewra dilê wê li Şemo germ bûye. Yan jî çawa ku di paragrafa yekem de tê gotin ku Erebe Şemo pir xizan e. Dibe ku dilê wê ji vê yekê li Şemo germ bûye. Yan jî dibe ev her du jî nebin. Dibe ku jinik pir dîndar e lewra arîkarî kiriye yan jî tiştekî dî. Bi kurtî lehangên Şemo di vegotina hestên xwe de pariyekî lal in. Nakevin nav diyalogê. Lewra xwendevan nikare xwe bigihîne derûna lehangen.

Şemo di gelek cihên romanê li dewsa ku temamiya taybetiyên fîzîkî yê lehangê bide nasîn, rewşa cil û bergên wan radixîne ber çavan: “Ji nava wê komê de yekî-kincne kevne peritî lê, kolosekî ridî girêdayî serî, cote çarixê peritî lingêda bûn, arxalixê wî peritîbû, cure-cure pîne lê xistîbûn, sere pîna gîhandibûne hevdu, meriv tirê-qest neqîşandibûn.” (Şivanê Kurmanca, r. 194) Şemo kêman caran bi qelsî ser

taybetiyên bedenî jî rawestiye: “Zabit, kincne teze lê, ser-suretê wî kur kirî, porê wî şekirî bû, kivş bû-kurê dêye, teze ji şêher hatibû.” (Şivanê Kurmanca, r. 194.)

Ligel ku Şemo xurt li ser hest û derûna lehengên xwe nasekine wisa xuyaye ku wekî serlehengê romanê hest û derûna xwe jî zêde îfşa nake. Beşa 12an ya romanê bi sernavê “Pezê undabûy. Mirina birê min” hatiye pêşkêşkirin. Wekî ku ji sernavê diyar e, di beşê de wiha qala mirina birê xwe yê Derwêş dike:

“Dewrêşê birê min her-ro digot:

-Ez nexweşim, serê min dêşe, dilê min jî diwerime.

Ro bi ro Dewrêş paşda diçû, nikaribû pey dewêr saskar bibe. Belengazî himangî dêwêrra kaş dibû. Axrîyêda kete nava cîya. Bavê min gelle du dermana gerîya, nebû tişteki. Rojekê bavê min çû, gazî hekîmekî kir, anî. Ewî pezek da kirinê, şerşêkir, Dewrêş avîte nav postê pezê. Dewrêş dîsa silamet nebû.

Wextê heqê me kuttabû, me golîk û qorê wan nava gund belakir, heqê xwe ji nava gund top kir, stand. Wê paîzê em ji mereka Teco der ketin, hatne, ketne koxê Şûmê Korê. Zivistanê şewata me kêmbû, Derwêş ji serma malê teyax nedida, diçû, dikete tewla Mîrzê Xudoyê Berîn, xwe germ dikir. Cara ez jî pêra diçûm. Min Dewrêş zaf hizdikir.

Kete zivistanê Dewrêş mir. Bavê min û diya min gelle şîn û girî kirin, lê tu feyda nekir.” (Şivanê Kurmanca, r. 117.)

Ji jêgirtina jorî dixuye ku mirina Dewrêş bi kûrahî nehatiye vegotin. Em nikarin ji nêz ve ji derûna Dewrêş haydar bibin. Belê dibêje ku ez nexweş im lê ev nexweşî di hest û reftarên çawa cudahî pêk aniye nayê gotin. Em nizanin gelo Dewrêş derbarê nexweşiya xwe de çi difikire. Gelo hatiye hişê wî ku dê bimore? Erebê Şemo hewl nedaye ku hestên Dewrêş vekole. Ji ber nexweşiya birayê wî armosfereke çawa ketiye malê, tam ne diyar e. Gelo çima hestên dê û bavê xwe bi devê wan pêşkêşî xwendevan nekiriye? Ligel van zêde ser hestên xwe jî nesekiniye. Tenê di hevokekî de dibêje ku ew pir ji Dewrêş hez dike. Qet qala têkilî û parvekirinên xwe yên bi birayê xwe re nekiriye. Carinan bi birayê xwe re çûye tewlê û li ba wî maye. Di wan deman de gelo bi hev re çi parve kirine û çi awayê nêzî hev bûne qet nayê gotin. Lewra sedema hezkirina Şemo ya ji bo birayê wî di hişê xwendevan de tam aşkere nabe. Ev awa pêşkêşkirina lehangana li gorî hunera romanê qels dimîne.

Bi gelemperî di romanê de têkiliya Erebe Şemo ya lehengên dî re bi vî şeweyî ye. Belê Şemo gava ku dikeve derdorekî navên kesên ku wan nas dike ji xwendevan re dibêje. Lê li ser parvekirinên xwe nake û hestên di navbera wan de hene di vegotinê de dernakevin hemberî xwendevan. Lê belê di çend cihên romanê de leheng hestên dilê xwe tînin ziman. Ev sahne piranî di navbera Şemo û kilfetên malbata wî de diqewimin. Wekî mînak:

“-Lao, were gura pîre dîya xwe bike, me bê xwey nehêle, neçe.

Gunê min pîre diya min û bavê min hat, ez jî pêra girîyam. Lê nedibû tiştêkî, gerekê ez biçûyama, çimku ez carekê ketibûme kelê û min halê kelê dibû: birçibûna wê, kutana wê, zêrandinê wê û çetiniyê mayîn. Yekê jî, wekî bizanibin ez komûnîstim, wê van dera min esse telef kin.

Kela girîyê me danîn, ez û bavê xwe û diya min, - em rûniştin, me şewr kir. Bavê min, hê hêsir ji çava dihatin, diketme ser sûretê wî. Raste ewî dixwast, wekî ez ji destê dîwana vira xilaz bim, lê wehîd û tenê diman. Wexta min gote bavê xwe: :Bese bigrî, ewî caba min da, got:

-Lao! Ez çewa negrîm: dewsa sê kura, tu tenê mayî, tu jî qe malda nesekinî. Tu li vî welatî-ez yek sal te nabînim, lê wekî tu herî, derkevî welatê dîr, dibek, ez êdî qe te nebînim.

Girîyê wî diha zêde bûn, dîya min jî pêra digrîya.” (Şivanê Kurmanca, r. 155.)

Lehengên pêşîn yên Maksîm Gorkî jî wekî yên Erebe Şemo kilfetên malbata wî ne. Gorkî jî hevoka xwe ya yekem wekî Şemo bi qalkirina bavê xwe, dest bi romana xwe dike: “Bavê min di oda nîvtarî û pir teng de li ber pencerê li erdê radiza.” (Zaroktiya Min, r. 11.) Piştî Gorkî qala dê, dapîr, bira, bapîr bi kurtî kilfetên malê dike. Lehengên Gorkî jî wekî yên Şemo bi borîna salan zêde dibe. Yanê her çend nivîskar mezin dibe, ji bo kar û xebatê dikeve nav insanan lehengên wî zêde dibin. Çawa ku em dikarin di romana Şemo de bi dehan lehengan bibînin, bi heman awayî di romanên Gorkî de jî bi dehan leheng derdikevin pêşberî me. Lê ne bi heman şewazê.

Digel ku em dizanin kesê ku di romanê de diaxive Gorkî ye jî, ew jî wekî Şemo di gelek cihên romanên xwe de cih dide navê xwe. (Zaroktiya Min, r. 242.; Di Nav Insanan De, r. 294, 310, 326.; Zanîngehên Min, r. 147, 149.) Jixwe Gorkî bi xwe

lehengê sereke yê romanen e. Em nefesa wî di her cihên romanên wî de hîs dikin. Dema ku em Şemo dixwînin, em ji nêz ve nabin şahidê derûna wî. Guherînên wî yê hestî zêde nakevin ber çavên me. Şemo li hemberî bûyer û kesan di hundurê wî de çî diqewimin, çî hîs dike ji me re tam nabêje. Lê Gorkî di gelek cihan de derbarê kesan, bûyeran û jiyana xwe de raz û hestên xwe bi zelalî radixîne hemberî xwendevan. Gorkî li ser hest û psîkolojiya xwe radiweste:

“Ji bo ku dixwest min nêzî xwe bike heta nivê şevê peyivî. Ev yek pir aşkere bû. Heta vî emrê xwe cara pêşîn bû ku min bi mirovekî re evqas li hev dikir. Piştî ku min hewl da ku xwe bikujim baweriya min ji min pir şikiyabû, min xwe li hemberî her kesî biçûk û sûncdar hîs dikir. Min ji jiyane şerm dikir. Bawer im Romans ev yek fêm kiribû û wekî mirovekî, deriyên jiyana xwe rasterast ji min re vedikir. Dixwest ez bi ser xwe ve bêm. Ew roj tu dem nayê jibîrkirin.” (Zanîngehên Mîn, r. 112.)

Dema ku em bala xwe didin romanên Gorkî, em dibînin ku her çiqas lehengê sereke Gorkî be û di navenda romanê de cih bigire jî, lehengên di jî ji bo romanên wî bivê nevê ne. Lewra lehengên Gorkî wekî yê Şemo nezalal nînin. Di gelek cihan de lehengên wî bi xwe dibin navenda romanê. Gorkî xwe dide koşeyekê û her hewl dide lehengê xwe derxe pêş. Ev leheng wekî yê Şemo zû ji sahneya romanê wî nabin. Dem tê bi gelek rûpelan li ser van lehangên tê rawestîn. Wekî mînak; bi taybetî Dapîra wî, bapîrê wî, Îyî Îş, Yakov Şumov, Pyotr Vasîlyev, Sîtanov, Osîp û Mîhaylo Antonov di nav dehan lehangên de yê herî berbiçav in. Gorkî dema ku li rastî kesekî/ê tê dev ji pêsîra wî bernade. Ji aliyê fizîkî û ruhî li ser wan disekine. Lehengên nû nas dike bi yê berê re dide ber hev: “Wekî Îyî Îşî di wî de jî tiştê hebû ku di kesên di de tune. Ew bi xwe jî ji xwe bawer bû. Wî dizaniya ku kesên di nikarin vî tiştê wî fêm bikin.” (Di Nav Insan De, r. 229.)

Gorkî her hewl dide ber çavên xwendevan taybetiyên fizîkî yê lehangên xwe aşkere bike. Şemo yan tu ser vê hêla lehangên nasikine yan jî kêr behs dike. Mirov dikare bibêje ku Gorkî tu dem vê hêla lehangên xwe bîr nekiriye. Gorkî ligel reftar û taybetiyên psîkolojîk yê lehangên her gav cih dide taybetiyên wan yê fizîkî jî:

“Dapîra min peyv bi taybetî dikirpandin. Peyvên ku ji devê wê derdiketin wekî gulên pir xweşik, ronî û zindî bûn. Lewra ew bi rehetî di hişê min de diman.

Dema ku dibişirî reşikên çavên wê yên wekî wîşneke tîr bi awayekî xweş diteyisîn û fireh dibûn. Bişirîna wê, diranên wê yên saxlem bi şahî derdixist holê, her çiqas dêmên wê yên qemer qirmîçîbin jî, ev yek rûyê wê pir ciwan û ronî dida nîşan. Kepê wê yê ku serê wî sor, qolên wî fireh û qirmîçî, şeklê rûyê wê pir xirab dikir. Ji qutiya xwe ya reş ku neqşên zîvê ser hebûn, enfiye dikêşa. Dema ku mirov li şekl û şemalê wê dinihêrt, mirov didît ku tam qemerek e. Lê hundurê wê ligel şahiya ku ji çavên wê dibariya, gul û gulistan bû. Milên wê piçek jorveyî bûn. Piştî wê hema bibêje xûs bû, gelek qelew bû. Lê wekî kidikeke girs rehet û lez hereket dikir; wekî wê heywanê nerm jî bû...” (Zaroktiya Min r. 19.)

Ji bo Gorkî ji fêmkirina kesan, naskirina wan pir girîng e. Lewra bi zelalî cih dide hest û xwestinên wan. Şemo di seranserê romana xwe de, çawa ku li jorê jî hate gotin, kêman caran cih dide hestên lehengên xwe. Lê digîhije vê qeneetê, ji bo Gorkî nasîna hestên kesan yek ji armanca jiyana wî ye. Kêman caran hene ku Gorkî qala kesekî bike, lê hewl nede qala derûna wî/ê neke. Gelek caran vê yekê bi riya axaftina lehengan dike. Dema ku leheng dest bi axaftinê dikin, xwendevan derheqê derûna wan de digîhîjin biryarekî. Yan jî Gorkî bi hurgilî li ser reftarên wan disekine. Reftarên wan jî dibin nîşaneyê derûna wan. Wekî mînak; Gorkî reftar û axaftinên Yakov Şumov ewqas xweşik pêşkêşî xwendevan kiriye ku xwendevan dikare derbarê vî kesî de bigîhîje qeneeteke tam:

“Hêj di ser de zehf neborîbû ku min xwe gelekî nêzî wî kesî didît. Bi ecêbmayîneke mezin min ew dişopand. Min metelmayî guh dida tiştên ku wî vedigot. Min wisa bawer dikir ku ew xwedî felsefeyeke saxlem, bêdeng a jiyane ye. Ji her kesî re “tu” digot. Di bin birûyên xwe yên stûr re li her kesî bi heman awayî, rasterast, rehet dinêrî. Li her kesî -qaptan, dikandar, rêwiyên ku di odayên baştirîn de diman- wisa dinêrî ku ka di navbera wan û wî de ferqek tune ye.” (Di Nav Insanan De, r. 228.)

Me li jorê gotibû ku Şemo cih dide mirina birayê xwe. Şemo di romana xwe de gotibû ku ew û birayê wî nêzî hev bûne û nêzî mirina birayê wî bi hev re gelek dem borandine. Dîsa jî qet cih nade derûna birayê xwe. Gorkî di romana xwe de cih dide gelek mirinan. Lê di nav van de yek bala me bêhtir dikêşe. Gorkî dema ku Davidov dimire cih dide hestên wî. Davidov karhevalekî Gorkî ye û nêzî mirina wî pê re Gorkî eleqedar dibe:

“Carinan ez û Pavel derdiketin ba wî. Zor dida xwe û tinazan dikir:

“Ez çawa dikarim ji we re mazûvantî bikim, mêvanên min ên hêja? Hûn dixwazin ez kêzikeke taze bidim we?”

Hêdî hêdî dimiriya û nefret dikir ji vê rewşê. Ji dil axîna xwe dianî, “nizanim ez çima nemirîm, neçûm,” digot, “gelekî bêhna min ji vê rewşê teng e!”

Pavel gelekî ditirsiya çî ye ku ew ji mirinê natirse.” (Di Nav Insanan De, r. 313.)

Maksîm Gorkî dema ku her sê romanên xwe nivîsandine, wî hewl daye serdemekê li ber çavên xwendevan zelal bike. Çawa ku li jorê jî hate gotin Şemo jî ev cehd kiribû. Lê di navbera wan de cudahiyeke wiha heye: Şemo serdema xwe, pîranî bi rêka neqlê aniye ziman. Lê Gorkî dewsa ku neql bike, xwestiye bi jiyana xwe û jiyana hûrgilî ya lehêngên xwe serdemê nîşan bide. Lewra jî di navbera lehêngên Şemo û yê Gorkî de cudahiyek berbiçav çêdibe. Lehêngên Şemo ji ber qalkirina serdemê nixûmandî dimînin, lê lehêngên Gorkî peywira nîşandina serdemê hildigirtine ser milên xwe.

### 3.4.2. Cih (Mekan)

Roman ji aliyê mahiyeta xwe ve honandinek e. “Cih” hêmayeke sereke ya vê honandinê ye. Di romanê de bûyer, çî bi leheng çî bê leheng, li cihekî diqewime. Lewra jî awayê vegotina cihî ji bo yekgirtîbûn û rastiya romanê girîng e. Pêşkêşkirina cihî di romanê de yan ji devê lehengan tê kirin yan jî ji devê vegêr. Di romanên klasîk de wekî hêmayên dî cih jî ji devê vegêrê îlahî dihat pêşkêşkirin. Di romanên modern ên serkeftî de ev şewaz guheriye. Êdî cih ji dewsa devê vegêrê îlahî, ji devê lehengan tê vegotin. Bi saya pêşkêşkirina cihî em dizanin bûyer li cihekî çawa diqewimin. Atmosfera derdorê aşkere dibe. Leheng baştir tê naskirin. Bal diçe ser civakê. Dibe ku carinan cih li gorî hizirîn û derûna leheng bê pêşkêşkirin. Ev yek pîranî di romanên modern de tê bikaranîn. Bi vî awayî cihê ku di romanê de tê pêşkêşkirin rengê hizirîn û hestên lehengan dide. Yanê cih di kesayetiya lehengan de dibe xwedî nasname. Bi gotineke dî dibe leheng bixwe.<sup>177</sup>

Serlehengê *Şivanê Kurmanca* Erebe Şemo bi xwe ye. Lewra piraniya romanê ji devê wî tê vegotin. Şayesandin û pêşkêşkirina cihî di *Şivanê Kurmanaca* de dîsa

---

<sup>177</sup> Tekin, *h.b.*, 169.

pariyek sist e. Erebe Şemo pirî caran bi çend peyvan qala cihê dike. Wekî mînak bi xwendevan dide zanîn ku malbata wî xizan e û di cihên xirab de dijîn: “Ew meraka em têda diman me tendûr kiribîyêda, hema dendûra me zivistana gelle cara nedihate dadanê. Eme bê dewar bûn, sergînê me tunne bûn.” (Şivanê Kurmanca, r. 56.) Lê ew xwendevan hilnade, wan nabe hundurî avahiya xwe. Gelo ew cihê ku dijîn çawa ye? Di hundur de çi heye û çi li ku dişekine? Peywendiya leheng bi vê avahiyê re çi ye û di leheng de çi hizirîn û hestan çêdike? Ev pirs bê bersiv dimînin yan jî tam ne zelal in. Eger eşyayên hundurê malê ber çavan bihata raxistin dê xwendevan xizaniya wan çêtir bidîta û dê cih alîkariya nasîna derûna lehengan bikira:

“Qers hatiye avakirinê ber çiyayekî mezin, serê çiyê keleke mezin ji zinara hatiye çêkirinê...Çarniqalî Qersê çiyane, serê wan çiya hatne avakirin gelle tabîyê esker. Ew çend sal bûn, min şêher nedîtibû, ez ecêbmay dimam ji muxluqetê wê, hatin-çûyna wê. Meriv nikarbû hêsa kuçêda biçûya ji dest faîtona, firguna, eraba û îsanet.” (Şivanê Kurmanca, r. 118.)

Erebe Şemo dema ku yekem car bajarêkî dibîne wekî paragrafa jorîn pêşkêşî xwendevan dike. Tê dîtîn ku Şemo bi awayekî kurt li ser şayesandina bajarê Qersê sekiniye. Ne wekî kesekî ku nav bajar bisekine û hûrehûr dirûv û taybetiyên bajar vebêje, belkî wekî kesekî ku ji dûr ve li bajêr binêre û derbarê wî de çend tiştan bibêje. Ev yek jî pêşiya xwendevan digire ku ruhê bajêr fêhm bike. Xuyaye, Şemo ji nêz ve bajar raçav kiribe jî wî hewl nedaye vî cihê raxîne ber çavên xwendevan.

Malbata Erebe Şemo ji bo kar peyda bikin gund bi gund geriyane. Şemo dema ku navê van gundan dide zêde ser wan nasekine. Xwendevan nizane gundekî darûber e yan hişk e. Avahîsaziya gund çawa ye? Di muxayyîleya leheng de gund çawa xwe dide der? Bersiva van pirsan kême e. Xwendevan jî zane di romanê de wekî cih gund dibore. Lê ev gund xwedî nasnameyek barbiçav nîne. Wekî mînak wiha qala gundê Azatê tê kirin: “Em hatne kêleka gundekî. Ew gund Azat bû. Merekeke tek li kêleka gund hebû. Me xwe li wê merekê girt, çûn, ketne merekê.” (Şivanê Kurmanca, r. 54.)



Ji bilî agahiyên li jorîn derbarê taybetiyê fizîkî ya Azatê de tişteke nayê gotin. Wekî cih Azat tam nayê şayesandin. Lê kêmbibe jî Erebe Şemo cih dide şayesandina cihan. Wekî mînak wiha qala gundê Alêksandrovska dike:

“Ew gund ji şêherê Qersê heft kîlometra dûr bû. Lê çî çîkî zaf kaw hatibû avakirinê, ser çemê Qerseçayê, wî welatîda idî çem ji wî çemî mezintir tune bû. Dora çem, hetta çav-çava dibîrî, mêrg-çîmenê wan bûn, notla xalîçeke xemilandî, qîz xwera bixemilînî- ussa tev tijî kulîlk dibûn; ji mêrga wêdetir zevî bûn, çargoşe, notla kvadrata şîn dikirin; cîna jî cewêd avê, nav sînorê wanra derbaz dibû. Rojêd havîna, wextê tavê dida wan cewa, şînayî û ava cewa tev dibiriqîn, te tirê- zozanêd Eledaxêne xemilîne. Piş malava jî bostanêd rinde çêkirî bûn. Li wan bostana damelegana diçand: kartol, kelemsilq, pincarê bostanayî mayîn. Biharê, wexta şînkayî bor dibû, gundê Alêksandrovska kulîlkada, mêrg- çîmanada, bostanada ussa dixemilî- meriv heyran hijmetkar bû lê binêra, ji dest bîn- bixza kulîlka, ew deşt tev te ti rê baxê sêvane bîn jê tê.” (Şivanê Kurmanca, r. 62.)

Dema ku mirov bi giştî bala xwe dide romana *Şivanê Kurmanca* em bi vî awayî bi teferrûatî şayesandin kêmbibe in. Lê di vê paragrafa dirêj de jî xuyaye Şemo gundê Alêksandrovska li gorî cihên di berfirehtir teswîr kiriye.

Dîsa di seranserê romanê de tê dîtî ku di romanê de cihên girtî kêmbibe hatine pêşkêşkirin. Piranî bûyer li cihên vekirî diborin yan jî cihê bûyerê tam ne diyar dimîne. Mîna keke cihê girtî, dema ku Şemo ji aliyê polîsan ve tê girtin derdikeve pêşberî me. Bi gotina wî em bibêjin:

“Ez dame nav xwe, birim, qe nehiştin, ez xebardim yan cîkîda bilipitim. Ez dûz anîme ber kelê. Derê kelê vekirin, ez birme heyeta kelê. Li wê derê ez rût tazî kirim, kincê min nihêrîn-tiştê cem min tunebû, xêncî kêreke rinde serîya, bi wê kêre cara lawîkê me kurmanca, serî kur dikirin. Min ku kincê xwe xwe kir, ez avîtme nava çamçîya, gellekî kutam, ez birim, avîtme kelê. Wextê ez hatme kelê, girtî pencera min dinêrî, çimkî kincê min, kincê kurmanciyê bûn: finokî sorî qotikkirî serê mi da bû, arxaliyekî oymekirî li min bû, cotê sapokê lingê minda bûn.

Ez girtî mam nêzîkî du mehan, çend roja carî gazî min dikir, dipirsîn.” (Şivanê Kurmanca, r. 149-150.)

Çawa ku ji jêgirtina jorî jî diyar e. Erebe Şemo nêzî du mehan di zindanê de maye. Lê derbarê avahiya zindanê de agahî nade xwendevan. Tenê qala hewşa zindanê dike. Behsa hundirê zindanê, ciyê ku li wir maye nake. Lewra em jî nizanin ka Şemo di zindaneke çawa de maye.

Sînorên cihên ku navê wan di *Şivanê Kurmanca* de diborin, sînoreke fireh e. Di nav vî sînorî de bakurê Kurdistanê, Kavkas û Rûsya cih digirin. Çawa ku xuyaye erdnîgariyeke pir fireh e. Romannûs dema ku romana xwe diafirînin hewl didin ku seha cih jî di berhema wan de cih bigire. Ligel vê, hinekan jî karîne ku di berhema xwe de hesta şimûlê jî bi cih bikin. Li gorî Forster, girîngtirîn xîm a hunera Tolstoy ew e ku wî kariye hesta şimûlê ya cih di berhemên xwe de bi cih bike.<sup>178</sup> Gava ku mirov bala xwe dide *Şivanê Kurmanca* em wê hesta şimûl a cih baş hîs nakin. Her çiqas sînorên cihê romanê fireh bibe jî Şemo di ser wan re serobero boriye. Dirûv û ruhê cih tam nezêlal e. Hew te dît di romanê de cih xwe dide der û hêj geş nebûyî ji holê radibe. Wisa xuyaye ku Şemo demeke dirêj li Tîblîsê maye. Lê di romanê de Tîblîs tenê wiha cih digire:

“Bilêta xwe min stand hetat Tîlbîsê. Şeherê Tîlbîsê min nas dikir. Berê ez du sala li şeherê Tîlbîsê, kûça Anastasîyêvskê No 11, mala gênêral Vasîliyêv bibûme dvornîk. Maşênîyêda du, sê ûris bûne nasê min. Evana jî ber bi malê xwe diçûn. Ewana ji Stavropolê bûn, gundê wan nêzîkê wî şeherî bû...”

Îdî ketibû meha havînê ortê, em jêre dibên meha temûzê 1917-salê. Ez ji wana idî veqetîyam, orta min wan zaf rind çêbû. Li şeherê Tîlbîsê em hindik man, her me xwera nan kirî, em ketne maşînê, dîsa çûn.” (*Şivanê Kurmanca*, r.160.)

Diyar e ku Şemo li Tîblîsê du sal di malekî de wekî paqêjker xebitiye. Qet qala bajar û jiyana xwe ya li wir nake. Di ser re gav avêtiye. Bi vî awayî gelek cih di romanê de diborin.<sup>179</sup> Nav hene, lê peywendiya lehengan bi cih re sist e.

Gorkî jî wekî Şemo li gelek cihên cuda geriyaye û maye. Cihên ku Şemo dem borandiye giranî gund in, lê Gorkî piranî li bajaran maye. Lê Gorkî jî wekî Şemo li gund jiyaye û qala wir kiriye. Dema ku em bala xwe didin jiyana Şemo em dibînin ku ew bêhtir li cihên vekirî maye. Lê Gorkî zêdetir jiyaneke hundurî

<sup>178</sup> Forster, *h.b.*, r. 77-78.

<sup>179</sup> Qers, Sarî-Bilax, Sarîqamiş, Stravpol, Dîgor, Emançair, Vladîkavkaz, Astraxan, Rewan...

borandiye. Şemo di zaroktiya xwe de li çiya banî bûye. Lê ji Gorkî re gelek caran derketina derve jî qedexe bûye: “Dê biçe ji xwe re piçek bigere! Lê xwe şaş nekî dernekevî kolanê ha, tu dikarî li hewş û baxçeyê ji xwe re bigerî...” (Zaroktiya Min, r. 89.) Lewra Gorkî li gorî Şemo bêhtir cih daye şayesandina mekanên hundirî:

“Salona mezin a vala pir bêhna min teng fikir. Di navbera pencereyên wî de tu neynik hebûn, li dîwarên wî tabloya “Zeviya Misirê” aliqî bû. Cotek maseya listinê û kursiyên stûr yên macaran hebûn. Salona biçûk bi mobilyayên hûr, eşyayên “çeyîzê”, dolabên bi taqimên çayê û eşyayên zivî têrûtijî bû. Ev salon bi sê avîzeyên ji hev mezintir hatibû zînetkirin. Di odeya razanê ya tarî ya bêpencere de karyolaya mezin a razanê, sandoq, qûtî hebûn ku ji wan bêhna titûn û beybûnê dihat. Ev her sê ode her dem vala diman. Kilfetên malê di oda xwarinê de bi awayekî ser hev rûdiniştin.” (Di Nav Insanan De, r. 71.)

Gorkî di gelek cihên romanên xwe de hestên xwe yên derbarê cih de tîne ziman. Di hinek cihan de jî di navbera leheng û cih de têkilî datîne:

“Wê bi ken got, ‘Cureyekî nexweşiyêke sinirî bû’.

Tê bîra min, min dixwest ew rewşa xwe bi awayekî cudatir vebêje. Ji bo keçeke wiha, nexweşiya sinirê zêde normal dima, lewra di odeyêke wiha ecêb de dima ku ka ji mirov e, eşyayên odê ji tirsan xwe kêşane dîwaran. Li koşeyê li ber îkonan lembeyeke pir geş vexistî bû û siha zîncîra vê lembeyê li ser pişgîra maseya xwarinê digeriya...” (Zanîngehên Min, r. 36.)

Tê dîtî ku Gorkî li vê derî di navbera leheng û şayesandina cih de peywendiyek daniye. Teswîra ciheke girtî dike û wî cihî wekî pênaseya leheng derdixe pêş. Ev yek di Şemo de zêde nakeve ber çavên me. Gorkî di şayesandina cihên vekirî de jî li gorî Şemo bi hûrgilî agahî dide:

“Ji gotinên xalê min tirseke mezin ketibû dilê min. Lê ji ber peywira ku dapîra min dabû min gelekî kêfa min hatibû. Ez revîm jorê li ber pencerê û li wir rawestiyam. Ewreke tozê ketibû ser kolana fireh. Ji nav ewra tozê kevirên mezin ên keva rê wekî werimî dixuyan. Kolan ber bi milê çepê dirêj dibû, di ser newalê re diborî heya girtîgehê dirêj dibû (di şeklê vê bîne de tiştêkî xweş, xemgîniyê hebû) ev girtîgeha bajar a kevin li Meydana Ostrojnî bû. Ev girtîgeh li ser zemîneke kîlê ava bibû û ji her çar milên wê bircên wê bilind dibûn. Kolana rastê, sê xanî piştî mala me,

jî derdikete Meydana Sennaya ku derdora vê qadê bînayên leşkerên girtîgehê û yên îtfaiyeyê hebûn. Di cihê mezin ê raçevkirina bircê de her dem nobedarek hebû. Ev kes wekî seyekî zincîrkirî her dem li derdora xwe diziviriya. Her milê qadê bi çalan tîjî bûn. Yek ji van çalan bi avake şîn tîjî bû. A rastir, awayî ku dapîra min gotî, ev Lîça Dyokuvê bû ku rojê zivistanê xalên min di qulileke wê ya qeşayî re bavê min avêtine hundirê wê. Hema hema li hemberê pencereyê kolaneke navber hebû ku di her du milên wê xaniyên biçûk rêz bibûn. Li dawiya vê kolanê dêra nizim û fireh a ‘Hewariya Sêyî’ hebû. Gava ku we di navbera hişînahiya baxçeyan re rast lê dinêrî, we kubbeya dêrê wekî kayikeke berevajî razandî didît.” (Zaroktiya Min, r. 102.)

Li jorê hate gotin ku Erebê Şemo li bajarên wekî Sarîqamiş û Tîblîsê demeke dirêj dimîne. Lê di romana xwe de cih nade peywendiya xwe û bajêr. Maksîm Gorkî behsa kolan û jiyana li bajêr dike. Jiyana bajêr raçav dike. Gorkî peywendiya xwe ligel bajêr di cihekî romana xwe de wiha aşkere dike:

“Di bin stêrkên zivistanê de gerîna li kolanên xalî yên bajêr, gelekî alema min a xeyalan zengîn dikir. Bi taybetî ez diçûme kolanên ku ji navenda bajêr dûr in. Li navenda bajêr gelek lembe hebûn û dibe ku nasên patronê min ez bidîtima. Wê çaxê jî dê patron bizaniya ku ez neçûme ayîna êvarê û derketime gera kolanên. Ez ji serxweşan, nobedaran û “keçên kolanên” aciz dibûm. Di kolanên derî bajêr de pencereyên malên jêr eger cemed negirtibûna û perde li ber wan tunebûna, min dikariya di pencereyan re hundirê malê bidîta.” (Di Nav Insanan De, r. 95.)

### 3.4.3. Dem

Dem yek ji hêmanên girîng ê romanê ye. Lewra dem, bûyerên ku di romanê de diqewimin piştrast dike û bi saya demê silsileya bûyeran di hişê xwendevan de wekî rastî xwe dide der. Vegêran (narration/anlatı) yanê “sîstema ku hatiye afirandin” di nav demê de tê meşandin. Nabe ku romanek destê xwe ji demê şûştibe. Bi awayekî dem xwe di romanê de aşkere dike. Dem di romanê de bi sê awayan dikare bê nîşandan. Di awayê yekem de dema bûyerê tê dayîn: “Min gura firqê kir, biharê, 1924-salê ez hatme Rewanê, wekî nava kurmanca bixebitim.” (Şivanê Kurmanca, r. 188.), “Mîting kutta bû, nêzîkê seheta 6-10-a” (Şivanê Kurmanca, r. 149.), “Qers ketîye bin bandûra Êrisête pey şerê 1877-1788 salê.” (Şivanê Kurmanca, r. 118.), “Ketibû meha nîsanê 1918-s.” (Şivanê Kurmanca, r. 178.) Di awayê duyem de dema bûyerê çiqas domiyaye tê dayîn: “Xulamtiya min zivistanê

pak bû. Bihar hat, min îzna xwe ji axê xwe xwast, wekî ez herme mal.” (Şivanê Kurmanca, r. 78), “Du-sê roja şunda seydayê û qîza xweva digeriyan, hatin nêzikê xaniyê me.” (Şivanê Kurmanca, r. 85.), “Saltira dinê me bar kir, hatne Qereqela Baro.” (Şivanê Kurmanca, r. 111.), “Ev sê-çar sal bûn ser hev, me bin destê firqa Bolşevîka, bi serkariya Bolşevîka dikire şer.” (Şivanê Kurmanca, r. 187.) Di awayê sêyem de dem bi sergirtî tê dayîn: “Ew welatê Romeyî eskerê Êris zevt kiribû, riat tijî têda hebû.” (Şivanê Kurmanca, r. 132.), “Mehê sebatê, wextê padşa ser text avêtin, deng dereng gihîşte me, me pak nizanibû, lê idî ew yek bere-bere aşkera bû.” (Şivanê Kurmanca, r. 148.), “Gvardîya sor jî hêdî-hêdî zêde dibû. Esker ji şer direvîya, dihat. Li gunda tevî silhe bû. Hergav ji Bolşevîka merî wekîl diçûne gunda, agîtasiya dibirin. Gelle cîya dest pê kiribûn, erdê milkdara jê distandin. Li gundanda kara şer dibû.” (Şivanê Kurmanca, r. 162.) Tê dîtin ku di *Şivanê Kurmanca* de her sê bikaranîna demê jî dixuyin.

Bi gelemperî roman bi devê Ereba yanê bi devê kesê yekem tê vegotin. Lewra di piraniya romanê de dema ku tê vegotin dema bûyerê ye. Lewra di navbera bûyer û demê de valahî çênabe. Dema ku di romanê de tê dîtin kêma zêde ji çêbûna Ereba Şemo dest pê dike û heta sala 1924an didome. Yanê teqrîben di romanê de qala 22-30 salan tê kirin. Mîrov kêma zêde dikare demên ku di romanê de diborin di bin banê 5 beşên sereke de rêz bike: Beriya çêbûna Şemo, zaroktiya wî ya di gundan de, salên wergêriyê, di nav refên partiyê de û propogandaya di nav kurmancan de.

Lê di romanê de “dema vegotinê” jî tê bikaranîn. Di van deman de bûyer yan jî devê Ereba Şemo yan jî ji devê lehengekî/e dî tê vegotin. Lê dema bûyerê û dema vegotinê ne heman dem e. Di *Şivanê Kurmanca* de dem, bi dema vegotinê dest pê dike û di gelek cihên romanê de dema vegotinê hatiye bikaranîn. Wekî mînak; bavê Ereba Şemo dest bi vegotinê dike: “Êvar bû. Baraneke hûr dibarî. Bakî sar jî pêra dihat. Ez zarava, em şil bibûn û serma dikir: Em hatne kêleka gundekî. Ew Azat bû. Mereke tek li kêleka gund hebû. Me xwe li wê mereke girt, çûn ketne merekê...” (Şivanê Kurmanca, r. 54.) Yan jî gundiyeke vedibêje: “Egît-begê ez talan kirim, tiştê ber derê min nema, her ma du bizinê min, guhdirejêke min û pênc serî kulfet. 3-heb zarê hûr bûn...” (Şivanê Kurmanca, r. 190.) Di van mînanan de jî dixuye ku bûyerên ku tînin qisetkirin di paşî de maye. Lewra jî bûyer bi rêka dema vegotinê tînin vegotin.

Roman bi devê sêyem/vegêrê serdest dest pê dike û lewra jî bûyer di dema vegotinê de hatiye pêşkêşkirin: “Şemo kurmancekî kesîb bû, ji êla Hesena (Hesenîya) bû. Diçû ber dewarê xelqê, li qeza Surmeliyê berê ew qeza tev welatê rewanê bû...” (Şivanê Kurmanca, r. 53.) Diyar e ku Erebê Şemo neqla serboriya bavê xwe ya beriya çêbûna xwe dike. Piştê dibêje ku bavê wî bi diya wî re zewiciye û ew ligel du xwişkên xwe ji diya xwe çêbûye. Piştî paragrafa ku dibêje ez ji diya xwe welidîme, dest bi qalkirina rêçberiya malbatê dike. Yanê di çar rûpelên pêşîn ên romanê de dem diçe ser dema beriya Erebê Şemo, zewaca dê û bavê wî, çêbûna wî û rêçberiya malbatê. Tê dîtîn ku dem gelekî zû ji ber çavên me dişemite. Di *Şivanê Kurmanca* de dem wekî blok bi blok hatine dayîn. Di rûpelekê de yan jî di çend rûpelan de demên ji hev dûr li piştê hev hatine rêzkirin. Di navbera deman de sedem-encam xurt nîne û têkiliya dem-cih jî sist e. Mînak:

“Bavê min hevekî ker bû, serda zêde kir got:

-Ewî roja ew kaxêz dane min, tu eynî rojê zar bûyî...

Bi vî tihêrî mêtîrika emrê min bû 23-oktyabrê sala 1898. Kurmancî em vê mehêra dibên meha ‘çirîya pêşîn’.

Bihar hat, idî belekî ketne erdê. Me jî karê xwe dikir, wekî ber bi gundekî dinê herin.” (Şivanê Kurmanca, r. 93.)

Ev jêgirtin di beşa “Hukum” de cih digire. Beşa “Hukum” ku di romanê de ji rûpela 92yan dest pê dike 95an diqede ji bo vê angaştê me di cih de ye. Beş bi biryarek dest pê dike ku derheqê bavê Erebê Şemo de hatiye girtin. Ev biryar ji nişkê ve ketiye nav berhemê. Yanê beriya vê beşê derbarê wê de tiştê nehatiye gotin. Piştî meseleya biryarê tê gotin, em pê dihesin ku Erebê Şemo xwestiye roja çêbûna xwe bi xwendevan bide diyarkirin. Lewra roja biryarê û rojbûna wî heman roj in. Piştî ku dibêje ew roj roja rojbûna min e, vê meselê ji nişkê ve digire û diçe ser mesela koça malbatê. Herikîna demê bi tundî hatiye birîn. Yanê du paragrafên ku dû hev in, ji aliyê dem û cih ve ji hev dûr in û pevgirêdana wan qet tune. Du demên cuda wekî du blokên cuda li piştê hev hatine rêzkirin. Ev rêzeblokên deman ji sernavên beşan jî diyar in. Ka ji mirov e, her beşeke *Şivanê Kurmanca* wekî blokeke demî ya cuda hatiye sazîkirin û ev blok li piştê hev hatine rêzkirin.

Maksîm Gorkî wekî Şemo di berhemên xwe de tam cih nedaye dema bûyerê. Yanê em di romanên wî de wisa rasterast li demê rast nayên. Lê helbet dem bi her du awayên di yanê ji hêla domdariyê û veşartî ve di gelek cihên romanên de hatine bikaranîn. Ji aliyê domdariyê ve dem: “Piştî demeke kurt min dikariya Zebûr beş bi beş bixwenda.” (Zaroktiya Min r. 90.), “Dapîra wî ji sibe heya êvarê bi gel Tufayev û xizmetkara odayê ya qelew, bêdeng, xîlaç re karên malê dikirin.” (Di Nav Insanan De, r. 200.), “Ev demeke dirêj bû ku ez jî pê hesiyabûm. Ev kar li gorî min nebû.” (Zanîngehên Min, r. 77.) Gorkî bi awayekî veşartî jî cih daye demê: “Dema ku her du bira ji malê derketin, xanimên malê ji min re gotin semawerê vêxe û çûne ber pencerê. Lê tam wê wextê patron li zîla deriyê derve xist, bêdeng lezelez ji merdîwenan derket, deriyê holê vekir. Bi dengê tijî got ‘Çar hate kuştin’.” (Di Nav Insanan De, r. 190.)

Berhemên Gorkî ji devê wî tên vegotin. Lewra wekî *Şivanê Kurmanca* di berhemên Gorkî de jî di giraniya romanê de dema bûyerê û dema vegotinê heman dem in. Her sê romanên Gorkî jî bi dema bûyerê dest pê dikin. Lê di gelek cihên romanê de dema vegotinê jî cih digire. Di romanên Gorkî de dema vegotinê piranî caran ji aliyê lehengên di ve tê bikaranîn. Kêm be jî ji devê Gorkî jî hatiye bikaranîn:

“Dema ku bavê min neh salî bûye diya wî miriye, piştî bavê wî jî miriye. Gundiyekî bavê min hildaye li ba xwe. Gundî xirat bûye. Mirovê gundî bavê min qeydî atolyeya bajarê Permê kiriye. Dest bi hînkirina pîşeya xwe kiriye. Lê bavê min ji mala wî reviyaye. Ligel parsekên kor li bazaran geriyaye. Di şanndeh saliya xwe de hatiye Nîjnîyê. Di keştiya mirovekî bi navê Kolçîn de dest bi xebatê kiriye. Ev kes avahîçêker bûye. Di emrên xwe yê bîstî de bûye hosteyekî qenc ê mobilyayê, boyaxkerê mobilyayê, pêçandina mobilyayê. Atolyeya ku bavê min lê dixebitî, li kêleka xaniyê bapîrê min bûye.” (Zaroktiya Min, r. 208.)

Çarçoveya demê ya ku di berhemên Gorkî de tê qisekirin ji ya *Şivanê Kurmanca* dirêjtir e. Di *Şivanê Kurmanca* de dem çend salek beriya çêbûna Şemo dest pê dike û heta temenên wî yê bîst û şaş salî diçe. Di *Zaroktiya Min* de dem ji 5-6 saliya Gorkî dest pê dike, lê dûmahiya romanê dapîra Gorkî qala nasîna xwe û bapîrê wî; qala dê û bavê wî, zewaca wan ji wî re dike. Romana dawî ya sêbareyê *Zanîngehên Min* jî di temenên Gorkî yê 18-20î de diqede. Yanê çarçoveya demê ya

romanên Gorkî ji ya *Şivanê Kurmanca* piçek firehtir dibe. Lê çawa tê dîtin Şemo kême zêde qala 26 salên xwe dike, lê Gorkî qala qasî 20 salan dike. Her çend me gotibe Gorkî cih daye jiyana berî ya dapîr û bapîrên xwe, dê û bavên xwe jî ev di romanên de 10- 20 rûpel jî nagirin. Şemo 26 salên xwe di 155 rûpelan de vegotibe. Lê wergerên her sê romanên Gorkî bi qasî 862 rûpel girtine. Gorkî di *Zaroktiya Min, Di Nav Insanan De, Zanîngehên Min* de qala derdorê bîst salên xwe kiriye. Ji hejmarên jorî diyar dibe ku Gorkî di romanên xwe de li ser demên jiyana xwe bêhtir sekiniye.

Di berhemên Gorkî de dem wekî ya di *Şivanê Kurmanca* de lezelez naguhere. Dumdariya demê dirêjtir û tîrtir e. Dem wekî di *Şivanê Kurmanca* de ji nişkê ve nayê qutkirin. Rabitayên di navbera deman de li hev bestî ne. Em nikarin bibêjin demên di romanên Gorkî de wekî *Şivanê Kurmanca* ji blokên deman pêk hatine. Di navbera wan de herikînek dixuye.

#### 3.4.4. Rewşa Vegêr

Hemû berhemên ku li ser vegotinê ava dibin di bingeha xwe de ji du hêmayan pêk tên: “Vegêr” û “tiştê tê vegotin”. Yanê “çîrokbêj” û “çîrok”. Vegêr ew kes e ku di navbera nivîskar û xwendevan de dibe navbeynkar.<sup>180</sup> Vegêr, ji xwendevan re qala bûyer, diyarde û rewşên di romanê de dike. Yanê xwendevan, jiyana afirandî ya berhemekê bi riya vegêr dinase. Bi gotineke di her dem di navbera berhema afirandî û xwendevan de vegêr cih digire. Ew kesê/a ku dibîne, dibihîze, diaxive dide nasîn. Bi kurtî hêmayek e ku vegêrana berhemê pêk tîne. Di hunera romanê de bi qasî diyarkirina tîpolojiya vegêr, pozîsyon û peywira vegêr jî girîng e. Pozîsyona vegêr di romanê de bi gelek awayan derdikeve li hemberî me. Lê çawa ku Wood jî îşaret kiriye ji wan sê lib sereke ne: şexsê sêyem, şexsê yekem û mînakên serkeftî yên wê kême bibin jî şexsê duyem.<sup>181</sup> Erebe Şemo ji van vegêrê piranî kesê yekem bi kar aniyê. Erebe Şemo di romana xwe de cih daye vegêrê kesê yekem û kesê sêyem. Ji ber ku *Şivanê Kurmanca* berhemeke otobiyografîk e, di piraniya romanê de kesê yekem hatiye bikaranîn.

<sup>180</sup> Alan, *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebiyata Modern*, r.117.

<sup>181</sup> James Wood, *Kurmaca Nasıl İşler?*, wer. Ekin Bodur, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2010, r. 17.



“Ez çend rojada silametî hatim, derketme Sarî-Bilaxê. Rojê ez rê dihatim, şevê jî min xwe dida birekêd zinara bilind, pelêd kevira tijî dora xwe dikirin, wekî dabe li min derkevin, ez dabara bi wan kovirava têem şer. Ji Sarî-Bilaxê jî derbazbûm, çûme Qizneferê, mala Sefo. Mêrê meta min qet ez nattibûm. Her gava û rênçberê mayîn dihatin, salixa min jêra didan, wekî ez dixûnim û xortekî serwaxt ji min dertê. Mêrê meta min ez birme hundurê malê, bi eşq bi dil hate rûyê min, pirsra mala me tevî kir, min yeko-yeko jêre got. Ewî ji min pirsî derheqa xwendina min, min jêra gilî kir, çawa xwend, çawa ser zavoda pênzê dixebitîm. Wextê min gilî kutta kir Sefo, mêrê meta min, ji min pirsî:” (Şivanê Kurmanca, r. 125.)

Ligel bikaranîna vegêrê kesê yekem di *Şivanê Kurmanca* de vegêrê kesê sêyem jî hatiye bikaranîn. Dema ku em bi giştî li romanê dinêrin bikaranîna vegêrê kesê sêyem kême e. Jixwe di berheman de bi hev re bikaranîna van her du vegêran asayî ye. Gelek nivîskarên di heman berhema xwe de cih dane her duyan jî. *Şivanê Kurmanca* bi vegêrê sêyem dest pê dike:

“Şemo kurmançekî kesîb bû, ji êla Hesena (Hesînîya) bû. Diçû ber dewarê xelqê, li qeza Surlîyê berê ew qeza tev welatê Rewanê bû. Wextê jina wî pêşîn mir, ewî herdu kurê xwe Biro û Dewrêş hildan û ji qeza Surmeliyê derket, lêda çû. Şemo rêda gelle çetînî dîtîn, çimku barbirê wî tunne bû, -ewî herdu kurê xwe hildigirtin, yek dida piştî xwe, yê dinê jî dida ber dilê xwe- Biro wî çaxî sêsalî bû, lê Dewrêşî hê du salî bû. Qet tiştêkî wî idî tunne bû, xên ji lihêfeke kevin.” (Şivanê Kurmanca, r. 53.)

Ji bo berhemên otobiyografîk pozîsyona kesê yekem di cih de ye. Lewra lehengê/a sereke ya berhema otobiyografîk nivîskar bi xwe ye. Bi vê pozîsyona xwe nivîskar dikare jiyana xwe û ceribandîna xwe esas bigire û wekî kesekî rastî yê jiyane bi xwendevan re bi awayekî jidil, bawerker û germ bikeve nav têkiliyê.

“Ez jî birme aliyê kuxnîyê, wêderê nan dane min. Berdestîya wan –yeke qaline sûretsorê tijî-tarêlka sûpê tijî kir, anî, da ber min, kêleka tarêlka mine sûpê danî kevçîk, kêr û vîlkek. Ez dîsa ecêbmay mam, min nizanibû bona çi ew kêr û vîlkek, anîne danîne ber min. Ez va duşurmîş bûm, min hew zanbû- ev kêr û vîlke ya lîstika zarane, pêşkêş dane min. Li gundê meleganada min vîlkê mezin dîtibûn, yê ku melegan pê gîha top dikir, pê dixebitîn. Ev vîlke hûr, min tire, yê lîstika zarane û gelekî min wan vîlka hizkir, tev ussa dibiriqîn, te digot, zîve anîne, danîne ber min. Ji

şabûna lingê min erdê nediket. Min ku anê xwe bi kevçî xwar, ji ser texterabûm, min kêr û û vîlke hilda, kêre cêwa xwe. Berdestîya sûret-sore tijî, ya ku çavê xwe ji min bersedida, li min nihêrî, dît, çewa min aşkela ew kêr kêr û vîlke hilda, kire cêwa xwe, çû gote xweyê malê. Xweyê malê hate kûxnê, wa li min nihêrî, lê derheqa vîlkê û kêrê tişte negot, her ji min pirs kir, -ezî hazirim, rêkevim, vegerim, herim yan na.” (Şivanê Kurmanca, r. 81-82.)

Di vê pasajê de serlehengê romanê nivîskar bi xwe, bi pozîsyona vegêrê leheng serboriyêke xwe vedibêje. Ji bo ku bûyer di serê nivîskar bi xwe de boriye, ceribandina xwe bi zelalî qala xwendevan dike. Li hemberî vê qalkirina zelal û jidil dilê xwendevan li leheng germ dibe. Xwendevan di navbera xwe û leheng de peywendiyek datîne. Ligel vê derfetê, pozîsyona vegêrê leheng di xwe de hinek kêmasiyan jî dihewîne. Di nav van kêmasiyan de sînardariya nêrîna leheng di serî de tê. Nivîskarekî ku ji bo berhema xwe pozîsyona vegêrê leheng hilbijartiyê, naveroka berhema xwe bi jiyana, zanîn, dîtî û şîroveyên lehengekî/ê diafirîne. Ev yek jî derfetên vegêranyê teng dike. Nivîskar ji bo ku xwe ji vê bertengiyê xilas bike dikare hinek riyana hilbijêre. Wekî; lehengê/a xwe bike xwedî şiyaneke têrûtêjî, ligel lehengê sereke cih bide hinek lehengên çavdêr û ji derfetên name û bîrname sîd werbigire. Erebe Şemo di *Şivanê Kurmanca* de wekî serleheng cih digire û ji bo ku şiyana berhema xwe bi hêztir bike, ji derfetên jorê îstîfade nake. Her çend di beşa dawî ya romanê de dora axaftinê bide hinek kesên dî jî bi giştî di romanê de ev yek nehetiyê ceribandin. Şemo di romana xwe de cih nade name û bîranînê. Wekî serlehengê romanê, bi xwe jî bi çaveke hûrgilî û berfireh serboriyên jiyana û rewşa serdemê ranaxîne ber çavên xwendevan. Bûyerên jiyana xwe ya 26 salan bi kurtî di 155 rûpelan de cih dike.

Wekî *Şivanê Kurmanca* her sê romanên Gorkî jî bi vegeerê kesê yekem û vegeerê kesê sêyem hatine vegotin. Ji ber ku *Zaroktiya Min, Di Nav Insanan De, Zanîngehên Min* jî wekî *Şivanê Kurmanca* otobiyografîk in giraniya wan bi vegeerê kesê yekem hatine vegotin:

“Piştî çend rojan ez, diya min û dapîra min di keştiyekî de di nava kamarayekê teng de bûn. Birayê min ê nû welidî, miribû. Li koşeya odê li ser masê dirêjkirî bû. Qûndaxa wî ya spî bi tayeke sor hatibû girêdan. Ez derketibûm li ser sandoqan, min di pencereya girovel a wekî çavê gayê derbûyî re li derve dinêrî. Li

piştî cama şil, behra bi kev bê navber ber bi pişt ve diherikî. Carinan li camê diket. Ez ditirsiyam, min xwe bi paş de diavêt.” (Zaroktiya Min, r. 15)

Dema ku em berhemên Gorkî yê *Zaroktiya Min, Di Nav Insanan De, Zanîngehê Min* dixwînin, em wisa hîs dikin ku nivîskar pir ji dil, bê mesafe jiyannameya xwe ji me re vedibêje. Çawa ku hate gotin, bandora vegêra kesê yekem ser vê yekê girîng e. Nivîskar di gelek cihên berhemên xwe de ka ji me ye, li ber me ye û hest û razên xwe ji me re dibêje: “Heta wê şevê min şadiyeke ewqas hîs nekiribû. Xwestina min a borandina hemî jiyana xwe di nav vê kelecaniya nîvdîn de rihê min ronî dikir.” (Zanîngehê Min, r. 32.)

Di berhemên Gorkî de vegêrê sêyem ne ji zimanê wî ji zimanê lehengên dî tê pêşkêşkirin. Gelek caran çîrok û bûyerên berê bi vê vegêrê tê vegotin:

“Lê, Diya Xwedê a dilovan toxmê her tiştî berê di selika xwe de veşartibû. Piştê wê ji rojê rica kir: Dinyayê ji serekî heta serê dî ziwa bike. Ji bo vê, dê mirov qedrê te bilind bikin! Rojê dinya ziwa kir, wê jî toxmên ku veşartibûn li her derî reşandin. Xwedê dît ku dinya ji nû ve bi giya, ajal û mirovan geş dibe!... Dibêje kê karî li dijî hêza min derket û ev yek pêk anî. Wê wextê diya wî li xwe mikûr hat û got ku min kiriye. Jixwe Xwedê jî ji valamayîna dinyayê xemgîn bibû. Wiha ji diya xwe re got: Te qenc kiriye!” (Di Nav Insanan De, r. 62.)

Di *Şivanê Kurmanca* de carinan vegêrê sêyem bê leheng hatiye bikaranîn. Em pê dihesin ku ew deng jî dengê nivîskar bi xwe ye. Lê Gorkî vegêrê sêyem bi rêka lehengan pêşkêş dike. Ev yek jî cudahî têxe navbera vegotina wan. Me li jorê gotibû ku *Şivanê Kurmanca* bi pozîsyona vegêrê leheng hatiye pêşkêşkirin. Heman awayî *Zaroktiya Min, Di Nav Insanan De, Zanîngehê Min* jî bi pozîsyona vegêrê leheng hatine vegotin. Lê di navbera wan de cudahiyeke heye. Me li jorê gotibû ev cure vegêr hêza vêgêranê qels dike. Nivîskar dikare hinek rêbazan bi kar bîne da ku hêza vegêrana berhema xwe bilind bike. Yek ji van rêbazan ew e ku nivîskar cih bide lehengên çavdêr. Me li jorê gotibû ku lehengên Gorkî ne wekî yê Şemo bédeng in. Lehengên Gorkî di giraniya romanê de xwedî dengê xurt in. Wisa diyar e ku Gorkî xwestiye berhemên xwe bi çavdêriya van lehengan xurtir bike. Di romanên xwe de ji bilî dengê xwe, dengê lehengên dî jî bilind kiriye. Lê Gorkî jî wekî Şemo ji

bo ku qelsiya pozîsyona vegêra leheng ji holê rake, cih nedaye rêbazên name û bîranînê.

### 3.4.5. Rêzebûyer

Bala me hemûyan kêşaye ku cureyên wekî roman û çîrok ku ser vegêranê ava bûne, zêdetirîn ji hêla xwe ya çîrokbêjiyê ve di hişê me de dimînin. Di navenda hemû roman û çîrokan de çîrokek heye ku ji rêzebûyeran pêk tê. Li gorî Forster, çîrok bîngeha romanê ye. Li gorî wî eger di romanê de çîrok tunebe roman jî tune ye.<sup>182</sup> Ev çîrok jî ji rêzebûyeran pêk tê. Di navbera van bûyeran de têkiliya sedem-encam heye. Yanê bûyer ji hev qutbûyî nînin, bi hev ve girêdayî tînin honandin. Forster cudahiya çîrok û rêzebûyerê wiha rave kiriye: “Eger mirov bibêje: ‘Keya mir, piştê jî keybanû mir.’ ev dibe çîrok. Lê mirov bibêje: ‘Keya mir, piştê ji kerba wî keybanû jî mir.’ ev dibe rêzebûyer.”<sup>183</sup> Tê dîtin ku di navbera bûyeran de sedem-encam heye.

*Şivanê Kurmanca* ji rêzebûyera yekzincîrî hatiye afirandin. Di navenda bûyeran de Erebe Şemo cih digire. Bûyer û leheng her derdora wî diçin û tînin. Lê bi geneeta me, her çiqas romana *Şivanê Kurmanca* ji serî heta dawî ji serboriyên Erebe Şemo hatibin avakirin jî rêzebûyereke xurt di romanê de naxuye. Dem tê wekî beşên destana Siyabend û Xecê yan jî di destpêka romanê de serboriya bavê wî dikeve nav rêzebûyera romanê. Pevgirêdana van beşan bi rêzebûyerê re sist e. Baştirîn mînak dibe ku di beşa “Merkeba me. Rêçberîya nava melegana” de ye. Ber bi dawîya vê beşê Şemo qala Cewoyê Pîr-Kal dike. Dibêje ku hevalê bavê wî bûye û navbera Cewo û zarokan baş bûye. Carinan ji wan re çîrok vegotiyê. Heta vê derê rêzebûyer li pey hev diherike. Lê Şemo digire, dibêje ku ew kes hêj sax e û li Axbaranê dijî. Dest bi vegotina rasthatina xwe ya piştî salan ya bi Cewo re dike. Ji zaroktiya xwe gav diavêje ciwaniya xwe. Di vê rewşê de rêzebûyer yekcar xira dibe.

Çawa ku berê jî hate gotin *Şivanê Kurmanca* di bin beşan de hatiye saz kirin. Ev beş her çend di nav xwe de ji aliyê rêzebûyerê ve di nav hevgirtinek de bibin jî, di navbera beşan de ev hevgirtin xurt nînin. Tiştên ku di beşa berê de hatibin gotin li paş dimînin. Pevgirêdana wan, domdarî û bandora wan a ser beşa pêşîya xwe nakeve ber çavê me. Dawîya beşa “Li şherda. Şerê împêrîalîsta” wiha ye:

<sup>182</sup> Forster, *h.b.*, r. 64.

<sup>183</sup> Forster, *h.b.*, r. 128.

“Rêda kete bîra min wekî li Sarî-Bilaxê (Tendûrekê) gundê Qizneferê mêrê meta mine. Helal dimîne. Ez şa bûm, min lingê xwe sivik avêtin, wekî zû bêm, derkevme Tendûrekê. Berêda ez hînî çolê bibûm. Rojê qe xema min nînbû, her şevê tirsra min ji daba bû.” (Şivanê Kurmanca, r. 124.)

Piştî dawîbûna vê beşê, beşa “Dilketin û destnîgarî” wiha dest pê dike:

“Ez çend rojada silametî hatim, derketme Sarî-Bilaxê. Rojê ez rê dihatim, şevê jî min xwe dida birekêd zinara bilind, pelêd kevira tijî dora xwe dikirin, wekî dabe li min derkevin, ez dabara bi wan kovirava têm şer. Ji Sarî-Bilaxê jî derbazbûm, çûme Qizneferê, mala Sefo. Mêrê meta min qet ez nedîtibûm. Her gava û rênçberê mayîn dihatin, salixa min jêra didan, wekî ez dixûnim û xortekî serwaxt ji min dertê. Mêrê meta min ez birme hundurê malê, bi eşq bi dil hate rûyê min, pirsra mala me tevî kir, min yeko-yeko jêre got. Ewî ji min pirsî derheqa xwendina min, min jêra gilî kir, çawa xwend, çawa ser zavoda pênzê dixebitîm. Wextê min gilî kuta kir Sefo, mêrê meta min, ji min pirsî.” (Şivanê Kurmanca, r. 125.)

Her çend destpêka beşan bi dawîya beşa beriya xwe ve hatibe bestîn jî ji aliyê bûyer ve pevgirêdaneke wan a sedem-encam nakeve ber çavan. Şemo di rê de neçar dimîne û ji nişkê ve gundê meta wî tê bîra wî. Şa dibe û gavên xwe dilezîne. Şevan ji êrişa heywanan ditirse. Dema ku dest bi beşa nû dike gav diavêje ser xwendevaniya xwe û hal û rewşa malbata xwe. Êdî qala zoriyên rêwitiya xwe nake. Di rêwitiyê de şevan ji tirsan ranaze. Şeva ku ew gihîşte mala meta xwe gelo dema ku raza çî hîs kir qet nabêje. Eger bigota min li mala meta xwe xeweke xweş kir dê di navbera beşan de peywendîyeke xurt çêbûya.

*Zaroktiya Min, Di Nav Insanan De, Zanîngehên Min* jî ji rêzebûyera yekzincîrî hatiye afirandin. Di navenda bûyeran de Maksîm Gorkî cih digire. Bûyer û leheng her derdora wî diçin û tên. Her çiqas lehengên Gorkî li gorî yên Şemo berbiçavtir bibin jî, car bê rûpel ser hev ji bo nasîn û jiyana wan bên veqetandin jî, dîsa di navenda romanên de Gorkî cih digire. Rêzebûyera *Şivanê Kurmanca* û ya *Zaroktiya Min, Di Nav Insanan De, Zanîngehên Min* rengê hev didin. Lewra her du nivîskar jî rêzebûyerê ji zaroktiya xwe didin dest pê kirin û ber bi ciwanîyê ve tînin. Bûyerên ku di rêzebûyerê de cih digirin li gorî mezinbûna wan diherikin. Lê di navbera honandina rêzebûyera her du nivîskaran de hinek cudahî hene. Wekî mînak;

Şemo agahiyên derbarê bavê xwe de di serî romana xwe de dide. Agahî ji devê Şemo tê dayîn. Gorkî romana xwe *Zaroktiya Min* ji xwe dide dest pê kirin. Agahiyên derbarê bavê wî de ber bi dûmahika romanê, ji devê dapîra wî tê dayîn. Jixwe tşkiliya Gorkî û dapîra wî pir xurt e. Di navbera xwe de gelek tiştan parve dikin. Dapîra wî ji wî re gelek çîrok parve dike. Ev parvekirin di romanê de ji devê lehengekê tê vegotin. Lewra em ji alema romanê dîr nakevin. Lê dema ku Şemo qala bavê xwe dike yan jî Siyamend û Xecê dike, rêbazeke wiha naceribîne. Bi devê kesê sêyem xwe van agahiyan dide.

Şemo romana xwe ya *Şivanê Kurmanca* ji 21 beşan pêk aniyê û ji her beşê re jî navek daniye. Ev nav dibe navenda vê beşê. Bala xwendekar ji bûyera giştî ya romanê dikêşe, balê dikêşe ser beşa vê bûyerê. Ev her beş di nav xwe de blokeke demê ye. *Şivanê Kurmanca* hem bi zimanê xwe hem jî şêwaza rêzebûyerê rengê bîrnameyekê dide.

Gorkî romana xwe ya *Zaroktiya Min* dabeşî beşan nekiriye. Lê romanên wî yê *Di Nav Insanan De*, *Zanîngehên Min* dabeşkirî ne. Lê wekî Şemo ji beşan re nav nedaniye. Di navenda beşan de jî bûyereke sereke tune. Dibe ku beş ji bo bêhnvedana xwendevan hatibin dayîn. Romanên Gorkî wekî yê Şemo li ser bûyerên sereke nehatine avakirin. Herîkîna bûyeran pêhtir bi hev ve girêdayî ne. Leheng di cihêkî romanê de naxuyin û winda nabin. Dumdariyeke lehengan heye di romanê de. Di gelek cihên romanê de dîsa nivîskar wan derdixê pêşiya me. Helbet ev yek jî domdarî û tşkiliya bûyeran pêkan dike. Bi vê yekê jî romanên Gorkî di hişê me de ji aliyê rêzebûyerê ve yekgirtî dixuyin.

Hem di *Şivanê Kurmanca* de hem jî di sêbareya Gorkî de nivîskar dema ku qala lehengekî/ê dike gotina xwe dibe piştî salan û qala wî/ê dike ka li ku ew dîtiye û ew çî dike. Yanê di derbekê de di romanê de qala du demên gelekî ji hev dîr tê kirin. Ev şêwaz di gelek cihên berhemên her du nivîskaran de jî heye. Ev yek jî van romanên nêzî şêwaza bîrnameyê dike. Li jorê me ji Şemo mînak dabû. Ji Gorkî nimûneyeke vê şêwazê:

“Min nedizaniya ew çî difikirî, lê gelekî hêfa min ji keçikê re hatibû. Di ser de zehf neborî ew ji enstituyê veqetiya, piştî pazdeh salan ez li Kirimê li rastî wê

hatim. Di lîseyekê de mamoste bû. Êşa zirav girtibû. Wekî her mirovê felekzede bi nefreteke jidil digot: di dinyayê de her tişt xirab e.” (Zaroktiya Min, r. 78.)

Beriya vê paragrafê Gorkî behsa karê xwe ya li firinê dike. Dibêje li vî derî karê min zêde bûye. Karekî wî jî nanbirina razanxaneya keçan bûye. Gorkî piştire cih dide nirxandinên xwe yên derbarê keçên li wir. Hinek ji van keçan Gorkî wekî qasid dişînin ber yarên xwe. Yek ji van bala Gorkî dikêşe. Gorkî qala roja qasidiya xwe dike û piştire behsa 15 sal piştî wê rojê dike. Piştî vê paragrafa me jêgirtî, Gorkî dîsa qala karê xwe ya firinê dike.

### 3.4.6. Ziman û Şêwaz

Ziman amûreke vegêranî û têkiliyê ye. Cureyên wekî destan, çîrvanok, helbest, çîrok û roman bi awayekî ji vê amûrê sûd werdigirin. Hêmayên romanê yên wekî çîrok, rêzebûyer, leheng û cih-dem bê ziman nikarin di cîhana afirandî ya romanê de bîn honandin. Her çend ziman ji bo romanê ne armanc, amûrek be jî di avabûna wê de bivê nevê ye. Roman bi alîkariya ziman ava dibe. Lê dema ku xwe ava dike li gorî alema xwe li ser ziman tesarrûf dike. Yanê zimanê ku di bazarê de tê axaftin û yê ku di romanê de tê vegêran ne heman ziman in. Roman ji xwe re “zimanê romanê” diafirîne.

Gelo çî ye ev zimanê romanê? Beriya sedsala 19an em nikarin bibêjin têgihîştineke “zimanê romanê” wekî ya îro hebû. Di wan çaxan de nivîskarê berhemê wekî vegêr tevdigeriya. Hêmanên romanê yên wekî bûyer, cih-dem û leheng bi çavên wî/ê dihatin afirandin. Li ser van hêmanan ziman û şêwaza nivîskar serdest bû. Di sedsala 19an de bi taybetî ji ber bandora pêşveçûnên zanistî nêrînên ser zimanê romanê guherîn. Li gorî realîstan jiyana rojane çawa be divê wisa jî eksa xwe di romanê de bibîne. Li gorî Bahtin roman wekî derçûneke wêjeyî ji dengên çînî û cure cure dengên takekesî pêk tê.<sup>184</sup> Wekî minak; divê qesab wekî qesabek, dîndar wekî dîndarek û kujer wekî kujerek biaxive. Eynê wekî jiyana rojane.

Hewce ye ku zimanê romanê xwedî erk be. Ev yek jî helbet bi şêwazê pêkan dibe. Şêwaz estetîzma vegêranê ye. Bi gotineke dî forma naverokê şêwaza berhemê

---

<sup>184</sup> Mihail Bahtin, *Karnaval dan Romana Edebiyat Teorsinden Dil Felsefesine Seçme Yazılar*, wer. Cem Soydemir, weş. Ayrıntı Yayınları, ç. 2., İstanbul, 2014, r. 37.

diyar dike. Her nivîskarek naveroka berhema xwe li gorî şiyana xwe ya takekesî diafirîne. Lewra jî pêşkêşkirina her berhemek dirûvekî taybet digire. Di zanista wêjeyê de ji vî dirûvî re dibêjin şêwaz. Bi saya şêwazê em dikarin nivîskaran ji hev cuda bikin.

Di navenda vegotina romana *Şivanê Kurmanca* de Erebe Şemo cih digire. Em hemû hêmanên romanê bi gelemperî bi çavê Şemo dibînin. Ji vê hêlê ve *Şivanê Kurmanca* taybetiyên romana beriya sedsala 19an hilgirtiye. Di romanê de çawa ku Bahtin gotî her kes li gorî rewş û pozîsyona xwe naaxive. Leheng xwediyê peyv û gotinên asta xwe nînin. Di seranserê romanê de lehengên pale, beg, mamoste, leşker, serbaz, partîzan; jin û mêr bi heman zimanî diaxivin. Bi gotineke dî bi zimanê nivîskar yanê bi zimanê Şemo diaxivin. Di axaftina wan de nîşaneyên pozîsyona wan a civakî kêr daran xwe dide der. Zimanekî wan ê xas tune. Wekî mînak; mele û şêx di romanê de wiha diaxivin: “Kî gura meznê xwe neke, ewe bê xwedane, tu carî qencîyê nebînin, ne li vê dinê, ne li wê dinê.” (*Şivanê Kurmanca*, r. 190.) Ev gotin ji devê şêx û melan bo ku xelqê bitirsînin hatine gotin. Lê em dizanin gava ku mela û şêx diaxivin zimanekî giran ê dîni bi kar tînin. Têr peyvên erebî têxin axaftinê. Gelek caran ji ayet û hadîsan îstîfade dikin. Ev gotinên jorê ku ji devê şêx û meleyan hatine gotin tam li gorî çîna wan çênebûye. Gelek caran mezinên me yan jî rêverberên me jî bi heman gotinan dixwazin me bibin ser riya xwe. Lê car hene ku lehengên romanê bi devê ast û çîna xwe diaxivin. Wekî mînak beg bi zimanê xwe yê serdest û tehdîtkar wiha diaxive: “Wekî tu carekê dî jî bêy van dera, ezê çermê pişta te rakim.” (*Şivanê Kurmanca*, r. 114.) Heman mînakek jî ji devê karmendê dewletê: “Hevtek tera molet, wekî tu mihîna min nebîni, neyîni, ez ê çermê pişta te jê kim, tijî xwê bikim.” (*Şivanê Kurmanca*, r. 93.) Mînakên vî awayî ku nêzîkê zimanê wan ê rojane ye, bi piranî ji devê serdestan hatine gotin. Ev rewş dibe ku ji armanca nivîsandina romanê bixwe pêk bê. Lewra mirov bi çavekî gelemperî li romanê binêre, mirov dibîne ku romana *Şivanê Kurmanca* ji du biran pêk hatiye: Serdest û bindest. Di romanê de leheng ser van her du biran ava bûne. Gelek diyalogên romanê jî di navbera van biran de diborin. Lewma leheng ne li gorî takekes û çîna xwe diaxivin, belkî li gorî zimanê serdestî û bindestiyê diaxivin.



Erebê Şemo di romana xwe de zimanekî gel ê rojane bi kar aniye. Hevokên romanê girîft nînin, wekî zimanê rojane kurt in. Çawa ku tê zanîn di zimanê rojane de ji bo herikîna axaftinê hinek peyv nayên gotin û herikîna axaftinê giranî ser lêkeran didome. Şemo di romana xwe de heman şêwazê bi kar aniye: “Çewa ewî ez dîtîm, bû qujîniya wî. Dirgan avît û revî, çû derva. Zar jî hişyar bûn, pirsîn: -Bavo çi-çi qewimîye?’ Min got: -Qet tişte neqewimîye, xweyê merêkê hatîye, dibê: -Rabin, bes e razên.” (Şivanê Kurmanca, r. 55.) Di giraniya romanê de vî awayî tesarrûfa ziman berbiçav e. Ev şêwaza ziman jî vegotina romanê ji zimanê romannûsiyê dûr dixê û nêzî zimanê çîrokbêjîyê dike.

Eger em bi giştî li romana *Şivanê Kurmanca* binêrin, em ê nekaribin tam bibêjin ku Şemo rêbazeke hunerî ya wekî şibandin, şayesandin, leîtmotîv, herikîna hişî bi kar aniye û vê metoda hunerî di dirûvgirtina şêwaza romanê de roleke girîng hildaye ser milên xwe. Helbet di *Şivanê Kurmanca* de ciwankariyên wekî şibandin û şayesandin hatine bikaranîn. Lêbelê, van dirûveke xas nedaye şêwaza hunerî ya Şemo.

Maksîm Gorkî di romanên xwe de bi qasî Şemo zimanekî rojane bi kar neanîbe jî zimanê wî sivik û herikbar e. Lê bi taybetî Gorkî jî di diyalogên xwe de zimanê xwe nêzî zimanê rojane dike. Hevokên wî jî sade ne û peyvên ku bi kar tîne peyvên zimanê rojanê ne: “Hevalcan, min nedixwest dilê te bihêlim, bawer bike; min dizaniya ez bi te re bibim dost dê malîyên te aciz bibin. Baş e? Ha ji te re, va wisa jî bû, ne wisa? Te niha fêr kir, çima min ji te re wisa got?” (Zaroktiya Min, r. 167.) Gorkî û Şemo jî hewl nadin zimanekî hunerî bi kar bînin. Ji ber ku her du nivîskar jî bi devê kesê sêyem diaxivin, lewma jî zimanekî jidil bi kar tînin. Em dikarin bibêjin ku ev teserrûfa nivîskaran a zimanî şêwaza wan a hunerî ye. Ligel vê hevpariya wan bi qeneata me berhemên zargotinê jî zimanê wan nêzî zimanê rojane kiriye. Nimûneyên zargotinê di berhemên her du nivîskaran de jî cih digirin û ev yek jî şêwaza wan a wêjeyî nêzî hev dike.

Şemo di berhema xwe de cih daye gelek şibandinan. Bi heman awayî di her sê romanên Gorkî de, em dikarin bi dehan şibandinan bibînin. “Ka ji min e, ez wekî kefa sabûnê, hedî hêdî diwerimîm” (Zaroktiya Min r. 103.), “Wan salan çawa kareke mêşan bi hingiv tijî dibe, ez jî wisa bi helbestên dapîra xwe tijî bûm.” (Însanlar

Arasında, r. 93.) “Dişibiya kesekê/a ku nexweşiyêke dirêj borandiye û nû ji nav cihan derketiye yan jî dişibiya kesekê/a ku duh ji zindan derketiye.” (Zanîngehên Min, r. 18.) Tê xuyan ku Gorkî xwedî raçevkirineke xurt e. Rewş û bûyeran bi şibandinan dide. Wisa ku êdî ev şibandin û raçavkirina hûrgilî dibin şêwazeke kesayetiya wî ya hunerî.

Berhemên her du nivîskaran jî otobiyografîk in. Her du nivîskaran jî hewl dane ku rewşa civakan raxînin ber çavên xwendevan û rexneya jiyana civakî bikin. Ji ber van sedeman her du nivîskar jî di navbera xwe û xwendevan de pozîsyoneke nêzîk datînin. Wisa tê hîs kirin ku nivîskar bi xwendevan re di nav diyalogê de ye û bangî wan dike. Her du nivîskar jî dixwazin bi zelalî peyama xwe bigihînin xwendevan. Ev şêwaza wan a wêjeyî jî rengê hev dide.

Maksîm Gorkî jî wekî Şemo ji nav gel derketiye. Lewra zimanê berhemên wî jî girêdayî civaka wî ye. Wekî lehengên Şemo lehengên Gorkî jî ji çînên jêr in. Lewma zimanê wan zelal e. Cudahiya di navbera şêwaza her du nivîskaran ew e ku *Şivanê Kurmanca* peywira agahî dayîn û piçek jî propagandayê hildaye ser milê xwe. Lê sêbareya Gorkî bêhtir peywira nîşandin û şîrovekirinê hildaye ser milê xwe.

## ENCAM

Di vê xebatê de, romana Erebe Şemo ya *Şivanê Kurmanca* û sêbareya Maksîm Gorkî yê *Zaroktiya Min, Di Nav Insanan De, Zanîngehên Min* ji aliyên naverok û teşeyê ve hatine berawirdkirin. Bi saya xwendineke berawirdî li ser van romanên cudahî û wekhevîyên naverokî û teşeyî hatine destnîşankirin.

Di vê xebatê de hat dîtin ku beriya her tiştî, zarokatî û ciwaniya Erebe Şemo û Maksîm Gorkî wekî hev bûne. Her du nivîskar jî dûçarî gelek zehmetiyan mane. Di nav gel de mezin bûne. Vê yekê derfet daye wan ku ji nêz ve mirovan û jiyana wan nas bikin, derbarê jiyana û rewşa heyî bigihîjin biryaran, hêza wan a çavenêriyê zêde bibe û piştî li dijî rewşa heyî rabin.

Ji jiyana her du nivîskaran jî xuya dibe ku bandora wêjeya devkî li ser nivîskariya wan bi bandor bûye. Em dikarin bibêjin ku zanîn û meyla wan a wêjeya devkî rê li ber nivîskariya wan vekirîye. Ev tişt ji bo Maksîm Gorkî bêhtir rast e. Nivîskariya wî rasterast ser wêjeya devkî û xwendinên wî yê wêjeyî çêbûye. Em ji her romanên wî yê ku bûne mijara xebata me û ji jiyana wî pê derdixin ku Gorkî ji gelek nivîskaran gelek berhemman dixwîne. Dibe xwedî têgihîştineke wêjeyî. Lê nivîskariya Erebe Şemo, ji xîmeke wekî Gorkî bêhtir piçek bi meyla giştî ya serdemê re têkilidar e.

Sîstema nû û pêşengên vê sîstemê dixwestin gel perwerde bikin. Ji bo vê armanca wan a pîroz her tişt amûrek bû. Wêjeyê jî ji vê nêrîne para xwe standiye. Ciwanên aktîf û şoreşger ên sîstema nû, ku yek ji van jî Erebe Şemo bû, dest diavêjin pênûsê. Helbet beriya destê xwe biavêjin pênûsê, berê xwe didin pênûsên îdolên xwe. Li Sovyetê di destpêka dema nivîskariya Erebe Şemo de ji Maksîm Gorkî çêtir îdoleke nivîskar tunebû. Lewra ne xerîb û dûrî eqilan e ku Erebe Şemo xwestibe bide ser şopa Gorkî û wekî Gorkî mijara romana xwe ya yekem ji serboriyên xwe ên zaroktî û ciwanîyê re veqetandibe.

Di neveroka berhemên her du nivîskaran de jî dixuye ku ew dixwazin bi xwendevanan bidin hîskirin ku rewşa xirab a gel hewce ye bê rexnekirin û nîşandin. Hate îddiakirin ku armanca nivîskaran ew bûye ku rewşa nebaş a civakê raxînin ber

çavên xwendevan. Bidin nîşan ka di nav civakê de çiqas nerastî hebûne. Li gorî Erebe Şemo ev yek jî dê cudahiya sîstema berê û ya nû nîşan bida û xizmeta hişmendiya xwedîlêderketina sîstema nû bikira.

Maksîm Gorkî her çend xwestibe peyamek bide xwendevan jî ji peyama xwe bêhtir berhema xwe derxistiye meydana. Lê Erebe Şemo ji berhema xwe zêdetir peyama xwe derxistiye meydana. Lewra jî ji aliyê wêjeyî ve berhemên Gorkî ji ya Şemo ast bilindtir in. Maksîm Gorkî hewl daye hem ji aliyê hêmanên romanê ve hem jî teşeyê ve atmosfereke romanê biafirîne. Gorkî jiyan, serborî û nêrînên xwe dewsa ku tenê ji devê xwe neqil bike, wan hildaye di nav sîstema romanê de helandiye. Lê yên Erebe Şemo di bin dengê wî yê propagandayî de mane. Lewma hêmanên romana Şemo yên wekî leheng, cih, dem, rêzebûyer bi qasî yên Gorkî hunera romanê pêk naynin. Ji bo Erebe Şemo nivîsandin ne armanc e, amûrek e.

Helbet di wekheviyên her du nivîskaran de rola cografyayê jî gelek e. Di serdemên xwe de her du kesayet li Sovyetê ne û di nav heman atmosferê de ne. Wekî ku diyar e, di avabûna nêrîna wêjeyî ya Erebe Şemo de û di tesbîtkirina naveroka berhemên wî de bandora serdemê ya siyasî û derdora nivîskaran bi taybetî ya Maksîm Gorkî diyarker e. Manendiyên berhemên wan şahidiya vê yekê dike. Lê, qabiliyeta nivîskariya wan cuda cuda ketiye ser rûpelên romanên.

## ÇAVKANÎ

### Pirtûk

Adıgüzel, Sedat: *İlyas Efendiyev Hayatı, Eserleri, Üslûp Özellikleri, Sosyalist Gerçekçilik Açısından Kahramanları*, ç. 2, weş. Fenomen Yayıncılık, Erzurum, 2010.

Ahmedzade, Haşim: *Ulus ve Roman Fars ve Kürt Anlatısal Söylemi Üzerine Bir Çalışma*, wer. Azad Zana Gündoğan, weş. Pêrî Yayınları, İstanbul, 2004.

\_\_\_\_\_ : *Romana Kurdî û Nasname*, wer. Fahriye Adsay, weş. Avesta, İstanbul, 2011.

Alan, Remezan: *Bendname li ser ruhê edebiyatekê*, weş. Avesta, İstanbul, 2009.

\_\_\_\_\_ : *Destpêkek ji bo Zanista Edebiyata Modern*, weş. Peywend, İstanbul, 2015.

\_\_\_\_\_ : *Folklor û Roman Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn*, weş. Weşanên Peywend, Stenbol, 2013.

Aytaç, Gürsel: *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, weş. Say, İstanbul, 2009.

Aydın, Kamil: *Karşılaştırmalı Edebiyat Günümüz Postmodern Bağlamında Algılanışı*, weş. Birey, İstanbul, 2008.

Aydoğan, İbrahim Seydo: *Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*, weş. Rûpel, Stenbol, 2014.

Bahtin, Mihail: *Karnavaldan Romana Edebiyat Teorsinden Dil Felsefesine Seçme Yazılar*, wer. Cem Soydemir, weş. Ayrıntı Yayınları, ç. 2., İstanbul, 2014.

Bardakçıyan, Kevork B.: *Modern Ermeni Edebiyatı*, wer. Fatma Ünal-Maral Aktokmakyan, weş. Aras Yayıncılık, İstanbul, 2013.

Behramođlu, Ataol: *Rus Edebiyatı Yazıları (XIX. ve XX. Yüzyıllar)*, Tekin Yayınevi, . 2., İstanbul, 2012.

\_\_\_\_\_ : *Rus Edebiyatının Öğrettiđi*, Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2008.

Belge, Murat: *Edebiyat Üstüne Yazılar*, İletişim Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, 2012.

Bonamour, Jean: *Rus Edebiyatı*, wer. İsmail Yerguz, Dost Kitapevi, Ankara, 2006.

Bonnard, André: *Yeni Bir Hümanizmaya Doğru Sovyet Edebiyatı Üzerine*, wer. Serdar Canpolat-Mehmet Erdal, Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2001.

Boyık, Eskerê: *Çanda Kurdên Sovêtê*, weş. Deng, İstanbul, 2012.

Cizirî, Molla Ehmed: *Divan*, wer. Osman Tun, Kent Yayınları, İstanbul, 2007.

Cizirî, Molla Ehmedê: *Dîwan(Metnê Kurdî-Türke Çevirisi)*, wer. Osman Tun, weş. Nûbihar, Stanbol, 2008.

Çetişli, İsmail: *Metin Tahliline Giriş/2 Hikaye Roman Tiyatro*, Akağ Yayınları, 4. Baskı, Ankara, 2014.

Damrosch, David: *Dünya Edebiyatı Nedir?*, wer. Ođul Köseođlu, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2013.

\_\_\_\_\_ : *Dünya Edebiyatı Nasıl Okunmalı?*, wer. Devrim Çetinkasap, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2010.

Engünün, İncü: *Mukayeseli Edebiyat*, weş. Dergah, İstanbul, 2011.

Forster, E.M.: *Roman Sanatı*, wer. Ünal Aytür, weş. Milenyum Yayınları, İstanbul, Mart 2014.

Gorki, Maksim: *Amerika'dan İtalya'ya*, wer. Ayşe Hacıhasanoğlu, weş. Heyamola Yayınları, İstanbul, 2007.

\_\_\_\_\_ : *Arkadaş*, wer. Gülen Aktaş, weş. Oda Yayınları, ç. 11, İstanbul, 2013.

\_\_\_\_\_ : *Benim Üniversitelerim*, Ergin Altay, weş. Can, İstanbul, 2014

\_\_\_\_\_ : *Çocukluğum*, wer. Ergin Altay, weş. Can Sanat Yayınları, İstanbul, 2013.

\_\_\_\_\_ : *Edebi Portreler*, wer. Ayşe Hacıhasanoğlu, weş. Yordam Kitap, İstanbul, 2007.

\_\_\_\_\_ : *Edebiyat Yaşamım*, wer. Şemsa Yeğin, weş. Payel, ç. 3., İstanbul, 2007.

\_\_\_\_\_ : *Fırtınanın Habercisi*, wer. Pelin Atayman, weş. Bordo Siyah Yayınları, İstanbul, 2008.

\_\_\_\_\_ : *Gorki'nin Mektupları*, wer. Zeyyad Özalpsan, weş. Engin Yayıncılık, İstanbul, 2006.

\_\_\_\_\_ : *İnsanlar Arasında*, wer. Ergin Altay, weş. Can Sanat Yayınları, İstanbul, 2014.

\_\_\_\_\_ : *Seyirciler*, wer. Ayşe Hacıhasanoğlu, weş. Yordam Kitap, İstanbul, 2008.

\_\_\_\_\_ : *Tolstoy'dan Anılar*, wer. Akşit Göktürk, weş. Adam Yayıncılık, İstanbul, 2003.

\_\_\_\_\_ : *Yaşanmış Hikayeler*, wer. Ataol Behramoğlu, weş. Can Sanat Yayınları, ç. 3, İstanbul, 2013.

Göktürk, Akşit: *Çeviri: Dillerin Dili*, weş. Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2006.

Hassanpour, Amir: *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985*, weş. Avesta, İstanbul, 2005.

Kefeli, Emel: *Batı Edebiyatında Akımlar*, weş. Dergah, İstanbul, 2012.

\_\_\_\_\_ : *Karşılaştırmalı Edebiyat İncelemeleri*, weş. Birey Kitapevi, İstanbul, 2000.

Kurtuluş, Akif: *Politika ve Sanat Ekim Devrimi (1917-1932)*, weş. Avesta, İstanbul, 1996.

Lodge, David: *Kurgu Sanatı*, wer. Aytaç Ören, weş. Hece Yayınları, Ankara, Mayıs 2013.

Nabokov, Vladimir: *Rus Edebiyatı Dersleri*, wer, Yiğit Yavuz-Fatih Özgüven-Ayşe Nihal Akbulut, weş. İletişim, ç. 2., İstanbul, 2013.

Öztürk, Ali Osman: *Karşılaştırmalı Edebiyat Araştırmaları*, çap. Sel-ün Yayın Evi, Konya, 1998.

Pirbal, Ferhad: *Shadow Of The Lion The History of a Cultural Millenium*, wer. The Kurdish Globe, weş. Shahab Printing House, Erbil, 2012.

Reşît, Tosinê : "Sovyetler Birliği'nde Kürt Edebiyatı", dnd. *İnatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat*, ed. Vechi Erbay, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2012.

Rousseau-Pihois, A.M. -Cl.: *Karşılaştırmalı Edebiyat*, wer. Mehmet Yazgan, weş. Milli Eğitim Bakanlığı, İstanbul, 1994.

*Sanatta Sosyalist Gerçekçilik*, ed. İsmet Gülseçkin, wer. Feyyaz Şahîn, weş. Parşömen, İstanbul, 2011.

Süer, Ö. Aydın: *XIX. Yüzyıl Rus Edebiyatı Üzerine Yazılar*, weş. Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2006.



Şemo, Erebe: *Berbang*, ji tîbên kirilî Rûbar Dilşêr, Weşanxana Kurdistan, Stockholm, 1988.

\_\_\_\_\_ : *Dimdim*, weş. Lîs, Stenbol, 2007.

\_\_\_\_\_ : *Hopo*, weş. Lîs, Diyarbakır, 2007.

\_\_\_\_\_ : *Jiyana Bextewar*, weş. Lîs, Diyarbakır, 2015.

\_\_\_\_\_ : *Koçekê Derewîn*, weş. Belkî, Diyarbakır, 2014.

\_\_\_\_\_ : *Şivanê Kurmanca*, weş. Lîs, İstanbul, 2009.

Tales, Herman: *Eski Sovyetler Birliđi'nde Kürtler (1927-1994)*, wer. Nadire Işık, weş. Pêrî, Diyarbakır, 2001.

Tekin, Mehmet: *Roman Sanatı Romanın Unsurları 1*, weş. Ötüken Yayınları, 12. Basım, İstanbul, Mart-2014.

Tekşan, Mesut: *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, weş. Kriter, İstanbul, 2011.

Tieghem, Paul Van: *Mukayeseli Edebiyat*, wer. Yusuf Şerif Kılıçel, weş. Maarif Matbaası, Ankara, 1943.

Wellek René-Warren Austin: *Edebiyat Teorisi*, wer. Ö. Faruk Huyugüzel, weş. Dergah, İstanbul, 2013.

Wood, James: *Kurmaca Nasıl İşler?*, wer. Ekin Bodur, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2010.

Yedlin, Tovah: *Maksim Gorky: A Political Biography*, weş. Praeger, London, 1999.

Yücel, Oğuz: *Yabancı Dil Öğretiminde Çevirinin Yeri ve Önemi*, Konya, 2004.

### **Gotar û Hevpeyvîn:**

Aydoğan, Mustafa: “Destpêka Romana Kurdî: *Şivanê Kurmanca*”, Erebe Şemo, *Şivanê Kurmanca*, Weşanên Lîs, Diyarbakır, rr. 5- 46.

Baqir, Abdurahman: “Ji Şivantiyê Ber bi Zanyariyê ve”, *Kovara W*, j. 15, Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007, rr. 47-48.

Boyîk, Eskerê: “Hîmdarê Edebiyata Kurdî yê Ewilîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî”, *Kovara W*, j. 15 Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007, rr.17-26.

Çaçan, Xelîlê: “Miletêk Di Heyra Wî De Bû”, *Kovara W*, j. 15., Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007, rr. 27-28.

Denîz, Serwet: “Her Ew Hesret û Ew Xwezî”, *Kovara W*, j. 15, Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007, rr. 43-48.

Eşo, Wezirê: “Çend Rûpel Ji Jiyana Erebbê Şamîlov”, *Kovara Çira*, j. 6., Havîn 1966, Spanga, 1996, rr. 14-22.

Kefeli, Emel: “Karşılaştırmalı Edebiyat: Tanım, Yöntem ve İncelemeler”, *Türkiye Araştırmaları Dergisi, İstanbul*, c. 4, h. 8, 2006, rr. 331-350.

Kutlay, Naci: “Romana Kurdî”, *War*, j. 5-6, (Havîn-Payîz 1998), rr. 125-134.

Meretowar, Ayhan: “Keseyatiya Edebî ya Erebbê Şemo”, *Kovara W*, j. 15., Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007, rr. 41-42.

Nazê, Bavê: “Hevpeyvîna Bi Erebbê Şemo Re Ya Berî 25 Salan”, *Kovara W*, j. 15., Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007, rr. 31-32.

Wellek, René: “Karşılaştırmalı Edebiyatın Krizi ”, *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, wer. Adem Çalışkan, c.3, h. 12, Havîn 2012, rr. 113-114

Zinar, Zeynel Abidîn: “Nivîskarê Kurd, Suxrevan û Kedkarê Wêjeya Kurdî”, *Kovara W*, j. 15, Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007, rr. 33-35.


### **Tez:**

Adsay, Fahriye: *Romana Kurdî (Kurmancî) ya Dîrokî: Bîra Civakî û Nasname*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî, Mardîn, 2013.

Gören, Ebubekir: *Di romanên Erebe Şemo de Folklorê Kurdî*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî, Mardîn, 2013.

**Çavkaniyên Dijîtal:**

Alan, Remezan: “Bextewariya Îdeolojîk”, *Kovara Pelîn: Kovara Bîr*, <http://www.kovarabir.com/2011/01/remezan-alan-bextewariya-ideolojik/>, (26.08.2015)



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**ŞIVANÊ KURMANCA İLE MAKSİM GORKİ’NİN ÜÇLEMESİ  
ÜZERİNE BİR KARŞILAŞTIRMA**

Ferhat YILMAZ

11711001

Danışman

Öğr. Gör. Ramazan Çeçen

Mardin – 2015